



**NÛBIHAR
AKADEMÎ**

Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

Cild 3 Jimar 10 Sal 5 - 2018
Volume 3 Issue 10 Year 5 - 2018



Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.
Büyük Reşitpaşa Cad. Yümni İş Merkezi No: 22/29
Vezneciler – Fatih / İSTANBUL
Tel & Faks: 0212 519 00 09
www.nubiharakademi.com | http://dergipark.gov.tr/nubihar
E-mail: nubiharakademi@gmail.com

Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Berpîrsê Karên Nivîsê
On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışmaları Müdürü
Süleyman Çevik

EDİTÖRÊ JIMARÊ / ISSUE EDITOR

Tek, Ayhan / Asst. Prof., Mus Alparslan University, Turkey

DESTEYA EDİTÖRİYÊ / EDITORIAL BOARD

Acar, Hayrullah / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Aydın, Tahirhan / Assoc. Prof., Indiana University, USA

Beltekin, Nurettin / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Bor, İbrahim / Assoc. Prof., Indiana University, USA

Ergün, Zülküf / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

Tek, Ayhan / Asst. Prof., Mus Alparslan University, Turkey

Türel, Vehbi / Assoc. Prof., Bingöl University, Turkey

ÇAP / PRINTED BY

Hünkar Organizasyon Matbaa

Sertifika No:17815

Tel: 0 212 520 72 59

MÎZANPAJ & PAGE DESIGN

Şemal Medya (semalmedya@gmail.com)

Kovara Nûbihar Akademîyê ji aliyê van îndeksan ve tê naskirin:
The Journal of Nûbihar Akademî is accepted by these indexes:



INTERNATIONAL
Scientific Indexing



Eurasian
Scientific
Journal
Index



Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.

ISSN: 2147-883X

DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD

Akın, Salih / Assoc. Prof., *Rouen University, France*

Bozarıslan, Hamit / Prof., *École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*

Bruinessen, Martin Van / Prof., *National University of Singapore, Singapore*

Jalil, Jalile / Prof., *Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria*

Kreyenbroek, Philip G. / Prof., *Georg-August University, Germany*

Musa, Abdulwahab Khalid / Assoc. Prof., *Zakho University, Kurdistan-Iraq*

Vali, Abbas / Prof., *Boğaziçi University, Turkey*

Yeğen, Mesut / Prof., *İstanbul Şehir University, Turkey*

HEKEMÊN VÊ JIMARÊ/REVIWERS OF THIS ISSUE

Acar, Hayrullah / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Aslanoğlu, Osman / Asst. Prof., *Dicle University, Turkey*

Atmaca, Metin / Asst. Prof., *Social Sciences University of Ankara, Turkey*

Awrahim, Tareq Mohammed, / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Chyet, Michael / *Library of Congress, USA.*

Ekinci, Mehmet Rezan / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Ergün, Zülküf / Dr., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Gümüő, Ercan / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Gemi, Ahmet / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Gündoğdu, Songül / Asst. Prof., *Mus Alparıslan University, Turkey*

Purçak, M. Emin / Asst. Prof., *Mus Alparıslan University, Turkey*

Uğurlu, Seyit Battal / Assoc. Prof., *Yüzüncü Yıl University, Turkey*

Vali, Shahab / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Yücel, Muhammet / Asst. Prof., *Mus Alparıslan University, Turkey*

NAVEROK / CONTENTS

JI EDÎTOR/EDITORIAL..... 07-10

Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de

Pseudonym in Classical Kurdish Literature

ABDURRAHMAN ADAK.....11-58

The Return to the Womb or the Gaia of Meaning: Mother Tongue

Vegerîna Malzarokê yan jî “Gaia”ya Ramanê: Zimanê Zikmakî

AYHAN TEK.....59-70

Dîrok û Nasnameya Bajarê Kerkûkê

History and Identity of Kirkuk City

ABDULLAH KIRAN71-92

WERGEREK / A TRANSLATION

Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldanî yên Bakur – Pêşgotin

PETER J. A. LERCH - JI ALMANÎ: DR. ABDULLAH ÎNCEKAN..... 95-100

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

Sefheî Sibyan a Mela Mehmûdê Bazidî

TAHÎRHAN AYDIN 103-128

Ji Edîtor

Nûbihar Akademîyê bi vê jimara xwe pênc salên xwe tijî kir û di warê kovargerîya Kurdî ya akademîk de gehiştê qonaxê girîng. Di Kurdî de tarîxa kovargerîyêke dîrûdirêj hebe jî, ji aliyê akademîk ve mirov nikare behsa pêvajoyêke wisa bike. Loma pêncsalîbûna *Nûbihar Akademîyê* bi serê xwe giranbiha ye û ji bo me jî cihê keyfxweşiyê ye. Bi vê helkeftê em dixwazin erk û armancên *Nûbihar Akademîyê* careke dî bi bîr bînin. Aşkera ye ku ji bo pêşvebirina zanista Kurdolojiyê rola kovarên akademîk gelekî girîng e. Kovarên akademîk ji aliyekî ve fezaya akademîk geş dikin, ji aliyekî ve jî ew feza wan kovaran pêşve dibin. Di vê çarçoveyê de, *Nûbihar Akademî* dê ber xwe bide, da ku hem di akademiya Kurdî de binyada disîplîneke zanistî bê avakirin, hem jî lêkolînerên ciwan bikaribin xwe bigehînin asteke navnetewî. Bi vî awayî hem potansiyela kovargerîya li dor akademiya Kurdî dê geş bibe hem jî di alema zanistî ya giştî de lêkolînerên qada Kurdolojiyê dê zêdetir deng vedin û berhemên wan bêne xwendin. Bêguman ev perspektîf digel xwe mesûliyete tîne û mesaiyêke zêdetir jî dixwaze. Lêbelê zehmetiyên wê çiqas zêde bin jî me dil heye ku *Nûbihar Akademîyê* bigihînin paşerojê û wê bixin navendeke akademîk a girîng ku her sal vê qadê geştir bike.

Heta niha zêdetir gotarên Kurmancî hatibine belavkirin jî *Nûbihar Akademî* dê hewl bide ku di zaravayên din yê Kurdî de jî gotarên zanistî biweşîne. Yanî *Nûbihar Akademî* hem ji bo pêşvebirina qada zanistî hem jî ji bo pêşvebirina zimanekî zanistî, hay ji mesûliyeta xwe heye.

Di vê jimara *Nûbihar Akademîyê* de sê gotarên lêkolînî, dokûmentek û wergerek cih digirin. Di nav van xebatan de gotarek bi Îngilîzî yê din jî bi Kurmancî ne.

Abdurrahman Adak, di gotara xwe ya bi navê “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, mijara mexlesê û bikaranîna wê di edebiyata klasîk a Îslamî de, bi taybetî jî di edebiyata Kurdî ya klasîk de vedikole. Di vê gotarê de Adak, pêşî derbareyê mahiyeta mexlesê û cihê wê di edebiyata Îslamî de çarçoveyêke giştî xêz dike, piştê di edebiyata Kurdî de mexlesên hatine bikarînan û taybetiyên wan digel minak û tabloyan pêşkêş dike. Ji aliyekî ve listeyêke giştî ya tarîxa edebiyata Kurdî ya Klasîk jî ji vê xebatê têtê dîtin.

Ayhan Tek, di gotara xwe ya bi Îngilîzî ya bi navê “The Return to the Womb or the Gaia of Meaning: Mother Tongue” de, teoriya Jungî ya derbareyê zimanê zikmakî û têkiliya wê bi zihn, arketîp û psîkolojiyê re esas digire û vê teoriyê li ser

6 waqeyên ku tesbît kirine tetbîq dike. Nivîskar mijarê bi teoriyên psîkanalîtîk ve girê dide û di biwara girîngiya zimanê zikmakî û tesîra wê ya civakî-derûnî de encamên balkêş bi dest dixe.

Abdullah Kîran, di gotara xwe ya bi sernavê “Dîrok û Nasnameya Bajarê Kerkûkê” de li ser tarîx, çand û girîngiya bajarê Kerkûkê radiweste. Herwekî ku ji gotarê jî dihête zanîn, Kerkûk ne tenê ji aliyê dewlemendiya xwe ya petrolê ve girîng e. Ew bajêr herwisa ji aliyê tarîx û axa xwe ve jî gelekî muhîm e. Kîran jî vê yekê bi referansên girîng ber bi çav dike û derbareyî vî bajarî de nêrînên cuda pêşkêş dike. Di gotara Kîran de tehrîfatên li ser çavkaniyên derbareyê Kerkûkê de jî tên rexnekirin.

Ji bilî van nivîsên lêkolînî di vê hejmara *Nûbihar Akademîyê* de dokumentek û wergerek jî cih digirin. **Tahirhan Aydın** di xebata xwe ya dokumentî de, ku sernavê wê “*Sefheî Sibyan a Mela Mehmûdê Bazidî*” ye, berhemêke Mela Mehmûdê Bazidî hem ji aliyê fizîkî hem jî ji aliyê naverokî ve analîz dike. Digel wê, Aydın, metnê vê berhemê jî bi alfabe ya xwe ya eslî ji nû ve diweşîne. Herwisa di xebatê de mînakên wereqên wê berhemê jî hatine dayîn.

Di beşa wergerê de jî **Abdullah İncekan**, nivîseke girîng ya **Peter J. A. Lerch** ji Almanî wergerandiye. Serenavê wê nivîsê “Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldanî yên Bakur-Pêşgotin” e. Wekî ku ji serenavê nivîsê jî tête zanîn, nivîs li ser Kurd û Îranîyên Keldanî yên li Bakur e. Lê ev serenave, navê xebata Lerchî ye ya di sala 1858an de wek pirtûk hatiye çapkirin. Ev wergera Abdullah İncekan jî qismê pêşgotina wê xebatê ye.

Heta hejmara din ya *Nûbihar Akademîyê*, bi xatirê we.

Dr. Ayhan TEK
Edîtorê Jimarê

Editorial

Nûbihar Akademî has completed its five-year period through this issue and reached to a new period in Kurdish academic periodical publishing. Although there is a long history of periodical publishing in Kurdish, one can not make a mention of such a long process in terms of academic publishing. Therefore being five-year-old is an important point to *Nûbihar Akademî* and it pleases us as well. At this point we would like to declare purpose and missions of *Nûbihar Akademî* once more. It is obvious that academic journals have an important role in developing Kurdish Studies. Academic journals vitalize the academic field on the one hand, and that field develop academic journals on the other hand. In this context, *Nûbihar Akademî* will struggle both to contribute to build scientific basis for Kurdish academy and make young researchers reach to an international level. So that not only the potential of periodicals in Kurdish academy will boost, but also researchers of Kurdish Studies will resonate with scientific world and make their work read more. Undoubtedly this perspective bears a responsibility and needs much more work. However, we are committed to make *Nûbihar Akademî* reach to future and make it be a significant academic center that develop the field year after year.

Though Kurmanji articles have been published so far, *Nûbihar Akademî* will try to publish academic articles in other dialects of Kurdish. In other words, *Nûbihar Akademî* is aware of its responsibility both for developing academic field and for developing an academic language.

This issue of *Nûbihar Akademî* features three research articles, a document and a translation. One of the articles is in English, all the others are in Kurdish.

In his article entitled “*Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*” (“Pseudonym in Classical Kurdish Literature”) **Abdurrahman Adak** analysis *pseudonym* and its use in classical Islamic literature, especially in classical Kurdish literature. In this article Adak firstly gives a general framework on the importance of pseudonyms and their place in Islamic literature, then he presents the *pseudonyms* used in Kurdish literature and their features with examples and tables. One can also see a general list of the history of Classical Kurdish Literature in this article.

Ayhan Tek's article titled “The Return to the Womb or the Gaia of Meaning: Mother Tongue” written in English bases Jung's theory on mother tongue and

its relation with mind, archetype and psychology, and applies this theory on 6 cases. The author associates the topic to psychoanalytical theories and reaches interesting conclusions in terms of the significance of mother tongue and its socio-psychological effects.

In his article titled “Dîrok û Nasnameya Bajarê Kerkûkê” (“History and Identity of Kirkuk City”) **Abdullah Kıran** focuses on history, culture and significance of Kirkuk city. As it is clear from the article Kirkuk is not important only for its oil richness, it is also important for its history and territory. Kıran presents that fact through significant references and gives different point of views on the Kirkuk city. Kıran also criticizes forgeries on sources on Kirkuk.

Besides these research articles, this issue of *Nûbihar Akademî* features a document and a translation. In his documented study titled “*Sefhei Sibyan a Mela Mehmudê Bazîdî*” (“Mela Mehmudi Bazidi’s *Sefhei Sibyan*”) **Tahirhan Aydın** makes an physical and content analysis on one of Mela Mehmûdê Bazîdî’s works. Additionally, Aydın publishes the text of that work in its original alphabet. Moreover one can see samples pages of that work.

In the translation section an important article of **Peter J. A. Lerch** has been translated by **Abdullah İncekan** from German. The article has been translated with this title; “Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldanî yên Bakur -Pêşgotin.” As it can be inferred from the title itself, the article is on Northern Kurdish and Iranian Chaldeans. That title is actually the title of a book by **Lerch** published in 1858. This is the translation of the “Foreword” of that book.

Hope to see you in the next issue of *Nûbihar Akademî*.

Dr. Ayhan TEK
Issue Editor

Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Pseudonym in Classical Kurdish Literature

Abdurrahman Adak*

PUXTE:

Mexles, navê edebî ye ku di edebiyata klasîk a Îslamî de (edebiyatên Farişî, Tirkî, Kurdî û hwd.) ji aliyê helbestvanan ve di metnên edebî de hatiye bikaranîn. Bikaranîna mexlesê, di edebiyata Farişî de di sedsala XIIIem de û di edebiyatên Tirkî û Kurdî de jî di sedsala XVem de binecih bûye. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de tradîsyona bikaranîna mexlesê heta bi roja me dewam kiriye. Di gotarê de pêşî li ser mahiyeta mexlesê û tarîxa wê hatiye rawestan. Piştî jî listeyeke nimûneyî ji bo mexlesên edebiyata Kurdî hatiye dayîn û di çarçoveya vê listeyê de hin taybetiyên mexlesên Kurdî hatine tesbîtkirin ku ew jî ev in: Şêweyên bikaranîna mexlesê, mexles ji aliyê morfolojîk ve, pêwendiya mexlesê bi kêşê re, orjîna mexlesan, mexles ji aliyê wateyê ve, pîrmexlesî û hevpariya mexlesan.

Peyvên Sereke: mexles, tradîsyona mexlesê, pîrmexlesî, hevpariya mexlesan.

ABSTRACT:

Pseudonym is a literary name used in the writings of the poets of classical Islamic literature (Persian, Turkish, Kurdish, etc.). Using pseudonyms were situated in the Persian literature in the XIII. century and later in the Turkish and Kurdish literature in the XV. century. The classical Kurdish literature have continued to use the tradition of using pseudonyms to present day. In the article, firstly the prominence and history of the pseudonym have been given. Thereafter, a list of examples of pseudonyms from Kurdish literature was given and some of the features of the Kurdish pseudonyms have been found in this list. These are the ways of using pseudonym;

* **Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, Turkiye.** / Assoc. Prof. Mardin Artuklu University Faculty of Literature, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey.
e-mail: abdurrahmanadak@gmail.com

pseudonyms in terms of morphology; relations of pseudonym with rhyme; the origin of pseudonym; pseudonyms in terms of meaning; having multi-pseudonyms; common pseudonyms.

Key Words: pseudonym, pseudonym tradition, multi-pseudonyms, common pseudonym.

1. DESTPÊK

Mexles, bi kurtî, navê edebî ye ku di edebiyata klasîk a Îslamî (edebiyatên 'Erebî, Farişî, Tirkî, Kurdî û yên dî) de ji aliyê helbestvan û naziman ve di helbest û menzûmeyan de hatiye bikaranîn. Bikaranîna mexlesê tradîsyoneke bingehîn û cudaker a edebiyata klasîk a Îslamî ye ku edebiyata Kurdî ya klasîk jî beşek jê ye. Bêguman mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn ji aliyê seyra tarîxî, diyalektên Kurdî û şêweyên bikaranînê ve hin xweseriyên xwe jî hene. Ji aliyekî dî ve mexles, ji bo di edebiyata Kurdî ya klasîk wek hêmaneke bingehîn a estetîk, poetîk û retorîka metnê edebî jî derdikeve pêş. Ev mijara girîng ku yek ji tradîsyonên bingehîn a edebiyata Kurdî ya klasîk e, heta niha ji putepêdanekê taybet bêpar maye. Bi awayekî siruştî nebûna derfetan rê nedaye ku li Bakur li ser vê mijarê xebat bînin kirin. Li Başûr û deverên dî jî bi qasî ku em dizanin, di vê biwarê de pir kêmkolîn hatine kirin. Herçiqas 'Ezîz B. E. & 'Ebdulla M. E. (2018), bi sernavê "Naznaw le Şî'rî Klasîkî Kurdî da" rasterast li ser mijara mexlesê gotarek nivîsîne jî, di gotarê de li ser hokarên bikaranîna mexlesê hatiye rawestan û di biwara tesbîtkirina mexlesên Kurdî û taybetiyên wan de xebateke tewşîfî û analîtîk nehatiye kirin.

Guman tune ye ku di biwara mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek pirs hene ku li hêviya bersivên xwe ne. Gelo bikaranîna mexlesê di edebiyata Kurdî ya klasîk de çi wextî dest pê kiriye? Gelo ev bikaranîn bi qasî ku bibe tradîsyonek ji aliyê gelek helbestvanan ve hatiye şopandin? Gelo di vê biwarê de di navbera diyalektên Kurdî de cudahiyên bi çi rengî hene? Gelo di teşeyên nezmê yên edebiyata Kurdî ya klasîk de çi şêweyên bikaranîna mexlesê hene? Gelo morfolojîya mexlesên Kurdî bi çi rengî ye? Gelo helbestvanên Kurdî ên klasîk herî zêde di kîjan mijaran de mexles hilbijartine? Gelo di edebiyata Kurdî ya klasîk de diyardeyên pîrmexlesiyê û hevpariya mexlesan tînin dîtin? Armanca vê gotarê ew e ku di çarçoveya pirsên weha de mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn û taybetiyên wan ên bingehîn bînin tesbîtkirin û di vî warî de gaveke destpêkî bê avêtin. Bêguman hemû mijarên navborî yên tînkildarî mexlesê girîng in, lêbelê em dikarin bibêjin ku hin ji wan gelekî girîng in. Bo nimûne mijara hevpariya mexlesan, ji ber ku di tesbîtkirina xwediyê rasteqînê helbestê de dibe sebebê tevliheviyan di nav wan de wek mijareke gelekî girîng derdikeve pêş. Bêguman amadeki-

rîna lîsteyeke giştî ya mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk û tesbîtkirina şeweyên bikaranîna mexlesê jî armancên sereke yên gotarê ne.

Gotar, ji bilî beşên destpêkê û çavkaniyan ji sê beş û encamekê pêk tê. Piştî ku di beşa duyem a gotarê de, wek têgeheke edebiyata Îslamî bi giştî li ser pênase, mahiyet û tarîxa bikaranîna mexlesê hat rawestan, di beşên peyrew de bi hûrgulî taybetiyên mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk dê bîn pêşkêşkirin. Di vê çarçoveyê de di beşa sêyem de mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn hem li gor dîyalektên Kurdî, hem jî bi awayekî alfabetîk dê bîn rêzkirin. Piştî di beşa çarem de di çarçoveya mexlesên ku hatine tesbîtkirin de, li ser taybetiyên curbicur ên mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk dê bê rawestan ku li jorê di çarçoveya armancên gotarê de amaje bi wan hat kirin. Herî dawî bi encamekê dê dawî li gotarê bê dayîn.

Em hêvî dikin ku bi saya vê gotarê, di mijara mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk de bîngehek bê avêtin ku rê li ber gelek xebatên di jî veke.

2. MEXLES BI AWAYEKÎ GIŞTÎ

Di tradîsyona edebiyata klasîk a Îslamî de (edebiyatên ‘Erebî, Farisî, Tirkî Kurdî û hwd) helbestvan û nazîman di helbest û menzûmeyên xwe de bi piranî ji bilî navên xwe yên rasteqîn navekî cuda û taybet wek navên xwe yên edebî bi kar anîne û di cîhana edebiyatê de bi wî navî hatine naskirin. Herçiqas ev tradîsyoneke bîngehîn a edebiyata Îslamî ye jî, di seyra tarîxî ya vê tradîsyonê de, di nav edebiyatên Îslamî de termînolojî û pratîkên cuda tên dîtin. Di helbesta ‘Erebî de ji serdema Cahiliyeyê (sedsala VIem) heta bi sedsala XIIIem, di qesîdeyan de helbestvanan cih dane leqebên xwe, lêbelê ev wek texellusa (mexles) ku piştî di edebiyata Farisî de dê derkeve meydanê nebûye dustûreke bîngehîn a helbestê. Lewra helbestvanên ‘Erebî ne di hemû qesîdeyên xwe de, di hinan de û ne li cihêkî taybet a qesîdeyê, li cihên ku xwestine serî li vê şewazê dane (Xudayar, 1391, r. 68). Dema mirov li qesîdeyên herî kevin ên edebiyata Erebî, yanî li mu’ellegayan dinêre (Cum’e, 2003), ev yek bi awayekî aşkera tê dîtin. Ji ber ku di helbesta ‘Erebî ya vê qonaxê de ev bikaranîn tam rûnenîştîye, teorîze jî nebûye û ji bo wê têgeheke edebî nehatiye danîn.

Di edebiyata Farisî de helbestvanan girîngîyeke taybet bi navê edebî nîşan dane. Dikare bê gotin ku hemû helbestvanan ji bo ku di helbestên xwe de bi kar bînin, navekî edebî hîlbijartine û ev nav bi taybetî di dawîya helbestê de bi kar anîne. Ev şewaz cara pêşî di sedsala Xem de bi destê Rûdekî (k.d.941) ketiye nav edebiyata Farisî û di sedsala XIIIem de wek tradîsyoneke edebî bi tevahî belav bûye. (Xudayar, 1391, r. 63). Jixwe em dizanin ku di edebiyata Farisî ya sedsala navborî de xezel, bi destê sûfiyan ji qesîdeyê veqetiyaye û di helbestê de qonaxa

sebkê Iraqî dest pê kiriye. Berî vê qonaxê di nav helbesta sebkê Xorasanî de xezel beşek ji qesîdeyê ye û ne serbixwe ye (Fesaî, 1373, r. 564, 579-594; Îpekten, 1996, b. III, r. 440-442). Ev jî nîşan dide ku bikaranîna navê edebî di çarçoveya sebkê Iraqî de di teşeya xezelê de belav bûye.

Ji ber ku di edebiyata Farisî de cihê navê edebî dawîya helbestê ye, bi wateya derketina ji helbestê û xilaskirina wê, ji vî navî re “*texellus*” hatiye gotin. Li aliyekî dî divê bê gotin ku di edebiyata ‘Erebî de jî têgeha “*texellus*”ê heye, lêbelê ne bi wateya navborî, bi wateya beyta ku helbestvan bi rêya wê ji beşa nesîbê derbasî beşa medhiyeyê ya qesîdeyê dibe tê bikaranîn. *Texellus* bi vê wateyê derbasî edebiyata Farisî jî bûye. Lêbelê, çawa ku hat gotin, di sedsala XIIIem de wateya navê edebî jî lê hatiye barkirin û bi vî awayî di edebiyata Farisî de du wateyên wê çêbûne (Xudayar, 1391, r. 63-64).

Piştî ku tradîsyona *texellusê* bi wateya xwe ya duyem (navê edebî) di edebiyata Farisî de rûniştiye, ji wê edebiyatê derbasî edebiyatên dî yên Îslamî jî bûye. Êdî hin helbestvanên ‘Ereb jî di bin bandora edebiyata Farisî de di dawîya helbestên xwe de dest bi bikaranîna navên xwe yên edebî kirine (Xudayar, 1391, r. 68). *Texellus* cara pêşî di sedsala XVem de bi destê Şeyxî (k.d.1431) ketiye nav edebiyata Tirkî (Yardı, 2006, r. 12). Çawa ku emê li jêrê di beşeke serbixwe de li ser rawestî, destpêka bikaranîna *texellusê* di edebiyata Kurdî de sedsala XIem e, lêbelê belavbûna wê sedsala XVem e.

Li vê derê xaleke girîng ku divê em li ser rawestî ew e ku di edebiyatên Îslamî de ji bo navê edebî du têgeh hatine bikaranîn: *Texellus* û *mexles*. Çawa ku li jorê hat gotin, ev bikaranîn di edebiyata Farisî de ji sedsala XIIIem ve bi “*texellus*”ê tê îfadekirin. Di edebiyata Tirkî de jî li şûna wê têgeha “*mexles*”ê hatiye bikaranîn. (Yardı, 2006). Helbestvanên Tirk şêweya bikaranînê ji edebiyata Farisî wergirtin, navê wê jî di edebiyata ‘Erebî wergirtine. Lewra em dibînin ku di hin çavkaniyên ‘Erebî de li şûna “*texellus*”ê “*mexles*” hatiye bikaranîn (Xudayar, 1391, r. 68).

Eger em ji aliyê etîmolojîk/morfolojîk ve li têgehên *texellus* û *mexlesê* binêrin, emê bibînin ku her du jî di zimanê ‘Erebî de ji heman raderî hatine dariştin (x-l-s) ku wateya wê ya ferhengî rizgarbûn, derketina ji tiştêkî û xilaskirina tiştêkî ye. Ji ber vê jî di qesîdeyê de ji bo derketina ji beşa nesîbê û destpêkirina beşa medhê *texellus* hatiye gotin (wateya yekem a *texellusê*). Bi heman mentiqê navê edebî ye ku di dawîya helbestê de, yan jî di derketina wê de hatiye bikaranîn jî bi heman navî hatiye binavkirin. Bi gotineke zelal ji ber ku ev navê edebî di dawîya metnê edebî de cih digire jê re *texellus* hatiye gotin. Herçiqas *texellus* û *mexles* ji heman raderî hatine dariştin jî, formên wan cuda ne. *Mexles*, di zimanê ‘Erebî de di forma “*ismê mekan*”ê de ye û tê wateya cihê xilasbûna tiştêkî. Lêbelê *texellus* bi wateya ‘*mexlesgirtin*’, yan jî ‘bikaranîna *mexlesê* ji aliyê nazim/helbestvan ve’

di forma mesderê de ye. Bi baweriya me, ji ber ku mexles di morfolojya Erebi de “ismu mekan” e dibe navdêr (ism) û ji ber vê jî bikaranîna wê wek navê tiştêkî ji bikaranîna texellusa ku wateya mesderê dide guncawtir e. Li gor vê nêrînê navê edebî yê ku helbestvan bi kar tîne dibe “mexles”, bikaranîn û hilibijartina wî navî jî dibe “texellus”.

Çawa ku hat gotin mexles taybetiyeke edebiyatên Îslamî ye. Lêbelê carinan mexlesa Rojhilatî û “navê muste’ar”, ku jêdera wê çanda Rojavayê ye, tîen tevlihevkirin û her du li şûna hev tîen bikaranîn. “Navê muste’ar” di sedsala XIXem de di serdema dewleta Osmanî de li şûna “pseudonym” a Rojavayî hatiye bikaranîn. Di Tirkiya îro de li şûna “navê muste’ar”, “takma ad” jî tê bikaranîn ku tê wateya navê ku nivîskarekî piştî li xwe kiriye. Hem mexles, hem jî navê muste’ar navê duyem in û piştî tîen stendin. Ji vî aliyî ve her du wek hev in. Lêbelê di navbera wan de cudahiyeke bingeîn heye. Di bikaranîna navê muste’ar de faktora sereke daxwaza xweveşartinê ye. Nivîskarên ku ji ber sedemên curbicur naxwazin navên xwe yê eslî bi kar binin navê muste’ar bi kar tînin û bi vî awayî xwe vedişêrin. Lêbelê di mexlesê de bi tu awayî xweveşartin tune. Berevajiyê wê mexles navek e ku di çarçoveya tradîsyoneke edebî de tê bikaranîn û helbestvan bi wî navî tê naskirin. (Okay, 2006, r. 130). Hetta gelek caran navê helbestvan ê eslî tê jibîrkirin (wek Nalî û Siyahpoş) û helbestvan tenê bi mexlesa xwe tê naskirin. Di ferhenga Redhouse de mexles wek şêweyeke surname/paşnavê hatiye pênasekirin (Redhouse, 1880, r. 1780). Bi rastî jî di navbera erka mexlesê û erka pašnavên îroyîn de pêwendiyê xurt dikare bê dîtin. Lewra her du jî hêmaneke nasnameyê ne û li kêleka navê rasteqîn tîen bikaranîn. Heçî navê muste’ar e, ew rasterast li şûna navê eslî tê bikaranîn. Cudahiyeke dî ya mexlesê û navê muste’ar ew e ku mexles bi piranî di metnên edebî yê menzûm de, lêbelê navê muste’ar di berhemên pexşan de hatiye bikaranîn (Yardım, 2006, r. 17).

Di roja me de di hin çavkaniyên Kurdî de ji bo mexlesê peyva “nasnav”ê tê bikaranîn (Xeznedar, b. 1, r. 170) ku bi baweriya me ev ne bikaranîneke di cih de ye. Lewra nasnav tê wateya navê ku mirov pê tê naskirin. Di navbera vê wateya nasnavê û wateyên mexles û texellusê yê derbasbûyî de pêwendiyê etîmolojîk tune. Xuya ye ku di nasnava Kurdî de mentîqa navê muste’ar heye. Ji ber vê jî em pêşniyaz dikin ku nasnav her di vê çarçoveyê de, yanî bi wateya navê muste’ar bê bikaranîn û mexles wek xwe bimîne. Çawa ku di Tirkî de jî ji bo navê muste’ar “takma ad” tê bikaranîn, di Kurdî de jî ji bo navê muste’ar “nasnav” dikare bê bikaranîn. Lêbelê heçî mexles e, ew têgeheke taybet a tradîsyoneke edebî ye.

Di edebiyatên Îslamî de mexlesên ku hatine bikaranîn bi piranî ji aliyê helbestvanan ve hatine hilibijartin. Lêbelê carinan hin mexles ji aliyê ustadên helbestê ve hatine hilibijartin û li helbestvanên ciwan hatine kirin. Dayîna mexlesê ji aliyê

ustadekî/hostayekî ve bi taybetî di edebiyata Osmanî de gelekî berbelav e. Di edebiyata Osmanî de van ustadan dema mexlesek dane helbestvanekî, helbestek jî nivîsîne û di vê helbestê de pesnê helbestvanê ciwan dane û mexlesa wî aşkera kirine. Di edebiyata Osmanî de helbestên bi vî rengî wek “mexlesname” hatine binavkirin (Yardım, 2006).

Di çarçoveya çavkaniyan de (Şerîfî, 1391, r. 397; Akün, 1994, b. 9, r. 394-396; Kurnaz & Çeltik, 2013, r. 90-91) hin taybetiyên dî yê mexlesê weha dikarin bîn rêzkirin: Bi saya bikaranîna mexlesê xwediyê metnê edebî aşkera dibe û di aidiyeta metnê edebî de tu arîşe dernakeve. Ji vî aliyê ve dikare bê gotin ku mexles, navê edebî yê edebiyatvan e ku nahêle berhemên wî bi berhemên edebiyatvanên dî re tevlihev bibin. Loma di edebiyata klasîk de mexles roleke girîng dilîze. Mexles, ji aliyekî ve jî rola îmzeya edebî dibîne ku ji aliyê edebiyatvan ve di berhema wî ya edebî de tê bikaranîn.

Tradîsyona bikaranîna mexlesê gelekî bi hêz e. Loma mexles ji aliyê piraniya helbestvanan ve hatiye bikaranîn. Lêbelê divê bê zanîn ku di edebiyata klasîk de helbestvanên ku mexles bi kar neanîne jî tîn dîtin. Çi menzûmeyên serbixwe ên dirêj bin û çî helbestên dîwanan bin, standarta cihê mexlesê dawîya metnên edebî ye. Çawa ku mexles girîng e, cihê ku tê de derbas dibe jî girîng e, loma ew cih navên taybet werdigirin. Beyt, yan jî benda ku mexles tê de cih digire wek “beyta mexlesê” û “benda mexlesê” tîn binavkirin. Şûna van têgehên, têgehên “beyta texellusê” û “benda texellusê” û şûna van hemûyan jî têgeha “mexlesxane” yê jî hatine bikaranîn. Di qesîdeyê de beyta ku “mexles” a helbestvan tê de cih digire wek “beyta tac” jî hatiye binavkirin. Di hin helbestan de di hemû beytan de mexles hatine bikaranîn. Di vê rewşê de hemû beyt dibin mexlesxane.

Çawa ku hat gotin mexles hem di helbestên wek xezel, qesîde û musemmetan de hem jî di menzûmeyên serbixwe de tê bikaranîn. Lêbelê di teşeyên kurt ên wek rubaî, dubeytî û ferdan de mexles nayê bikaranîn, yan jî pir kêmtir tê bikaranîn. Loma dikare bê gotin ku mexles taybetiyeke helbestên navîn û dirêj e. Di xezel û teşeyên ji xezelê dirêjtir de (qesîde, murebbe’, muxemmes û hwd, terkîb-tercî, mesnewiyên dirêj) mexles tê bikaranîn, lêbelê di teşeyên ji xezelê biçûktir de (rubaî, dubeytî, qit’eyên biçûk û ferd) ji bilî hin awarteyan, mexles nayê bikaranîn.

Navên ku nazim/helbestvan wek mexles bi kar tînin, carinan nav, yan leqebên wan ên eslî bixwe ne, lêbelê bi pîranî peyvên cuda ne ku aliyên wan ên curbicur nîşan didin.

3. TARÎXA BIKARANÎNA MEXLESÊ DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Daneyên li ber destan bi awayekî aşkera nîşan didin ku tradîsyona bikaranîna mexlesê ku di edebiyatên Farisî û Tirkî de hatiye şopandin, di edebiyata Kurdî de

ji diyardeyeke bingehîn û taybetiyeke jêneger a helbestê ye. Ev tradîsyon di tarîxa edebiyata Kurdî de ji aliyê piraniya helbestvanan ve hatiye şopandin. Dikare bê gotin ku ji helbestvanên bihêz heta bi yên lawaz, ji yên navdar heta bi yên ne navdar, ji yên xwedî dîwan heta bi yên ne xwedî dîwan hemû helbestvanên klasîk xwedî mexles in. Bêguman ji bo ku seyra tarîxî ya mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk bê şopandin, berî her tiştî divê mexlesên ku ji aliyê helbestvanên Kurd ve hatine bikaranîn bîn tesbîtkirin. Li jêrê di çarçoveya mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk de du lîste dê bîn pêşkêşkin. Lêbelê qada mexlesên Kurdî qadeke gelekî berfireh e û eger em bibêjin ku beramberî tevahiya tarîxa edebiyata Kurdî tê, dê ne şaş be. Ji ber vê yekê, di vê gotarê de angaşt me ne berhevkin û tesbîtkirina hemû mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk e û aşkera ye ku ev yek di çarçoveya gotarekê de ne pêkan e. Loma lîsteyên ku li jêrê di vê biwarê de dê bîn pêşkêşkin, divê wek lîsteyên destpêkî bîn nixandî. Guman tune ye ku ji vir şûnde ev lîste dê gelekî bîn dewlemendkin.

Di listeya yekem de di çarçoveya dîyalektên Kurdî û rêza kronolojîk de navên helbestvanan hatine rêzkin û mexlesên wan li hemberî wan hatine danîn. Armanç ji vê yekê ew e ku profîla mexlesên helbestvanan li gor dîyalekt û qonaxên tarîxî derkeve meydanê. Çawa ku hat gotin, di lîsteyê de pêşî navên helbestvanan, piştê li kêleka wan mexlesên wan cih digirin. Bêguman danîna navên helbestvanan ji bo aşkerabûna xwediyên mexlesan girîng e. Bi vê rêyê dê bê dîtî ku gelek kesayetên navdar di heman demê de xwedî mexles in jî. Bi baweriya me ev yek girîng e. Lewra bi taybetî di edebiyata Kurmancî de mexlesên gelek helbestvanan, digel ku hene jî, nayên zanîn û ev helbestvan tenê bi navên xwe yên eslî tên naskirin. Dîsa bi armanca ku xwediyên mexlesan bîn naskirin, di nav analîzan de jî navên eslî û mexles bi hev re dê bîn bikaranîn. Ji ber ku ev lîste kategorîk û kronolojîk e, di rêzkirina navên helbestvanan de rêza alfabetîk li ber çavan nehatiye girtin.

NAVÊ ESLÎ / MEXLES

Edebiyata Lorî

1. Baba Tahirê 'Uryan (s.s. XI) / **Tahir** (Kara, 2012, r. 154-163)

Edebiyata Goranî

1. Mela Perîşanê Dînewerî (k.d. 1421) / **Mela, Perîşan, Perîş** (Dînewerî, wr. 28, 35, 48, 49)
2. Mela Mîstefa Ehmed Bêsarani (k.d. 1745) / **Bêsarani, Mehzûnî** (Xeznedar, II, 39; Temo, II, 1415)
3. Xanay Qubadî (k.d. 1754) / **Xana** (Qubadî, 2016)
4. Seyîd Ebdullah Mealî (k.d. 1784) / **Mealî, 'Ebdî** (Selefî & Doskî, r. 127)
5. Welî Dîwane (k.d. 1801) / **Welî Dîwane** (Xeznedar, II, 103)
6. Silêman Begê Zengene (k.d. 1803) / **Zebûnî** (Selefî & Doskî, r. 155)

7. Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d. 1826) / **Nûrî** (Xeznedar, III, 26)
8. Huseynê Berzencî (k.d. 1834) / **Elme'î** (Selefî & Doskî, r. 141)
9. Mîrza Şefî'ê Çamerêzî (k.d. 1836) / **Şefî'** (Xeznedar, III, 247)
10. Xulam Riza Erkewazî (k.d. 1840) / **Xulam** (Xeznedar, III, 205)
11. Mah Şeref Xanima Kurdistanî (k.d. 1848) / **Mestûre** (Selefî & Doskî, r. 176)
12. Mihemed Silêmanê Hewramanî (k.d. 1848) / **Seydî** (Xeznedar, III, 263)
13. Melay Cebarî (k.d. 1876) / **Mela** (Xeznedar, III, 340)
14. Seyîd Ye'qûbê Mahîdeştî (k.d. 1875) / **Seyyid, Sey Yaço** (Xeznedar, IV, 77)
15. Mehmûdê Ehmedê Zengene (k.d. 1878) / **Funûnî** (Selefî & Doskî, r. 194)
16. Mihemed Lûte Cebarî (k.d. 1878) / **Feqîr** (Selefî & Doskî, r. 187)
17. Ehmed Begê Komasî (k.d. 1878) / **Ehmed** (Xeznedar, III, 317)
18. Mela Ebdurehimê Tawegozî (k.d. 1882) / **Me'dûmî** (Xeznedar, III, 352)
19. Mihemed Îmameddîn Senendecî (k.d. 1883) / **Heyran** (Selefî & Doskî, r. 181)
20. Mihemedê Yûsif (k.d. 1883) / **Rencûrî** (Selefî & Doskî, r. 192)
21. Şêx 'Ebdullahê Daxî (s.s. XIX) / **Daxî** (Selefî & Doskî, r. 172)
22. Mîr Miheme Salihê Nî'metullahî (k.d. 1905) / **Seyîd Salih** (Xeznedar, IV, 243)
23. Mîrza Ebdulqadirê Paweyî (k.d. 1910) / **Qadir** (Xeznedar, IV, 383)
24. 'Ebdulhemîdê Kanîmişkanî (k.d.1916) / **'Irfan** (Selefî & Doskî, r. 257)
25. Xelîlê Xidrê Kakeyî (k.d. 1923) / **Xelîl, Xelîl Munewwer, Mihemed Xelîl, Mela Xelîl, Mîrza Xelîl, Mîrza** (Xeznedar, IV, 505)
26. 'Ebdulmecîd Meliku'l-Kelam (k.d. 1925) / **Mecdî** (Selefî & Doskî, r. 283)
27. Kerîm Mehmûdê Kûhsarî (1978) / **Xemgîn, Temkîn** (Selefî & Doskî, r. 298)
28. Mihemed Emînê Kake Şêxê Tewileyî (k.d. 1982) / **Kardoxî** (Xeznedar, VII, 295)

Edebiyata Kurmancî

1. Eliyê Herîrî (s.s. XVI) / **Elî, Şêx Elî, Huseynî** (Adak, 2015, r. 202)
2. ? (s.s. XVI) / **Hemîdî** (Doskî, b.d., r. 19-22)
3. Feqiyê Teyran (k.d. 1632) / **Feqî, Miksî, Mîm û Hê** (Adak, 2015, r. 238)
4. Melayê Cizîrî (k.d. 1640) / **Mela, Nîşanî, Ehmed** (Adak, 2015, r. 208-209)
5. Mîr Îmadedînê Hekkarî (s.s. XVI-XVII) / **Sebûrî** (Doskî, 2016, Nûpelda)
6. Şêx Şemsedînê Exlatî (s.s. XVII) / **Xelwetî** (Adak, 2015, r. 248)
7. Şêx Ehmedê Xanî k.d. (1709) / **Xanî** (Xanî, 2009; Xanî, b.d.)
8. Mihemed Qasim Bayezîdî (s.s. XVII) / **Xanî** (Selefî & Doskî, r. 85)
9. Remezanê Cizîrî (s.s. XVII) / **Remezan, Remezanê Cizîrî, Îbn Dewdan /** (Badî, 2011, r. 57-80.)
10. Axaokê Bêdarî (s.s. XVII) / **Xeyn û Elîf** (Adak, 2015, r. 263)
11. Xalid Axayê Zêbarî (s.s. XVII) / **Laxer** (Adak, 2015, r. 264)
12. Mela Remazanê Ebbasî (s.s. XVII) / **Remezanê Kurdîkî** (Çelebî, 2010)
13. Mela Huseynê Bateyî (s.s. XVIII) / **Bateyî, Melayê Bateyî** (Sadîni, 2010, r. 20)
14. Selîmê Silêman (s.s. XVIII) / **Selîmî** (Adak, 2015, r. 286)
15. Harîsê Bedlîsî (s.s. XVIII) / **Sewadî** (Adak, 2015, r. 289)
16. Mela Mensûrê Girgaşî (s.s. XVIII) / **Mensûr** (Adak, 2015, r. 294)
17. Ebdulletîfê Şoşî (s.s. XVIII) / **Seyfî** (Adak, 2015, r. 294)
18. Muradxanê Bazîdî (s.s. XVIII) / **Muradxan** (Adak, 2015, r. 296)

19. ? (s.s. XVIII) / **Xewsî** (Ulugana, 2016)
20. ? (s.s. XVIII) / **Macin** (Adak, 2015, r. 299)
21. ? (s.s. XVIII) / **Mîna** (Adak, 2015, r. 300)
22. ? (s.s. XVIII) / **Sadiq** (Adak, 2015, r. 300)
23. ? (s.s. XVIII) / **Mun'imî** (Adak, 2015, r. 339)
24. ? (s.s. XVIII) / **Ze'îfî** (Adak, 2015, r. 339)
25. Mela Meqsûdê Durefşanî (s.s. XVIII) / **Durefşanî** (Mecmû'e, j. Kurd 26)
26. Şêx Xalidê Zêbariyê Yekem (s.s. XVIII) / **Xalidê Zêbarî** (Adak, 2015, r. 301)
27. Mela Ebdullahê Bazilî (s.s. XVIII) / **Bazilî** (Selefî & Doskî, r. 126)
28. Mela Îbrahîmê Katûnî (k.d. 1789?) / **Racî** (Doskî, b.t., r. 141)
29. Mihemed Teyar Paşa (k.d. 1817) / **Xerîbî** (Adak, 2015, r. 334)
30. Mihemed Cewad (k.d. 1826?) / **Siyahpoş** (Adak, 2015, r. 311)
31. Şêx Ehmedê Feqîr (k.d. 1832?) / **Ehmed, Feqîrê Ehmed** (Acar, 2016)
32. Mustefa Begê Hekarî (k.d. 1841?) / **Pertew** (Adak, 2015, r. 319)
33. Mela Xelilê Sêrtî (k.d. 1843) / **Şewqî** (Adak, 2015, r. 331)
34. Şêx Nûreddînê Birîfkanî (k.d. 1850?) / **Nûrî** (Birîfkanî, 2002)
35. ? (k.d. 1850) / **Weda'î** (Adak, 2015, r. 321)
36. Mela Mihemedê Pîzanî (k.d. 1850) / **Madîh** (Doskî, b.t., r. 183)
37. Şêx Evdîlqadirê Xanî (s.s. XIX) / **Evdîlqadirê Xanî** (Doskî, b.d., r. 201-204)
38. Bekîr Begê Erişî (s.s. XVIII-XIX) / **Bê û Kaf** (Adak, 2015, r. 333)
39. Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî (s.s. XIX-XX) / **Şeyda, 'Ebdul'ezîz** (Ertekin, 2018, r. 13)
40. Mela Mihemedê Colemêrgiyê Xanî (s.s. XIX) / **Şewqî** (Doskî, 2016)
41. Xalid Beg (s.s. XIX) / **Halet** (Selefî & Doskî, r. 235)
42. Mihemed Xerîbê Şoşî (s.s. XIX) / **Xerîbî** (Şoşî, 2012, r. 42)
43. Mela Ebdurrehmanê Melekendî (k.d. 1874) / **'Abidê Rehman** (Doskî, 2011, r. 35-41)
44. Mela Îbrahîmê Çoqreşî (k.d. 1881) / **Bureyha** (Doskî, 2011, r. 39-43)
45. Mihemed Se'îdê Mizûrî (k.d. 1884) / **Mihîrî** (Selefî & Doskî, r. 307)
46. Şêx Mihemedê Firsafî (k.d. 1892) / **Hezîn** (Selefî & Doskî, r. 321)
47. Şêx Muhyedînê Hênî (k.d. 1897?) / **Sa'î, Heqî** (Adak, 2016, r. 17-20)
48. Şêx Ebdulqadirê Hezanî (k.d. 1905) / **Ebdulqadir, Ebdulqedîr** (Hezanî, 2016)
49. Şêx Evdirehmanê Aqtepeî (k.d. 1907) / **Rûhî** (Aqtepeî, 2011)
50. Şêx Mihemed Can (k.d. 1909) / **Xakî** (Can, 1992)
51. Seydayê Licî (k.d. 1911) / **Hadî** (Licewî, 1992)
52. Şêx Mustefayê Sîsî (k.d. 1914) / **Mustefa (Qewmanî)**, 2011, r. 29-33)
53. Şêx Se'îdê Meczûb (k.d. 1914/1916) / **Se'îd** (Şêxê Meczûb, b.d.)
54. Şêx Ubeydullah (k.d. 1919) / **Şewqî** (Korkusuz, 2004, r. 299-301).
55. Tahayê Maî (k.d. 1919) / **Behaî** (Selefî & Doskî, r. 254)
56. Mela Umerê 'Aşiq (k.d. 1927) / **Laxer, Miksî** (Yılmaz, 2019, r. 21)
57. Feqe Reşîd (k.d. 1932) / **Feqî** (Adak, 2015, r. 332)
58. Mela Nesredînê Zoqî (k.d. 1935) / **Nuseyrî** (Zoqî, b.t.)
59. Mela Ehmedê Heyderî (k.d. 1937) / **Ehmed** (Heyderî, S. M. E., 2012)
60. Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d. 1939) / **Bedrî, Kerbelayî** (Pertev, 2012, r. 16)
61. Şêx Hesîb (k.d. 1947) / **Hesbî** (Axtepeî, 2009)
62. Şêx Mihemed Eskerî (k.d. 1952) / **Eskerî** (Şêx Eskerî, 1989)

63. Mela 'Ebdusselamê Cizîrî (k.d.1952) / **Nacî** (Keşkûla Kurmancî)
64. Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî (k.d. 1956) / **Hadî** (Qewmanî, 2011, r. 37-65)
65. Seyîd Qedrî Haşimî (k.d.1961) / **Bedrî, Zeynî, Qedrî, Hezîn** (Doru, 2016, r. 68)
66. Şêx Tahirê Şoşî (k.d.1962) / **Tahir** (Şoşî, 2012, r. 44)
67. Mela Ehmedê Nalbend (k.d. 1963) / **Muxlis** (Nalbend, 1998)
68. Mela Zahirê Tendûrekî (k.d. 1966) / **Zahir, Zuweyhir** (Tendûrekî, 2007, r. 9)
69. Selaheddînê Gimgimî (1967) / **Serda** (Serda, 2018)
70. Seyîd Eliyê Findikî (k.d.1968) / **'Elî** (Findikî, 2010)
71. Fehmî Begê Peçarî (k.d. 1969) / **Namî, Fehmî, Fehîm** (Peçarî, 1956)
72. Şêx 'Ebdurehmanê Şawirî (1974) / **Mêrgî, 'Ebdurehman** (el-Mêrgî, 2013)
73. Seydayê Hacî Fetahê Hezroyî (k.d.1975) / **Fethî** (Hezroyî, 2012)
74. Ehmed Namî (k.d. 1975) / **Namî** (Selefî & Doskî, r. 213)
75. Şêx Memdûhê Birîfkanî (k.d. 1976) / **Exlatî, Memdûh, Memdûhê Birîfkanî** / (Birîfkanî, 2001)
76. Mela Mihemed Nûrî (k.d.1977) / **Neclu1-ewhedî** (Amidî, 2004)
77. Şêx Qutbedînê Korikî (k.d.1979) / **Xakî** (Adak, 2012, r. 477)
78. Mela Ebdusselamê Mermerî (k.d. 1982) / **'Ubeyd** (Mehmet Yalar)
79. Mela Sîraceddînê Xelîlî (k.d.1983) / **Sîraceddîn, Mihemed Sîraceddîn, Mihemed Sîrac, Sîrac, Sîracê Xelîlî, Sîn, Sîrac Ataç, Sîn û Cîm** (Gümüş, 2019, r. 6-10)
80. Mela Şêxmûsê Hesarî (k.d. 1983) / **Cegerxwîn** (Cegerxwîn, 2003)
81. Mela Nezîrê Bedewî (k.d.1986) / **Dahî** (Bedewî, 2004)
82. Şêx Mûsayê Şêxanî (k.d.1990) / **Mûsa** (eş-Şeyxanî, 1968)
83. Mela Yasînê Şemê (k.d. 1994) / **Yusrî** (Gezer, 2015)
84. Şêx 'Ismetullahê Karazî (k.d. 1996) / **'Ismet** (Doskî, 2011, r. 177-211)
85. Mela 'Eliyê Baqustanî (k.d.2002) / **'Elî, 'Eyn û Lam û Ya** (Ertekin, 2016)
86. Naîfê Hesên (k.d. 2002) / **Tîrêj** (Selefî & Doskî, r. 379)
87. Mela Nûrullahê Godîşkî (k.d.2003) / **Nûrî** (Godîşkî)
88. Şêx Mihemed Emînê Heyderî (k.d.2003) / **Heyderî, Heyderîzade, Emîn, Emînê Heyderî, Heyderîzade Emîn, Heyderî Ehmed** (Heyderî, Ş. M. E., 2012)
89. Mela Hesênê Bizgûrî (k.d. 2007) / **Keleş** (Keleş, b.t) /
90. Mela Xelîlê Mişextî (k.d. 2007) / **Mişextî** (Mişextî, 2012, r. 16)
91. Şêx Muşerrefê Xunûkî (k.d.2008) / **Xunûkî** (Sönmez, 2018)
92. Mela Xalid Korkusuz (k.d. 2011) / **Xuldî** (Ekmekçi, G. 2012)
93. Mela Mistefa Hilêliyê (k.d. 2012) / **Hişyar** (Hilêliyê, b.t.)
94. Mela 'Ebdullahê Kotaliyê (k.d. 2014) / **'Ebdullah** (Sonmez, 2018)
95. Şêx Ehmed Hilmî (k.d.2016) / **Hilmî, Ehmed** (Hilmî)
96. Mela Ehmedê Zinarexî (k.d. 2018) / **Ehmed** (Zinarexî, 2018)
97. Mela 'Elî 'İlmî (s.s.XX) / **Cigernûr** ('İlmî, 2012)
98. Mela 'Eliyê Botî (k.d. 2000) / **'Elî** (Arslan, 2013)
99. Mela İbrahim Paresî / **Bureyhîm** (Paresî, b.t.)
100. Mela 'Îmadeddînê Gurdilî / **Gurdilî** (Mela 'Îmadeddîn)
101. Mela İmadeddîn / **Reşpojan** (Mela İmadeddîn)
102. Mela 'Arifê Dêrsilavî / **'Arif** (Dêrsilavî, 2004)
103. Mela Silêmanê Kercewsî (Kurşun) / **Selman** (Kurşun, 2002)

104. Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingöl) / **Dilkul** (Cizîrî, 2015)
105. Seyîd Şemseddîn Erzen / **Şemsî** (Erzen, 1430)
106. Ebdulqadir Înan / **Ebdulqadir** (Înan, 2014)
107. Mele Se'îd (Seydayê Xelatî) / **Xelatî** (Se'îd/Xelatî 2008)
108. Seydayê Mela Husnî / **Hezîn, Husnî** (Aykaç, 2015, r. 8)
109. Mela Me'sûmê Gundşêxî / **Dilbirîn** (Mela Me'sûm)
110. Mihemed Helîmê Xursa Heftêxuhan / **Xemkûr** (Heftêxuhan, 2003)
111. Mela Mihemedê Hezanî / **Mem, Mîm; Mihemedê Hezanî** / (Hezanî, b.t.; Hezanî, 2010, r. 69)

Edebiyata Soranî

1. Yûsif Karîzî (k.d. 1782) / **Karîzî** (Selefî & Doskî, r. 134)
2. Mîstefa Begê Sahibqîran (k.d. 1850) / **Hicrî, Kurdî** (Xeznedar, III, 168)
3. Ebdurehman Begê Sahibqîran (k.d. 1869) / **Bîmar, Rencûr, Salim** / (Xeznedar, III, 117)
4. Mela Xidirê Mîkayîlî (k.d. 1877) / **Nalî** (Xeznedar, III, 43)
5. Şaweysê Koşkî (k.d. 1882) / **Koşk** (Xeznedar, IV, 591) /
6. Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî (k.d. 1888) / **Exter, Emîn** (Xeznedar, IV, 48-49)
7. Mela Wesmanê Silêmanî (k.d. 1889) / **Fayeq, Hezîn** (Xeznedar, IV, 91)
8. 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade (k.d. 1890) / **Feqê, Derwêş** (Xeznedar, IV, 383)
9. Hacî Qadirê Koyî (k.d. 1898) / **Hacî** (Xeznedar, IV, 145)
10. Omerê Xalid Begê Şalebekî (s.s.XVIII-XIX) / **Rencûrî** (Selefî & Doskî, r. 174)
11. Mîrze Ebdurehîmê Sablaxî (k.d. 1902) / **Wefayî** (Xeznedar, IV, 347)
12. Salihê Ehmed (k.d. 1906) / **Ahî** (Xeznedar, IV, 595)
13. Mihemedê Helebceyî (k.d. 1906) / **Xakî** (Xeznedar, IV, 599)
14. Mihemedê Şêx Osmanê Belxî (k.d. 1906) / **Mehwî, Meşwî** (Xeznedar, IV, 195)
15. Kak 'Ebdullah Kak 'Elî (k.d. 1906) / **Sanî** (Xeznedar, IV, 57) /
16. Mela Salihê Nesrullah (k.d. 1909) / **Herîq** (Xeznedar, IV, 426)
17. Şêx Riza Talebanî (k.d. 1910) / **Riza, Lami'** (Xeznedar, IV, 279)
18. Şêx Selîmê Texteyî (k.d. 1911) / **Salimê Sine** (Xeznedar, IV, 605)
19. Ebdullah Begê Mîsbahuddîwan (k.d. 1916) / **Edeb** (Xeznedar, IV, 457)
20. Tahir Begê Caf (k.d. 1918) / **Tahir** (Xeznedar, IV, 565)
21. Mela Resûlê Bêtûşî (k.d. 1921) / **Menfî** (Xeznedar, IV, 69)
22. Tahirê Bêderî Berzencî (k.d. 1925) / **Fuad** (Xeznedar, V, 421)
23. Şukrî Fezlî (k.d. 1926) / **Hemmi** (Xeznedar, V, 401)
24. Mihemedê Şêx Rizayê Talebanî (k.d. 1928) / **Xalisî** (Xeznedar, V, 40)
25. Ehmedê Hacî Şêx Xenî (s.s.XIX-XX) / **Fewzî** (Xeznedar, V, 39)
26. 'Elî Beg Salar Se'îd Heyderî (s.s.XIX-XX) / **'Elî** (Xeznedar, V, 64)
27. Resûlê Mela Sadiq Mukriyanî (k.d. 1932) / **Edîb** (Xeznedar, V, 187)
28. Şêx Miheydîne Koyî (k.d. 1934) / **Nîhani** (Xeznedar, IV, 63) /
29. Mela Mehmûdê Meznawî (k.d. 1934) / Hicrî (Selefî & Doskî, r. 327)
30. Ehmed Muxtar Caf (k.d. 1935) / **Ehmed** (Xeznedar, V, 451)
31. Ehmedê Sahibqîran (k.d. 1936) / **Hemdî** (Xeznedar, V, 273)
32. Xefûrê Hacî 'Umer (k.d. 1938) / **Mîrza, Xale Mîrza, Mîrza Xefûr** / (Xeznedar, V, 167)

33. Mela 'Ebdulfetah Katibzade (k.d. 1940) / **Wehbî** (Selefi & Doskî, r. 266)
34. Mihemed 'Ebdulla Dişeyî Sineyî (k.d. 1942) / **Mihri** (Xeznedar, V, 522)
35. Kak Mistefayê Hîranî Sanî (k.d. 1942) / **Safi** (Xeznedar, V, 325)
36. Mihemed Şerîfê Muezzin (k.d. 1942) / **Mihri** (Xeznedar, V, 522)
37. Necmedînê Şêx Ebdurehmanê Şorîce (k.d. 1944) / **Sabirî** (Xeznedar, V, 389)
38. Şêx Necmedînê Ebdurehmanê Berzencî (k.d. 1944) / **Sebrî** (Kurdo, 261-263) /
39. Salih Zekî Sahibqiran (k.d.1944) / **Şewqî** (Selefi & Doskî, r. 246)
40. Hesenê Mîrza Qasimê Qazî (k.d. 1944) / **Hesen** (Xeznedar, V, 343)
41. Mela Mihemedê Merîwanî (k.d. 1944) / **Narî** (Xeznedar, V, 167) /
42. Mela 'Ebdullahê Mihemed (k.d. 1948) / **Ziwer** (Xeznedar, V, 229)
43. Husênê Ebdulletîfê Mukriyanî (k.d. 1948) / **Huznî, Damaw** (Xeznedar, V, 439)
44. Faiq 'Ebdullah (k.d. 1948) / **Bêkes** (Xeznedar, V, 489) /
45. Hacî Tewfîqê Mehmûd Axa (k.d. 1950) / **Pîremêrd** (Xeznedar, V, 101)
46. Fayiqê Mela 'Ebdulahê Zêwer (k.d. 1952) / **Bextiyar** (Xeznedar, VII, 63)
47. 'Ebdullah Muftî Pênciwênî (k.d. 1952) / **Muftî** (Xeznedar, VI, 119)
48. Mihemed Emînê Şinoyî (k.d. 1954) / **Emîn, Emînê Şinoyî** (Xeznedar, VI, 215)
49. Mehmûdê Mela Emînê Muftî (k.d. 1955) / **Bêxud** (Xeznedar, VI, 73)
50. Şêx Mehmûdê Berzencî Hefîd (k.d. 1956) / **Nûrbexşî** (Xeznedar, VI, 173)
51. Xidre Ehmedê Nanekelî (k.d. 1957) / **Deştî** (Xeznedar, VII, 101)
52. Cebâr Axay Kanî (k.d. 1957) / **Kanî** (Xeznedar, VI, 409)
53. Şêx Nûrî Şêx Salih (k.d. 1958) / **Nûrî, Şêx Nûrî** (Xeznedar, VI, 351)
54. Hesenê Mela Ebdullahê Zerderû (k.d. 1958) / **Cewherî** (Xeznedar, VI, 63)
55. Şêx Selamê Şêx Ehmed (k.d. 1959) / **Selam** (Xeznedar, VI, 265)
56. 'Arifê Şêx Mehmûdê Qazî (k.d. 1961) / **'Urfî** (Xeznedar, VI, 393)
57. 'Ebdullahê Silêman Beg (k.d. 1962) / **Goran** (Xeznedar, VI, 573)
58. Mela Mistefayê Dêlêjeyî (k.d. 1963) / **Sefwet** (Selefi & Doskî, r. 329)
59. Mihemedê Çirustanî (k.d. 1963) / **Çirustanî** (Xeznedar, VI, 265)
According to the myth, King Oedipus gets into a competition with his father and doesn't want his mother to get close to him. For this reason, Oedipus believes his father is a problematic case and in the end, he kills his father. Therefore, Freud named the psychological condition after him.

There is no doubt that the theory behind this archetype is based on the love of the son toward his mother and the competition with (castration of) his father. This theory has been considered by many theorists such as Lacan. Lacan's theory with respect to this matter is called "Le désir de la mère." The competition occurs between Uranus and his son Kronos and afterwards between Kronos and his son Zeus. That's why Kronos puts his sons into the Gaia/ womb when he realizes he doesn't like them. Kronos takes his mother's scythe and cuts off his father's testicles just to take his father's throne and his power. That's why, "every" son fears his father and thinks that his authority will take away his manhood. But Kronos was also afraid of his throne being taken away by his sons one day, as he did to

1 It would be better to translate the word "gaia" into Kurdish as "cia". This, in turn, not only establishes the connection between "mother" and "place/world/universe" but it also clarifies the sound change from "d" to "c" in the word "dayik" (mother) and in some other place words. For instance, in some eastern provinces of Turkey (i.e. Mardin and Van), people say "cia" instead of saying "dayik" for mother; e.g., "cia min" (my mother), "cia te" (your mother), or "Ciyarbekir" instead of "Diyarbekir". Pronouncing "d" as "c" cannot be considered as a simple coincidence, because the mother of the child ("cia") is also his/her homeland ("cî[h]").

his father before him. Eventually it happens, and Zeus defeats his father with the help of the other gods. This mythological competition including the story of Oedipus forms a strong basis for understanding this archetype.

The competition between father and son is not only a mythological subject. It can still be seen in modern theories and appears as a symptom of many psychological illnesses. Therefore, just like the father, there is also a desire of the son for his mother (*Le désir de la mère*), and the mother is the primary object for the son's desire. At the beginning he does not realize the difference between himself and his mother. He believes his mother and himself are one. That's why the son thinks that the mother is the source of his desire, and the father is the owner of authority, penis, power and strength, and he owns the mother. According to his thoughts, this competition between him and his father arouses some fears and makes him think that he should protect himself from his father's authority. This fear of his father's authority brings up some other elements, such as castrating his father or returning to his mother's womb- or his mother's place.²

This article focuses mainly on the relationship between mother and womb, and how this relationship appeared and is structured. In order to understand this thoroughly, we have to look at some psychic examples of the "mother archetype" and "returning to mother's womb." In the next section, six cases are given to exemplify this issue.

II. CASES

Case 1: Saddam Hussein (1937-2006): Saddam Hussein, the fifth president of Iraq, is a well-known figure to the Kurdish people. During his era, he was known as a fearless, powerful, clever and authoritarian leader. But after the invasion of Iraq by the USA and breaking down of his country and his removal from power, he ran away from the US armed forces for 8 months. Finally, on December 13, 2003 he was captured in a pit near the village of Al-Dawra, close to Tikrit. How did the US armed forces know that he was hiding underground in the village? After arresting the closest man to Saddam, Muhammad Ibrahim Omar Al-Muslit (known as Fat Man), he confessed where Saddam was hiding. The place where Saddam was found was also his hometown. In other words, Saddam was captured in the same place he was born.³ What kind of a clue can this provide us in understanding the value of "mother's place"? To start with, Saddam was hiding

2 "Odyssea ve Odysseus'un Psikanalitik Serüveni": <http://www.anatoliantcraft.org/content/view/1519/31/>

3 "Operation Red Dawn": http://en.wikipedia.org/wiki/Operation_Red_Dawn

around 8 months (maybe 9) in his maternal place: he felt safe in there and trusted that place, which can be associated with the mother archetype and its relationship with gaia/shelter. It means that Saddam, rather than the whole country, trusted his native territory, his homeland, his motherland, meaning that he trusted his mother. Fear, shock, anxiety, etc. are psychological conditions and the solution to them is protection in the safe environment of mother and her womb.⁴ As a result, we can compare the mother archetype with Saddam's capture because the place where Saddam was captured was his safest place, his hometown, his Tikrit.

Case 2: Muammar Qaddafi (1942-2011): Muammar Qaddafi was the president of Libya and called himself "The King of African Kings". Like Saddam, he ran away after the rule of his government was taken away from him. But his death was cruel because he was lynched. What is important to us is that after the resistance started on July 21, 2011, he ran away to Sirte and hid himself there. Sirte was his home as well as his birthplace. According to the information that was given to the *New York Times*⁵ magazine by Mansour Ibrahim Dhao (one of the closest men to Qaddafi), Qaddafi was hiding there with his son Motassim and some of his men (Fahim 2011). One day they were attacked, and in the end his cook and some men were wounded. After that, the decision was made; they will either die there or they will move to another safe place. Qaddafi made the decision to leave there. He found a place; near his birthplace. "*Colonel Qaddafi decided it was time to leave, and planned to flee to one of his houses nearby, where he had been born.*" At first Qaddafi comes to Sirte, his birthplace, and because of the "fear" after they were attacked, he narrowed his surroundings and kept himself closer to his mother place and her womb – i.e., the place he was born.

Whether the need for protection or keeping oneself safe; both Saddam and Qaddafi came to an end in their birthplaces. The similarity of the location is not a coincidence. As it supports the theory of the mother archetype, its value becomes more evident. That is why the adventure of mankind is related to his journey and finding his "arche." Although those leaders were cruel, ultimately they are human beings and at the time of fear and shock they threw themselves into the lap of their mothers, their wombs. According to the mythological point of view, everything that comes from Chaos and Gaia goes back to the womb. Therefore, during escape, the symbols of daily life and those of mythological metaphors are similar

-
- 4 It is very interesting that in Colemerg (Hakkari) province, when kids fight, in order to scare each other they swear that "I will put you back where you came from", or "I will put you back to your mother's vagina", or they say some other bad words related to the mother and her womb.
- 5 "In His Last Days, Qaddafi Wearied of Fugitive's Life": http://www.nytimes.com/2011/10/23/world/africa/in-his-last-days-qaddafi-wearied-of-fugitives-life.html?_r=0

and in harmony. As can be understood from Odysseus and Oedipus, homeland and the womb are shelters. The symbols and metaphors are very similar in Saddam's and Qaddafi's stories. So the mythological stories result in returning home and their "tomb" becomes their "womb."⁶ No place can be as protected, safe and dark as the uterus. As the shelter where Saddam hid himself; dark, protected and "underground"!

Case 3: This picture is a good example because at the end of our research I came to this conclusion: in an orphanage in Iraq, an orphan girl draws her mother's picture with chalk on the ground, and takes her shoes off and assumes the fetal position, she lies on her mother's womb (Tasby 2014).⁷ The most interesting point here is; the girl lies in the fetal position on the picture, probably because of fear or some other psychological symptoms; loneliness, desolation, desperation... trusting her mother, her womb. Because for a child, the most protected and secure place is her mother's womb, and the position which protects her from danger is the fetal position as the girl demonstrates on her mother's image.⁸



The Healthiest Shelter; Mother Tongue

Gaia is place, land, womb, soil and tent but it is not only specified for these particular locations. The examples we have shown are mostly physical symbols, but the relationship between the mother archetype and the womb also relies on something else, and that is the language of the mother-one's mother tongue. The place or location does not only appear in traumas, shock and fear. The boundaries

6 Interestingly, there are many coincidences in language; in English, the pronunciations of "tomb" (grave, the place of dead, cemetery,) and "womb" (root, base, uterus) are similar.

7 see: (Tasby 2014) <http://guardianlv.com/2014/01/orphans-of-war-the-smallest-victims-graphic-video/>

8 Of course, here, being a girl is important, it means, if we observe Lacan and Freud, there might be some discrepancy. However, in this photo, there is only the function of protection and safety of the uterus, not the escape like Oedipus.

of mental and emotional places are determined by one's mother tongue, as Ludwig Wittgenstein in *Philosophical Investigations* (1953) says: "The boundaries of my mother tongue are the boundaries of my world." Just as the womb, motherland or birth place shelters us and symbolizes protection, so does our mother tongue. When one's life is in danger (as in the case of Saddam and Qaddafi), a physical place is created, and there is a will to hide there to feel secure. This is also the case with respect to mother tongue, such that when someone would like to hide in an emotional and mental world, that world is the world of the mother tongue, meaning "the boundaries of one's world." All in all, there is no difference between the womb and the mother tongue.

Case 4: Giyasettin Emre (1919-2008): Giyasettin Emre was elected as the first independent deputy of Mush (Muş) in 1954. During the preparation process of his book (Emre 2006), we had the opportunity to meet and talk many times. He was an understanding and experienced person. We have heard a lot about his memories and many times we talked about his days in Yassiada. Sheikh Giyasettin comes from an important family, and went to a Kurdish school (Medrese). He was the son of Sheikh Ma'rouf and the grandson of Sheikh Fethullah Werqanisi (d. 1899). He learned a lot from traditional schools, but did not write anything in Kurdish. What matters in his story for the sake of this article is the following: After the military strike on May 27, 1960, he was arrested with Adnan Menderes and taken to the prison at Yassiada. During their captivity, he tried to give hope to President Menderes that he was not going to be hanged. But after Menderes was hanged, Sheikh Giyasettin was afraid for his life, too. He thought he was also going to be hanged, but he wasn't, and after one year he was acquitted. What he had relied on in the psychological atmosphere of the prison was, of course, the womb or the mother tongue. With the fear of hanging in mind, Sheikh Giyasettin wrote a Kurdish book: *Rênasî* ("Pathfinding"). He finished that book in the early 1960s in Yassiada, but after 6-7 years, he re-wrote it with Arabic letters, and in 1999, he gave the book to Zeynelabidin Zinar so that he could print it in Stockholm (Emre 1999). The importance of *Rênasî* is neither its context or that it's written in Kurdish. Sheikh Giyasettin had not written anything in Kurdish until that time in prison. In such a psychologically complex situation, he had searched for his "arche" and relied on his mother's womb, in other words, his mother tongue. Writing something in Kurdish language may not have been a conscious choice for Sheikh that time, but once again, the mother tongue is not only a safe zone, but also a natural and an easy reflex, that choice is a mental and an emotional protection which has strong roots in a man. The child embraces his mother. Therefore, Sheikh Giyasettin, intentionally or unintentionally, has reached for his mother tongue and taken it as his companion in prison. At this point of discussion, we

can say that there is no difference between the case of Sheikh Giyasettin and those of Saddam and Qaddafi. The focus in all three cases is the “fetus” and there is no difference between the birthplace and the mother tongue.

The famous linguist and theoretician, Noam Chomsky, has proposed a theory about the concept of “language”, according to which the acquisition of language (grammar) of a child takes place in his mind while he is in his mother’s womb. That means, “human beings are born with an innate “blueprint” for language, what we referred to earlier as Universal Grammar. Children acquire language as quickly and effortlessly as they do because they do not have to figure out all the grammatical rules, only those that are specific to their particular language” (Fromkin 2011, 19).” As Chomsky says, a child is born with a universal grammar and this deep knowledge is innate. Chomsky’s theory suggests that the concept of language is a biological entity and it passes through the genes. As a child sucks milk from his mother’s breast, he also receives his mother tongue from her. At this point, we are going to talk about another case.

Case 5: Muhammad Hamidullah (1908-2002): A famous scholar and academician who is mostly known by his works on Hadith and Siyar (The biography of Prophet Muhammad), Mohammad Hamidullah worked as a teacher in many famous universities. He translated the Surat al-Fatihah of the Quran into Kurdish for the first time in academic history.⁹ For our work, we are interested in the following case of Muhammad Hamidullah: He was born in Pakistan and his mother tongue was Urdu. Since he worked in an academic environment in Europe, he learned nearly twenty languages, but he mostly used Arabic and English, and therefore he had forgotten his mother tongue. He used twenty languages but he abandoned his own language. But one day, Hamidullah had a heart attack and he was taken to the hospital. When it was noted that his condition was getting worse, he was taken to Florida in the United States. He had another heart attack there, but he survived and when he opened his eyes, he started to talk to the nurse in Urdu unconsciously, and he forgot all the other languages he used to know. All those foreign languages had suddenly been lost in his mind and his mother tongue was resurrected; as we mentioned before, the mother archetype is the place of “relief” and “being reborn.” Hamidullah’s case supports Chomsky’s theory, which is about the biological side of the mother tongue as well as the “mother archetype.” As Antti Jalavayi puts it: “My mother tongue is like my skin,

9 In 1980’s, Hamidullah let his student, Ihsan Sureyya Sirma translate the Surat al-Fatihah, the opening surah of the Quran.

and the foreign languages are like my clothes! I can change my clothes, but I cannot change my skin."¹⁰

Case 6: Behiye Yabasun (1958 -): Lady Behiye (or Behiye Hanım) was born in an aristocratic family in Tatvan, Bitlis.¹¹ Since her father was a well-known man in Tatvan, she grew up with the rules and discipline of her family environment. Her father was a very rich man, who owned lands and animals, thus the grooms and housekeepers worked for him. Lady Behiye ran away with Menaf the son of their servants, and married him. Behiye and Menaf were rejected by her family because they had eloped and married without permission. The family members were also not allowed to meet with them. After Behiye and Menaf eloped, they settled in Van.

Behiye Hanım spoke only Kurdish until she escaped with Menaf. However, after she got married and settled in Van, she gradually forgot her Kurdish and started to use Turkish instead. As a matter of fact, when she became a mother, she communicated in Turkish with her children and none of her children knew any Kurdish.

Years later her husband went to Trabzon and married another woman without her knowledge. Behiye Hanım divorced her husband when she found out about his relationship and marriage. The children also expunged their father from their lives. This was the second trauma Behiye suffered after her escape from home and rejection by her family. In addition to the fact that she had eloped with the son of her family's housekeepers and then he in turn ran off with another woman, the biggest pain in her life was "motherlessness." From the day she escaped, her mother was forbidden to meet with her, and she missed her mother very much. Behiye, who had not seen her mother since the elopement and dreamed about her for years, also left her native language in her father's house, and did not speak Kurdish, having almost forgotten it.

Behiye underwent an operation in 2013, at a hospital in Adana. Menaf had settled in Adana and heard that his ex-wife was hospitalized, so he visited her without their children knowing. This visit was very heavy for Behiye Hanım, who was still in love with her husband. As a matter of fact, Behiye, who suffered an attack

10 see: http://www.egitimsen.org.tr/ekler/7890458a4b805fac66ae66fca01a5b7_ek.pdf

11 I received all this information about Lady Behiye from her daughter Pınar Yabasun. I interviewed her on February 11, 2018 in Van. What I wrote about her mother here is based on the information that Pınar Yabasun provided. I am grateful that she agreed to the interview/to share this valuable information with me.

on the plane while she was returning to Van, was taken to the Yüzüncü Yıl University Research Hospital. After this crisis, a new life for Behiye began, and the subject of our article is related to this new life. She no longer remembers her children and she has completely forgotten her Turkish. She began to speak Kurdish again, although she had not used it since she went away from her mother. Behiye forgot everything such as how to eat, how to go to the bathroom, etc. She turned into a baby, but she remembered everything about her mother, and started to talk as if she had never forgotten her mother tongue. Moreover, she no longer understood Turkish. She refused her children's help and did not accept any treatment.

Behiye's wish was to see her mother again. When her family became aware of her condition, her mother came to Van and stayed with her for a month. Her dream had come true. Behiye behaved like an aggressive child until she saw her mother. It was as if she was reincarnated as a child with the arrival of her mother. In fact, we might say that her mother gave birth to her again within one month. Her mother gave back all that she had given to her before. Behiye started eating from her mother's hands and could use the bathroom again, was raised by her mother again within a month. She spoke only Kurdish to everyone during this process, remaining faithful to the connection we established here between the mother tongue and the mother's womb. She had never actually forgotten the language that her mother taught her: She just needed to recover what she already knew.

While her children were searching for ways to learn Kurdish to communicate with her, she showed how strong the mother archetype was. The fact that she started speaking her mother tongue again when she came back to life in the presence of her mother is an important indication that explains and supports the other examples listed above. In Freudian psychoanalytical theory, there is a relationship between the mother's womb and the complexity of the male child, but in the case of Behiye, there is no asylum in the mother archetype with regard to her mother tongue. In terms of reincarnating and restoring life, the "mother" seems to be the primary feeder as she was in her womb. Her mother was the only means of communication, since she spoke the mother tongue. In a sense, it is possible to say that the language which she grew up speaking provided life energy to her again. The first link between the outside world is the umbilical cord extending to the mother's womb and the other link is the mother tongue, as is the case in Behiye's post-illness situation, which can be described as her second birth with Kurdish.

All Behiye's traumas started when she was deprived of her mother, and after her illness, she forgot everything, remembering only her mother and mother tongue, Kurdish. This shows us the power of the bond between the mother archetype and the mother tongue, and supports the claim of this article. Behiye's case supports our thesis but it also goes beyond the topic of neurology, philology, and

psychoanalysis (Tek, 2018). Further research is needed to understand other scientific facts behind this case thoroughly.

III. CONCLUSION

In conclusion, it has been proposed that these six cases strengthen the importance of the mother archetype which Jung established in his theory. These cases also clarify the psychological relationship between a man and his mother/womb/birthplace. Moreover, they explain the value of the mother tongue and its mental and emotional foundation. It is already obvious in all points how significant one's mother tongue is. It is evident that the return to one's native language means returning to one's mother tongue as well as returning to the womb, the home, the homeland. Homeland means mother, it is the place of one's origin. Returning there can only be possible with one's mother tongue, because language does not only resolve the feeling of fear and create an emotionally and psychologically protective environment; it also builds one's personality and identity. That is why the mother archetype cannot exist without the mother tongue. The mother tongue is the "house of thought" referred to in the Holy Quran. "Adam" was together with God (Allah) in innateness. God taught His word to Adam: "We taught the names of things to Adam." The thought process and meaning exposition starts with this ability to name things.

Those who have cut their ties with their mother tongue are also deprived of searching their archetype. They are less likely to recognize this fact unless they get into trouble, or experience fear or a shock. It seems to be the reason why people who are exiled from their homeland feel themselves closer to their mother tongue and would like to return to their birthplace, their mother's place. Safe and secure.

IV. REFERENCES

Printed Resources

- Emre, Gıyaseddin. (2006). *Medreseden Meclise, Meclis'ten Yassıada'ya*. Istanbul: Kent Yayınları.
- Emre, Xiyaseddîn. (1999). *Rênasî*. Stockholm: Weşanên Pêncinarê.
- Fromkin, Victoria; et al. (2011). *An Introduction to Language*. Boston: Wadsworth.
- Geverî, Ayhan. (2014). "Vegerîna Malzarokê yan jî "Gaia"ya Ramanê: Zimanê Zikmakî." *Nûbihar*. Vol: 128. Pp. 5-10.
- Jung, Carl Gustav. (2004). *Four Archetypes*. Taylor&Francis e-Library
- Tek, Ayhan. (2018). Interview with Pınar Yabasun. Van. (11 February 2018).

Electronic Resources

Anadilde Eğitimin Düşünsel Gelişimi ve Önündeki Engeller:http://www.egitimsen.org.tr/ekler/7890458a4b805fac66ae66fca01a5b7_ek.pdf (Date: 04.08.2014).

Kareem, Fahim. (2011). "In His Last Days, Qaddafi Wearied of Fugitive's Life." *New York Times*.http://www.nytimes.com/2011/10/23/world/africa/in-his-last-days-qaddafi-wearied-of-fugitives-life.html?_r=0 (Date: 08.01.2019)

"Odyssea ve Odysseus'un Psikanalitik Serüveni": <http://www.anatoliantcraft.org/content/view/1519/31/> (Date: 08.01.2019)

"Operation Red Dawn": http://en.wikipedia.org/wiki/Operation_Red_Dawn (Date: 04.08.2014).

Tasby, Brandi. (2014). "Orphans of War: The Smallest Victims." <http://guardianlv.com/2014/01/orphans-of-war-the-smallest-victims-graphic-video/> (Date: 08.01.2019)

Dîrok û Nasnameya Bajarê Kerkûkê

History and Identity of Kirkuk City

Abdullah Kiran*

PUXTE:

Bi ser ku em baş pê nizanin bajarê Kerkûkê kîngê hatiye avakirin jî, em dizanin ku dîroka bajarê hê ji beriya mîladê ve dest pê dîke û bênavber heta roja îroyîn tê. Kerkûk yek ji wan bajarên kevin û qedîm e ku jiyê wê di ser du-sê hezar salan de ye. Di vê dema dîrokî ya dirêj de, desthilatiya bajarê Kerkûkê gellek caran guherî. Ev bajarê ku pêşî di destê Asûriyan de bû, dû re ket destê Medan, ji Medan gihîşt Persan û pişt re derbasî Skenderê Mezin bû û di nav sînoren împaratoriya wî de cih girt. Piştî Mîlatê, di sala 226an de bajarê Kerkûk ket bin serweriya Sasaniyan, di dema Xelîfeyê Îslamê Hz. Omer de, di sala 642an de Kerkûk destê Misilmanan û bi avabûna dewleta Abbasiyan re Kerkûk di nav sînoren wan de me. Demekê bi şûn de Kerkûk, ji bo demeke kurt ket bin serweriya Îsmâîliyên Misrî, belê pişt re di nav sînoren dewleta Selçûkî de cih girt. Piştî Selçûkiyan, bi dorê Atabegîyan, Eyyûbiyan, Harzemşahiyan, Moxolan û Osmaniyan li Kerkûkê serweriya xwe ajotin. Di dîroka wê ya ya dirêj de, her gav jî pîrrianiya şênî û niştecîhên wê Kurd bûn. Belê di dawîya sedsala 19an de, piştî ku li Kerkûkê petrol hat dîtin, devjeniyên li ser dîrok û nasnameya Kerkûkê jî dest pê kirin.

Peyvên Sereke: Kerkûk, Kurd, Ereb, Tirkmen, Nasname.

ABSTRACT:

The region of Kirkuk, which is named as Shehrezor in Kurdish, is considered one of the oldest human settlements in Iraqi Kurdistan. We don't know when exactly the city of Kirkuk was built up, but we know that during the times of Assyrian Empire Kirkuk used to be a residential area. After the fall of the Assyrian Empire, the Median became the rulers of Kirkuk and its vicinities. When the Median lost

* Prof. Dr., Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Îqtîsadê, Beşa Têkiliyên Navneteweyî, Muş, Turkiye.
/ Muş Alparslan University, Faculty of Economics, Department of International Relations, Muş, Turkey.
e-mail: 29abdullah@gmail.com

their sovereignty to the Persian, the Persian Empire began to rule over almost all of Middle East. The Kirkuk region later fell into the hands of Alexander the Great's forces, and has been ruled by Antioch, and his successors.

Key words: Kirkuk, Kurds, Arabs, Turkomen, and Identity.

I. DESTPÊK:

Pirsên wek Kerkûk bajarê kê ye, di nav sînoren kîjan axê an welatî de cih digire, şênî û niştecihên wê kî ne, ji kîngê ve li wir rûdinên an çî kes in, van salên dawî gellek tên kirin. Devjeniyên li ser dîrok û nasnemaya Kerkûkê, di dawiya sedsala 19an de, hê ji dema dewleta Osmanî ve, bi taybetî piştî ku li herêmê petrol hat dîtin dest pêkirin û bi nav salan re, geh sist bûn û geh jî geş bûn. Di dema nêzik de, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, cara yekem Tirkiye û Bîranyaya Mezin li ser desthilatiya Mûsil û Kerkûkê ketin pêsîra hev. Dewleta Tirkiyê, bi peymanê ku di sala 1926an de bi Îngilîzan re çêkir, dev ji mafên xwe yê li ser Mûsil û Kerkûkê berda. Navbereke dirêj, ji salên 1930an heta salên 1980an Tirkiyê mesela Mûsil û Kerkûkê neanî rojevê. Piştî şerê Îran û Iraqê, di sala 1986an de, gava ku rewşa Iraqê nebaş bû û Iraq dikir têk biçê û di nav xwe de perçe bibe, hingê Tirkiye rabû, bi tîrsa ku ewê Kurd li herêmê desthilatiyekê ava bikin û Kerkûk di nav sînoren wê de bimîne, doza Mûsil û Kerkûkê kir.

Devjeniyên li ser dîrok û nasnameya Kerkûkê, piştî şerê Xelîcê yê Yekem, ku hêzên hevpeyman bi pêkîşiya Neteweyên Yekbûyî Iraqê ji Kuveytê deranîn cardin geş bûn. Çaxê ku desthilatiya Saddam ya li ser Iraqê û bi taybetî li ser herêma Kurdan sist bû, hingê di sala 1991an de hêzên Peşmerge ketin Kerkûkê. Ji ber ku Amerîka û hêzên hevpeyman nexwestin dawî li desthilatiya Saddam binin, êrîşa li ser Iraqê hat rawestan û Saddam cardin bi darê zorê Kurd ji Kerkûkê deranîn. Belê demekê bi şûn de, bi biryara Netewên Yekbûyî ya 688an, di 5ê Nîsana 1991an de pîrrianiya herêma Kurdan ji êrîşên ezmanî re hat girtin û Kurdan dewleteke federe îlan kir.

Di sala 2003an de, bi pêkîşiya DYAYê (Dewletên Yekbûyî yê Amerîka) êrîşek din li dijî rejîma Saddam hat li dar xistin û di Şerê Xelîcê yê Duwem de rejîma Saddam rûxiya. Di sala 2005an de, bi Rabazavahiya (Qanûnî Esasî) Nû ya Iraqê re, dewleta Iraqê bi awayekî fermî bû federasyon û Dewleta Federe ya Kurdistanê ava bû. Li gor Rêbazavahiya Nû, diviya ku mesela Kerkûkê herî dereng heta dawiya sala 2007an, bi riya referandûmê bê çareserkirin û niştecihên Kerkûkê li ser pêşeroja bajêr biryar bidin, bê ka gelo Kerkûk di nav sînoren Dewleta Federe ya Kurdistanê de cih bigire, an jî ku girêdayî Bexdayê be. Di serî de hukûmeta Nurî el Malîkî ya ku di sala 2006an de hat kar, hukûmetên ku pişt re jî li Iraqê bûn desthilat, tu car nexwestin ku mesela Kerkûkê bibin referandûmê. Di sala 2014an

de, gava ku DAÎŞê Mûsil girt û êrîşî Kerkûkê kir, hingê hêzên leşkerî yên Iraqê ji Kerkûkê vekîşyan û Pêşmerge parastina bajarê hilgirt ser milên xwe. Kerkûk bi qasî sê salan di destê Kurdan de ma û di referandûma serxwebûna Kurdistanê de niştecihên bajarê bi %80an “erê” gotin. Belê hê di nav de mehek derbas nebûbû, di 17ê meha Cotmehê ya sala 2017an de, bi piştgiriya Îranê û “hevkarîya” hin hêzên Kurd, Kerkûk destê dewleta navendî ya Iraqê.

II. DÎROKA BAJARÊ KERKÛKÊ

Gregory Abû'l-Farac, di kitêba xwe ya bi navê Dîroka Abû'l-Farac de, li ser dîroka avakirina bajarê Erbîlê radiweste û diyar dike ku ev bajar di dema Hz. Îbrahîm de hatiye avakirin. Li gor ku Abû'l-Farac dinivîse, Erbîl ji aliyê padîşahê Asûrê Nînos ve, piştî avakirina Nînovayê hatiye çêkirin. Dîsa li gor Abû'l-Farac, bajarê Erbîlê, ji bajarê Qudsê yê ku ji alî Melchîsedîk ve hatiye avakirin hê kevintir e (Abû'l-Farac, 1999:78). Abû'l-Farac qala avakirina Kerkûkê (Şehrezor) nake¹. Belê li gor hin agahiyên, dîroka cîwarbûna li Kerkûkê, hema bêje bi qasî Erbîlê kevin e û digihîje 2600 Beriya Îsa (B. Î.) (Nakip, 2007: 21).

Li gor agahiyên dîrokî bajarê Kerkûkê, Beriya Îsa (B.Î) di sedsala 8an de, ji alî Padîşahê Asurê Sartnabal ve hatiye avakirin. Hingê navê bajarê “Kerh Suluh” e ku ew jî tê wateya “bajarê Sartnabal.” Beriya Mîladê di sedalana II.an de “Kerkûk”

1 “Şehrezor” li Başûrê Kurdistanê, li herêma Cîbalê deşteke berdar e. Pevya “Şehrezorê” ji bo demeke dirêj hem ji bo navê herêmekê û hem jî ji bo navê bajarê “Kerkûkê” hatiye bikaranîn. Me jî di vê gotara xwe de, wek bajar “Şehrezor” û “Kerkûkê” bi heman wateyê bikaranîn. Li gor erdnîgarnasên Misilman, herêma Şehrezorê ji sê bajar û gundên dora wan pêk tê û di navbera Erbîl û Hamadanê de dimîne. Dîsa bi awayê ku erdnîgarnasên Misilman radigihînin Şehrezora ku di nav du bajaran de dimîne û bi awayê “Nîmrâh” (nîvê rê) jî tê bikaranîn, ji aliyê Kisrâ Zûr b. Dahhâk an Kubâd b. Fîrûz ve hatiye avakirin. Li gor hin agahdariyan jî Şehrezor di dema Aşûrnasrîpalê Asûrî (B. M. 883-859) de hatiye avakirin û hingê li vir gelê ku bi awayê “Lûllû” tên binavkirin dijîn. Di salên navbera 1431 û 1470an de ji ber êşa vebayê niştecihên Şehrezorê bi pirranî dişkên û êdî bajêr wek dereke niştecihî (cihê rûniştinî) nayê nişandan. Loma di dema Osmanîyan de, di Deftera Tahrîr ya sala 1560an de, wek navenda bajarê navê Şehrezorê derbas nabe. Dîsa li gor Deftera Tahrîr ya sala 1560an eyaleta Şehrezorê ji deh sancak, heft nehîye û 204 gundan pêk tê û navenda wê ya rêvebirî Zalm e. Di nivê sedsala XVIIan de, yazdeh sancak li ser Şehrezorê ne û ji vê demê bi şûn de bajarê Kerkûkê navenda rêvebirî ya eyaletê ye. Heta sala 1893an, navê bajarê Kerkûkê di nivîsandinên fermî de wek sancaka Şehrezorê tê bikaranîn. Ji ber ku navê Şehrezorê dişibe navê Mutasarrîfiya “Zorê,” di sala 1893an navê sancaka Şehrezorê cardin wek sancaka Kerkûkê tê guhartin.” Bnr. Ahmet Gunduz, “Şehrizor,” *Diyanet Islam Ansiklopedisi*, Istanbul 2010, r. 473-475. V. Minorsky, (C. E. Boswort), Shahrzor, *The Encyclopedia of Islam*, vol. IX, r.218, Şeraffedin Han, Şerefname 1, Kürt Ulusunun Tarihi, Çev. Celal Kabadayı, Yaba Yayınları, 2015, r.128

wek “Arrapkha” tê binavkirin. Di dema Seleûkosan de Kekkûk wek “Seleûkos,” di dema Sasaniyan de wek “Kermakân,” di çavkaniyên Sûryaniyan de wek “Beytî Kermay” an “ el Kerh” tê binakirin. Piştî ku Tîmûr di sedsala XIVan de herêmedagir dike, ji bo bajêr navê “Kerkûkê” tê xebitandin û cara pêşî di kitêba Şerefeddin Ali Yezdî de cih digire. Bi awayê ku tê gotin, Sartnabal Kerkûkê wek kelehek parastinî ya li hember êrîşên Medan ava dike. Bi hilweşîna Împaratoriya Asûrê re Kerkûk dikeve destê Medan, piştî Medan jî dikeve destê Persan (Gündüz, 2002:290-292). Beriya ku bajêr bikeve destê Medan, di sala 626an de (B.Î) leşkerên Nabopolasser yên di şer de serketin bi dest xistine di nav bajêr re derbas dibin, belê di sala 615an de (B.Î), di dema Cyaxeres Kerkûk dikeve bin serweriya Medan (J. H. Krames, I.A. V.5:144)

Di sefera Skenderê Mezin de (B.Î 331) Kerkûk di nav sînorên Împaratoriya Persî de bû, belê pişt re ket destê hêzên Skender û Piştî Îsa (P.Î) di sala 226an de bajar ket bin serweriya Sasaniyan². Di sala 642an de, di dema Hz. Omer de, di şerê Kaadisiyê (Qadîsiye) de Kerkûk ket destê Misilmanan û di sala 750an de, bi avabûna dewleta Abbasiyan re, Kerkûk di nav sînorên wê de ma. Piştî ku Şehrezor û pişt re jî welatê Îranê dikeve destê Misilmanan, hingê hêzên Erebneyartiya xwe ya ku ji berê ve bî Kurd û Îraniyan re heye, hê pêşvetir dibin. Xên ji Qurana Pîroz, hemû kitêbên din tèn derbendkirin(qedexekirin) û Misilman li Şehrezor û Medayînê nêzikî 250 000 kitêban dişewitînin (Varli, 1997:91)³.

Beriya ku Erebn bikevin Şehrezorê (Kerkûkê), li herêmed serweriya Sasaniyan dajo. Sasanî (226-651 P. Î) ji bo eyaleta Kerkûkê Garmakam dibêjin. Di çavkaniyên Asûriyan de ji bo herêmed Beth Garmâi, ji bo bajarê Kerkûkê jî Karkha Beth Selokh dibêjin. Ev nav dikare ji navê Padîşahê Selefkosan, Nîicatorê I. bê, ku di dema wî de bircek di keleha Kerkûkê de tê avakirin. Di dema Sasaniyan de Kerkûk navendek grîng ya Nestoriyan bi xwe ye jî. Metropolîtê Beth Garmâi li Kerkûkê rûdinê. Di çavkaniyên Ereban de Beth Garmâi, bi awayê “Badjarma” û “Karkhîna” derbas dibe. Heta îro jî gelê Şeqlewa û Ayn Kawa, gava ku dixwazin biçin Kerkûkê, dibêjin em diçin “Karkhîna” (J. H. Krames, I.A. V.5:144). Di dema Abu Dulaf de (338/950) li Şehrezorê 60 000 konên Kurdan hene (Minorsky, The Encyclopedia of Islam, vol. IX, r.218).

2 Li gor Şerefxan, bajarê Şehrezorê di dema Sasaniyan de, ji alî Kobadê kurê Fîrûz yê Sasanî ve hatiye avakirin û Şehrezor tê wateya “Şehrê Fîrûz.” Bnr. Şeraffedin Han, Şerefname I, r.128

3 Bi awayê ku Ebdullah Varlî dinivîse, ev helbesta jêrîn di dema ku Misilmanan Şehrezor wêran kiriye, bi zaravê Goranî hatiye nivîsîn : “Hurmuzekan reman atran kejan/ Wîşan şard we gewre ê gerekan/ Zorkarê Erebn kirdine xapûr/ Kenayê pale ê heta Şarezor.” Kurmanciya helbestê weha ye: “Hurmuzekan mizgehî hilweşandin, agir temirandin/ Mezinê mezinan tune hunda kirin/ Zordarên Ereban gund heta Şarezorê wêran kirin. Bnr. Varli, 1997: 91.

Serweriya Îslamê ya li herêma tu car bi awayê desthilatiyeke navendî û yekpare nîne. Herçiqas Şehrezor û axa Kurdan ya derûdorê bi awayekî fermî pêşî bi dewleta Abbasiyan û pişt re bi Emeviyan ve girêdayî be jî, desthilatiya Kurdan carna bi awayê mîrekî û carna jî bi awayê dewletên nîvserbixwe dajo. Di navbera salên 933 û 1044an li herêma Şehrezorê Dewleta Hesneweyh (Benî Hesneweyh) ya Kurdan heye⁴. Hesneweyh ji eşîra Kurdan ya Berzikan tên. Berzikan wek niştêcihên pêşî yê Şehrezorê tên zanîn û hin şaxên eşîrê li Wan, Hekarî û Suleymaniyê rûdinên. Sînorên Hesneweyhan hildikişê Zapa Mezin, ji Çemê Kerxa (Meraş) heta Xuremabadê fireh dibe (Varli, 1997:167-170).

Di sala 1015an de Ebû Şewq êrîşekê tîne ser dewleta Hesneweyhan û div ê êrîşê de Ebû Tahîrê Hesnewyî tê kuştin. Bi ser ku Ebû Tahîr bi xuşka Ebû Şewq re zewicandiye jî, Ebû Tahîr bi armanca ku sînorên dewleta Enaziyan (Benî Enaz) fireh bike zavaşê xwe dikuje. Di sala 1030an de Xeznevî ji ser bajarê Dînore ve êrîş tînin ser Ebû Şewq. Belê Ebû Şewq û kurê xwe Ebul Fetîh bi mîrxasî axa xwe diparêzin û li Xezneviyan dişkênin. Ji ber serketina Ebû Şewq, Xelîfê Bexdayê⁵ ew perrû dike û navê wî bi awayê Ebû Şewq Husam ed Dewle Ebû Şewq datîne. Şehrezor bi qasî 130 salan di destê dewleta Enaziyan de dimîne (Varli, 1997:184-185).

Demeke bi şûn de, Besasîrî bi artêşeke mezin ji Misîrê hat Bexdayê, Xelîfe girt û li Hadîsî avêt girtîgehê. Bi vî awayî Bexda, derûdora wê û Kerkûk jî ket bin serweriya Îsmâliyên Misîrî û bi qasî du salan xutbe li ser navê xelîfeyê Misîrî Muntasîr hat xwendin. Belê piştî du salan Tuxrul Begê Selçûkî bi artêşeke mezin ji Xorasanê derket rê, êrîş anî ser Bexdayê, Besasîrî girt û kuşt. Pişt re Tuxrul Xelîfe ji girtîgehê derxist û ew li ser postê wî yê xelîfetiye da rûniştandin (Fazlullah, 2013:35). Bi hatina Selçûkiyan re dawî li desthilatiya Îsmâliyan hat û pişt re Tugrul Beg desthilatiya dewleta Selçûkî li derên wek Kerkûk, Mûsil, Cezîre, Haleb û Basrayê qayim kir û vê deme hêdî hêdî Turkmen jî li herêma bi cih bûn. Kerkûk bi qasî 63 salan di destê Selçûkiyên Mezin de ma û dû re ket destê Selçûkiyên Iraqê. Belê serweriya Selçûkiyên Iraqê jî tene 12 salan ajot (Nakip, 2007: 23).

Di sala 1139an de Kerkûk ket destê Atabegiyan û Îmameddîn Zengî tevahiya herêma kir bin destê xwe. Îmameddîn Zengî herêma Şehrezorê ji destê Kipçakê kurê Arslantaş stand (Zekî Beg, 2014:144). Serweriya Atabegên Mûsilê di sala 1127an dest pê kir û heta sala 1233an ajot⁶. Pişt re Kerkûk dikeve destê Atabegên

4 Minorsky dîyar dike ku serweriya Hesneweyhan ya li Şehrezorê di navbera 400-434/1010-1043an de ye. Dîsa li gor Minorsky, hatina Turkmenan û Atabegên Zengî ya herêma sedsala 12an e. Bnr. Minorsky, *The Encyclopedia of Islam*, vol. IX, r.218)

5 Di navbera salên 991-1031an de li Bexdayê Xelîfe el-Qadir li ser kar e. Bnr. V. Minorsky, TH. Bois, D.N.Mac Kenize, *Kürtler ve Kürdistan*, Doz Yay. 2004, r. 57.

6 Di sala 1226an de erhêjek giran bajarê Şehrezorê wêran dike. Belê li gor al-Ûmarî (749/1348), beriya ku nifûsa Şehrezorê ji cihê xwe bibe niştêcihên bajêr Kurdên Kosa ne. Li heman herêma şengêhên wek Kosa Madîna, Mamenû- Kosa jî hene. Bnr. Minorsky, *The Encyclopedia of Islam*, vol. IX, r.218

Erbîlî. Ji Atabegiyên Erbîlê Muzafferadîn Gokboru (1154-1232), yek ji wan kesan bû ku 44 salan serwerî kir⁷. Bi salên dirêj li ser desthilatiyê mayina wî, bi “merivatiya” wî ya bi Eyyubiyên re jî têkildar bû. Ji ber ku Muzafferadîn bi xwişka Selaheddîne Eyûbî re zewicandîbû û bi awayekî di bin sî û parastina Eyyubiyên de bû, dema serweriya wî ya salên dirêj bêkêşe ajot (Nakip, 2007:24). Di sala 1174an de, li ser mirina Nureddîn Zengî, Selaheddîne Eyûbî ji Misirê hat Şamê, pişt re Haleb, Mûsil, Amîd, Harran, Enteb ket destê Eyûbîyan. Gava ku Selaheddîn di sala 1183an de Amîd stand, wî bajêr wek mîrektî (begîtî) da Nûredîne kurê Kara Aslan (Abû'l Farac, 1999:431). Ji sala 1175an heta hatina Moxolan, navendên wek Şam, Erbîl, Kerkûk, Heleb û Bexdayê, heta welatên Misir, Yemen û Sudan jî di destê Eyûbîyan de bû.

Di sala 1193an de Harzemşahiyan Selçûkiyên Horesanê ji navê/holê rakirin, Alaeddîn Takîş Harzemşah, li hêla bajarê Reyê artêşa Sultan Tugrul tîk bir. Tugrul li qada şer hat kuştin, Harzemşahiyan serê wî jê kir û şand Bexdayê. Serê Tugrul li Bexdayê, li pêş qesra Xelîfe, li ser qamîşekî hat daleqandin (Abû'l Farac, 1999:467). Hingê derûdor û Kerkûk ji bo demeke kurt ket bin serweriya wan. Belê serweriya Harzemşahiyan dirêj neajot. Demek bi şunda artêşa Moxolan wek kulî û morîstankan ji ser Îranê ve bi ser Kurdistan û Bexdayê ve kişiya. Hulagû beriya ku bikeve Bexdayê pêşî axa Kurdan tarûmar kir. Di meha Befranbarê ya sala 1257an de hêzên Hulagû, ji Hamedanê bi ser Kirmanşan û Huwanê re bi rê ketin. Artêşa Moxolan, li Kirmanşan û derûdora wê qetlîamên mezin pêk anîn û her der talan kirin. Li ser riya ku diçe Bexdayê, çî gund û bajarên Kurdan yê ku derketin pêşiya wan hilweşandin û di Xaneqîne (Kerkûkê) re jî derbas bûn (Fazlullah, 2013: 32, 39).

Di sala 1258an de neviyê Cengizxan Hulagû Bexda û der û dora wê kirin bin destê xwe. Di êrişê Moxolan ya li ser bajarê Bexdayê de, fermandarê leşkeri yê

7 Selaheddîne Eyûbî di sala 1182an de, di meha Muharemê de ji Misirê bir ê ket û hat Sûriyê. Di rê de wê êriş bir ser axa Frenkan û di 11ê meha Saferê de gihîşt Dimîşkê. Di heman salê de Selaheddîn, di meha Rebûleevl' de ji Dimîşkê derket hat nêzikî Taberiyê. Sultan li wir êriş bir Bîsan, Cenîn û el-Gûr û wan deran ji Frenkan stand. Dû re êriş anî ser Beyrûdê û bajêr dorpêç kir. Demekê bi şûn de bi aliye el- Cezîrê ve çû û Çemê Firatê, li hêla Birê (Bîrecîkê) derbas bû. Hingê Muzafferadîn Gokboru, ku kurê Zeyneddîn Alî Kûçîk b. Bektekîn bû, li gel Sultan Selaheddîn bû. Wê gavê Muzafferadîn Gokboru desthilatdarê Harranê bû. Selaheddîn ji mîrên wan hêlan re name şandin, da ku serweriya wî qebûl bikin. Hakîmê (desthilatdarê) Hesenkeyfê Nureddîn Muhammed b. Kara banga wî qebûl kir. Sulan girt ser Ruhayê, ew der dorpêç kir û kir deste xwe. Selaheddîn, desthilatiya Ruhayê da Muzafferadîn Gokboru. Ango Muzafferadîn Gokboru, yek ji desthilatdarên Sultan Selaheddîn bû. Pişt re Sultan êriş bir ser Rakkayê û ew der jî stand. Dû re Selaheddîn bi ser Xebûr, Karkisiya, Maksîn, Ūrban û Nisêbînê ve çû û ev der jî kirim destê xwe. Bnr. Şihabeddîn b. Fazullah El-Ömerî, Mesâliku'l Ebsar, Türkler Hakkında Gördüklerim ve Duyduklarım, Çev. Ahsen Batur, Selenge Yay. İstanbul 2014, s.306

artêşa Abbasiyan, Fetheddîn Îbn-î Kurdî bû. Artêşa Îbn-î Kurdî li ber êrîşa Moxolan şikest û wê rojê ji Bexdadiyan diwazdeh hezar (12 000) kes mirin, ku hin ji wan jî di herî û ritamê de asê mabûn û hin jî di avê de xeniqîbûn (Fazlullah, 2013:32,39). Hêzên Moxol, di 10 Sibata 1258an de, gava ku ketin bajarê Bexdayê, bi deh hezaran mirovî di şûr re derbas kirin (Yousif, 2009: 298). Serweriya Moxolan (dewleta Îlhaniyan) ya li herêmê heta sala 1339an berdewam kir. Piştî Îlhaniyan, Celayîrî (1339-1410), piştî Celayiriyîyan Karakoyunî (1411-1468) û piştî re Akkoyunlu (1468-1508) li herêmê serweriya xwe ajotin.

Piştî Şerê Çaldiranê, di sala 1516an de, Kerkûk bi Mêrdîn, Mûsil, Hesenkêf û Raqqayê re ket bin serweriya Osmaniyîyan. Di dema Osmaniyîyan de, Şehrzor bi awayê eyaleta Kerkûkê tê bi navkirin, ku ev yek bi xwe jî bi awayê binavkirina erdnîgarê tevliheviyekê çêdike (Minorsky, The Encyclopedia of Islam, vol. IX, r.218). Belê demekê bi şûn de Kerkûk cardin ket bin serweriya Sefaviyan. Di sala 1534an de Kanunî Sultan Silêman sefera Irakeynê li dar xist û Kerkûk cardin gihîşt Osmaniyîyan. Kanunî di 21ê Nîsana 1535an de hat Kerkûkê û 24 rojan li vir ma. Ji vê demê bi şûn de, êdî Kerkûk di navbera Mûsil û Bexdayê de wek wargeheke bazirganî girîng bû. Di dema ku Şerefhanê Bedlîsî kitêba xwe ya bi navê û deng Şerefnamê dinivîse de Kerkûk warnişîngeha (îkametgah) paşayên Şehrezorê ye (Şeraffedin Han: 2015: 133).

Di sala 1624an de Sefaviyan cardin Bexda girt û Kerkûk jî ket destê wan, belê Osmaniyîyan şeş sal bi şûn de, di sala 1630î de dîsa Kerkûkê ji Îraniyan standin. Di dema Nadir Şah de, di sala 1733an de, Kerkûk cardin ket destê Safeviyan, belê vê carê jî zêde di destê wan de nema. Bi peymanê ku di sala 1746an de, di navbera Îranê û Osmaniyîyan de pêk hat, Kerkûk li ser axa Osmaniyîyan ma. Piştî Şerê cîhanê yê Yekem, di roja 28ê Razbera 1918an de Kerkûk ket destê Îngilîzan (Gündüz, 2002: 291).

III. NASNAMEYA KERKÛKÊ

Agahiyên li ser bajarê Kerkûkê û bi gelemperî erdnîgariya ku Kurd li ser dijîn, bi awayekî gelek fireh di kitêba Yakût el Hamevî (1179-1229) ya bi navê *Mû'cemû'l Buldan* de cih distînin. Bi awayê ku Hamevî dinivîse: "Şehrezor, di nav Hemedan û Erbilê de, li Cîbalê bajarek fireh e. Zor ji aliyê b. El- Dehhaq⁸ ve hatiye avakirin. Di Farisî de şehîr bi tîgîha bajêr e. Hemû şênîyên (niştêcihên) vê herêmê Kurd in. Edebiyatnas Muhelhel vê yekê got: 'Şehrezor ji bajar û gundan pêk tê û bajarek

8 Dehhak şexsiyete mitolojik e û baş nayê zanîn ku kîngê jiyaye. Li gor hin agahiyan, Dehhak hê beriya ku qebîleyên Hînt û Îranî jî hev biqetin xuya bûye. Bi awayê ku Fîrdewsî di Şahnamê de dinivîse Dehhak kurê Padîşah Mêrdas e. Li gor Îbn-î Esîr, Dehhak Fîrewnê pêşî ye. Li gor rîwayetekê Dehhak Nemrûd e. Bnr. Kurşat Demîrcî, Diyanet İslam Ansiklopedisi, Ankara 2002, Cilt:8, r. 409.

mezin e...’ bajar li çolê ye. Şiddet û xedarî bi gelê wê re heye. Ew jiyana xwe dixin xeterê û tiştên xwe diparêzin. Stûriya sûrên (keleh) bajêr heşt zîra ye⁹. Piraniya begên wan ji wan in (Çetin, 2014: 125).” Li gor agahiyên el Hamevî, li herêma Şehrozê bajarek bi navê Şiz heye, ku gelê wê jî gelek serhildêr e. Di navbera Şehrezor û Şîrê de jî bajarek biçûk heye ku navê wî jî Duzdan e. Bi awayê ku Hamevî dinîvîse, bajarê Şîzê ji alî Dara b. Dara¹⁰ ve hatiye avakirin û Skenderê Mezin li vir tu serketinekê bi dest nexistiye. Şehrezoriyan, tam di dema ku êdî hêvî ji wan hatiye birrîn dîne Îslamê qebûl kirine. Navçeyên Xaneqîn û Kerhûcûddana Şehrezorê, bi tiriye xwe yê bi navê es-Sunnaya tên zanîn” (Çetin, 2014: 126).

Bêguman el Hamevî yek ji wan kesan e ku bi van gotinên xwe rasterast nasnameya bajarê Kerkûkê aşkere dike: “Hemû şênîyên (niştcehên) vê herêmê (Şehrezorê) Kurd in.” Em bi sala ku El Hamevî kitêba xwe nivîsandiye tam nizani bin jî, em dizanin ku ew di navbera salên 1179-1229an de jiyaye. Nexwe ji beyanên el Hamevî bi eşkereyî kifş dibin ku hêj ji 900 sal berê ve, nifûsa Kerkûkê bi piranî ji Kurdan pêk tê, li Kerkûk û derûdora wê Kurd dijîn û Kerkûk bajarê Kurdan e. Di dema Selçûkiyan de, gava ku desthilatiya bajarên Kurdan dikeve destê Tirkmenan, hingê li hin deran, malbatên Tirk dibin beg an mîrên herêmê, belê el Hamevî ji bo Kerkûkê dibêje: “Piraniya begên wan ji wan in.”

El Hamevî weha dinîvîse: “Îro ev bajar bi awayekî delal li ber desthilatdarê Erbîlê Muzaffaruddîn Gokborî b. Alî Koçek serî datînin. Belê Kurdên li çiyayên vê herêmê, çawa ku adetê wan e hêj jî rêwîyan ditirsînin, malên kesên din ji wan distînin û diziyê dikin. Ne li erzê wan ketin, ne kuştin û ne jî dîl standin li ber van kirinên wan nabe asteng. Ji xwe ev adetek Kurdan yê kifş û taybetiyek wan e û eniya wan bi vê hatiye dexmekirin.” El Hamevî di berhema xwe de diyar dike ku Şehrezorî Şafîî ne û alimê (zanayê) navdar, Ebû Bekîr el Mubarek b. El. Hesen eş-Şehrezorî, ji bajarê Şehrezorê ye (Çetin, 2014: 126).

Yakût el Hamevî, di kitêba xwe ya bi navê *Mû’cemûl’ Buldan* de, navê hin bajarên ku Kurd lê dijîn û warê Kurdan e weha dide: Erzen, Sîirt, Hîzan, Hanî, Amîd, Hesenkêf, Semanîn, Tel Fafan, Cezîretû Îbn Omer, Zevzan, Nisêbîn, Dara, Mêrdîn, Dinêser, Ruha (Urfa), Mûsil, Akra, Îmadiye, el- Hisniye (Zaxo), Dakûka, Sîncar, Erbîl, Xaneqîn, Şehrezor, Suherevend, Kirmîsîn, Sîser, Cebel, Hulvan, Hemedan (Çetin, 2014: 126).

Kifş e ku sînorên Kurdistanê, di sedsala pêşî ya avakirina dewleta Osmanî de, ji Meletyayê derbas bûye û heta Sêwasê hatiye. Mevlana Mehmed Neşrî, di

9 Zîra: Navgînek pîvanî ye. Ji serê tiliyê heta enîşkê zîrayek e. Zîra kêma zede 45-50 cantîm e.

10 Di dîroka Persan du Dara (Darîus) hene. Darîûsê Mezin di navbera salên 552 û 485 (B.Î) Darîûsê II. bi navbera salên 423 û 405(B.Î) an serwerî kiriyê. Dara b. Dara dikare Darîûsê duwemîn be.

Cîhannumâ xwe de weha dinivîse: “Wê demê Bâyezîd Xan Meletiyê ji Turkmen, Dîvrikê ji Kurd, Behisnî jî ji Tirkmen stend. Ew ne padîşahên kevin bûn. Ev der piştî Eretne¹¹ ketibû destê wan. Bâyezîd Xan, ew hemû wîlayet stendin. Begên wan reviyên û çûn ba Ereban” (Neşrî, 2008: 154). Îcar ji van rêzên Neşrî jî kifş dibe ku hingê Dîvrik (îro navçeyek li ser bajarê Sivasê ye) di destê begê Kurd de bûye û Yildirim Bâyezîd (1360-1403) ew der ji destê wî stendiye.

Em dizanin ku gotina “Şehrezorê” ji bo demeke gellek dirêj hem ji bo navê herêmekê û hem jî ji bo navê bajarê “Kerkûkê” tê bikaranîn. Belê pişt re, di dema êrîşên Tîmûrîleng ên ser Kurdistanê û sedsala pêşî ya avabûna dewleta Osmanî de, hêdî hêdî navê Kerkûkê jî tê bikaranîn. Di Zafernameya Nîzamuddîn Şamî ya ku di sala 1404an de bi fermana Emîr Tîmûr hatiye nivîsîn de, (Şamî, 1949: 177) û Zafernameya Şerafeddîn Alî Yezdî ku di sala 1425an hatiye nivîsîn de navê Kerkûkê, ne wek herêmekê, belê rasterast e ji bo bajarê Kerkûkê tê bikaranîn (Yezdî, 2013:509). Di Zafernameya Şerafeddîn Alî Yezdî de bi vî awayî ji Kerkûkê tê qalkirin: “...pişt re bi leşkerên xwe re, bi meşeke bilez ber bi herîkîna çem ve pêş ve çû, Tavûkê derbas bû û hat kela Kerkûkê. Gelê kelehê, bi sernermî (îtaatkarî) şûtikên xwe girêdan û bi diyariyan derketin derve” (Yezdî, 2013: 509).

Di nîvê pêşî yê sedasala 17an de Katîp Çelebî (1609-1657) bi artêşa Osmanî re li herêma Mûsilê digere û çavdêriyên xwe di kitêba xwe ya bi navê “Keşfü’z-Zûnun” (Cîhannuma) dinivîse. Hingê Katîp Çelebî Mezopotamyayê bi awayê Kurdistan, Cezîre û Iraqê dabeş dike. Li gor vê dabeşkirinê Mûsil û Şerîzor (Şehrezor) ew der bû ku Osmanîyan jê re El Cezîre digot (Marufoglu, 42/1996). Bi awayê ku Katîp Çelebî salix dide, Kurdistan ji tengava Hurmuzê dest pê dike, Meletî, Merêş û bakûrê Wanê distîne nav xwe, ji alî başûr ve diçe Mûsilê û digihîje heta Iraqa Ereban. Her wekî tê dîtîn Katîp Çelebî jî herêma Şehrezorê di nav sînorên Kurdistanê de dibîne.

Yek ji wan kesên ku hema bêje li seranserê dewleta Osmanî geriya û çavdêriyên xwe nivîsandiye Evliya Çelebî (1611-1685) ye. Riya Ewliya Çelebî di van gerên wî de bi ser gelek bajarên Kurdistanê jî ketiye nivîskar di derbarê wan de agahiyên xwe bi hurgilî nivîsandiye. Evliya Çelebî, di Seyahatnameya xwe de, gava ku qala Kurdistanê dike Kerkûkê jî wek bajarekî Kurdistanê dijmêre û weha dibêje: “Welatekî mezin e, kujek wê ji aliyê bakûr ve digihîje diyarî Erzerûmê, ji wir da-dikeve diyarî Wan, diyarî Hakkarî û ber bi jêr ve Cîzîr, Îmadiye, Mûsil, Şehrezor, Herîr û Erdelanê distîne nav xwe û heta ku dişiqite Bexda, Derne, Derteng û Basrayê, heftê qonax Kurdistan tê qebûlkin.” Qet şik tune ye ku Seyahatna-

11 Mîrîtiyek ku di navbera salên 1325-1343an de, li Enedolê, li herêma Amasya ava bûye. Binêre: Murat Alî Ciwan, “Amasya Kurd Emîrlîgî,” <https://muradciwan.com/2018/02/18/amasya-bagimsiz-kurd-emirliqi/>, gihîştin: 12.12.2018.

meya Ewliya Çelebî û agahiyên wê ji alî dîroknasên rojavahî ve jî wek xebateke rastîparêz tîen hesabandin. Kifş e ku Ewliya Çelebî sînoren Kurdistanê heta pêş Bexda û Basrayê dibe. Bi vî awayî ew rastiyeke dîrokî ya ku baş tê zanîn jî destnîşan dike: Axa Ereban her ku diçe bi aliye Kurdistanê ve fireh dibe. Eger Osmanîyan bi zanebûn pêşî li firehbûna Ereban negirtina, dibû ku îro ji alî başûr ve hêj bêtir cih û warên Kurdan biketana bin serweriya Ereban.¹² Îcar Ewliya Çelebî, gava ku giliyê (behsa) Nehavendê dike, cardin ji qala Şehrezorê dike û dibêje ku niştasihên derûdora keleha Kînkîvera ku bi qasî merhaleyekê ji Nehavendê dûr e, bi gelemperî jî Şehrezorê ne û Kurdên Şîî ne (Ewliya Çelebi, 2013: 461).

Di dema Osmanîyan de Kerkûk wek sancaqek li ser wîlayeta Mûsilê ye, loma hergav çaxê ku qala Mûsilê tê kirin, Kerkûk jî di nav mijarê de cihê xwe digire. Osmanîyan ji bo herêma Mûsil û Kerkûkê Cezîra Jorîn jî digotin. Herêma Mûsilê di berhemên ku ji alî erdnîgarnasên Ewrûpê ve hatine nivîsîn jî wek Cezîra Jorîn hatiye salixdan (Darkot, 1971: 743-44).

Li gor hejmartina nifûsî ya ku dewleta Osmanî di salên 1881-1883an de pêk tîne, nifûsa Kerkûkê 22 hezar û 694 kes e. Ji vê nifûsê 22 008 kes Misilman, 2 kes Rûm, 243 kes Katolîk û 441 kes jî Cihû ne (Gündüz, 2002: 292). Kifş e ku di vê nifûsjimariyê de, Misilman û civatên ku ne Misilman in cihê hatine jimartin, belê mensûbiyeta etnîkî ya Misilmanan nehatiye diyarkirin.

Panzdeh- şanzdeh sal piştî vê nifûsjimariyê, vê carê Şemseddîn Samî yê ku bi eslê xwe Arnawûd e, hem li ser Kerkûkê û hem jî li ser pêkhatina etnîkî ya bajêr agahiyên gelek hêja dide. Ji agahdariyên Şemseddîn Samî, bi aşkerayî xuya dibe ku Kerkûk bêşik û bêguman bajarekî Kurdan e. Ne beriya wî û ne jî piştî wî, tu kesî bi qasî wî bi berfirehî agahî li ser nasnameya etnîkî ya bajêr nedaye. Şemseddîn Samî, di kitêba xwe ya navê Kamûsu'l-A'lâmde, ku di navbera salên 1889-1898an de amade kiriye de, bi vî awayî qala Kerkûkê dike: "Ji çaran sisêyê gelê Kerkûkê Kurd e, ji çaran yek jî Tirkmen, Ereb û yê din in. Li bajêr 760 Cihû û 460 Keldanî jî hene" (Sami, 2001: 182).

Herwekî tê dîtin Şemseddîn Samî, ne tenê rêjaya Kurdan, bê ka bi çi awayî li bajêr piraniyê pêk tînin, her wiha agahiya bê ka li bajêr çend Cihû û çend Keldanî hene jî dide. Îcar çend sal piştî Şemseddîn Samî, vê carê Alî Rîza, di berhema xwe ya bi navê Atlaslı Memâlik-i Osmanîye Coğrafyasi de, ji bo sala 1902an nifûsa herêmê Kurdistana başûr wiha dide: Nifûsa bajarê Mûsilê 61000, nifûsa Silêmaniyê 15000, ya Kerkûkê 30000, ya Sîncarê 7000, ya Erbilê 6000, ya Koysancakê 10000, ya Amediye 5000. (Ali Rîza, 1902: 57).

12 Ji bo agahiyên ku dewleta Osmanî rê nade ku eşîrên Ereban ber bi axa Kurdistanê ve fireh bibin, bnr. (Kandemir, 2016).

Çend sal piştî Alî Riza, vê carê Îbrahîm Hîlmî, di kitêba xwe ya bi navê *Memâlik-i Osmaniye'nin Cep Atlasi* de, nifûsa Mûsilê ya sala 1907an 351 200 kes nîşan dide. Di heman berhemê de nifûsa bajar û navçeyan wiha tê dayin: Navenda Mûsilê 65000, sancaka Kerkûkê 30000, sancaqa Silêmaniyê 15000 û Koysancak 10000 (Î. Hilmi, 1907: 220-221).

Di Ansîklopediya Îslamê ya ku bi Îngilîzî hatiye amadekirin de jî li ser nifûs û nasnameya Kerkûkê agahdarî tînin dayin û Kerkûk wek bajarakî Kurdan tê nîşandan. Di benda Kerkûkê ya ku ji aliyê J. H. Kramers ve hatiye nivîsandin wiha tê gotin: "Di sedsala 12an de Kerkûk û derûdora wê di bin serweriya begitiya Tirkkan Begtekîn de bû, ku paytexta wê Erbîl bû. Di sala 1638an de Mûratê IV. Bajar (Kerkûk) stend, belê xwediyê herêmê yê rastîn eşîrên Kurd in. Li gor jimartina sala 1965an nifûsa Kerkûkê li ser hev 184000 kes bû. Ji vana 71000 Kurd, 55000 Tirkmen, 41000 Ereb û yê din bûn...Herêma Kerkûkê di eslê xwe de mesekenek Kurdan e" (J. H. Krames, I. A. V. 5: 145).

Di sala 1878an de wîlayeta Şehrezorê jî bi ser Mûsilê ve tê danîn û li ser hev wîlayeta Mûsilê bi Stenbolê ve tê danîn. Heta sala ku ev herêm ji destê dewleta Osmanî derketiye jî statûya wîlayeta Mûsilê neguheriye (Marufoglu, 1988: 39).

Sancaqa Kerkûkê di belgeyên Osmanîyan û nivîsên resmî de heta sala 1892an bi awayê Şehr-î Zor derbas dibe. Îcar ji ber ku ev nav, bi navê Mutasarrafîya Zorê re gelek dirûvdar e, ji bo ku bi vê dera ha re têkil nebe, ji sala 1893an wê de Osmanîyan navê Kerkûkê bi kar anîne. Mutasarrafîya Zorê li başûrê Diyarbekir û Halebê cih distend (Bayrak, 2016).

Di sala 1894an de, dabeşîya desthilatî ya wîlayeta Mûsilê

Lîva	Navçe (Qeza)
1- Mûsil	1-Îmadiye 2-Zaxo 3-Akra
2- Kerkûk	1-Erbîl 2-Salahîye 3-Koysancak 4-Rewandiz 5-Ranya
3- Silêmaniye	1-Karadag 2-Baziyan 3-Merge 4-Şehrî-bazar 5-Gulanber

Çavkanî: *Mûsil Salnamesi*, 1312 (1894), Ragihêr: Marufoglu, r.39

Bi awayê Îbrahîm Hilmî dinivîse, Wîlayeta Mûsilê ji sê sancaq, 14 navçe, 28 nahîye û 3394 gundan pêk tê (Î. Hilmî, 1907: 220-221).

Piştî şerê Cihanê yê Yekem, hem Meclisî Mebûsan ya Stenbolê û hem jî Meclisa ku li Enqerê hat danîn, sînorên dewleta nû ya ku ewê bê avakarî, derên ku Kurd û Tirk lê dijîn, ango Enedol û Kurdistanê didîtin. Mustafa Kemal, di 1ê Gulana 1920an de, di axatîna xwe ya meclisê de wiha digot: “Sînorê me yê netewî ji başûrê Îskenderûnê derbas dibe, ber bi Şerqê ve dirêj dibe, Mûsil, Silêmaniye û Kerkûkê digire nav xwe (TBMM Gizli Celse Zabıtları, 1985:163).” Di demajoya Lozanê de jî, serokê heyeta Tirk Îsmet İnönü, hergav li ser vê bingehê doza Mûsilê kir: “Em Mûsilê dixwazin, çimkî em dizanin ku piraniya nifûsa Mûsilê ji Kurdan pêk tê... Dewleta me, dewleta Tirk û Kurdan e” (Kiran, 2001, sayî:148).

Di sala 1918an de gava ku Îngilîzan Mûsil dagir kir, hingê wan li Erbilê parêzgehek (walîtiyek) nû saz kir. Li gor nîrxandina Îngilîzan, di sala 1921an de, ji şênîyên herêma Kerkûkê, 75000 Kurd, 35000 Tirkmen, 10000 Ereb, 1400 Cihû û 600 Keldanî bûn. Di sala 1925an de lijneyeke Koma Netewan (League of Nation) jî ji bo çareserkirina pîrsa Mûsilê hatibû herêmê û li ser avahiya demografîk lêkolîn pêk anîbûn. Li gor agahiyên vê lijneyê jî, ji % 63ê nifûsa Kerkûkê Kurd, ji % 19 Tirkmen û ji %18 jî Ereb bûn (Talabany, 2007:75-78).

IV. LI KERKÛKÊ EŞÎRÊN KURDAN

Her kesê ku bi qasî piçekî li ser civaknasiya Kurdan lêkolîn kiribe, ewê bi hêsanî bibîne ku rastiyeke Kurdan ya “eşîrtî” heye û bi taybetî di sedsala 19 û 20an de, çanda eşîrî di nav Kurdan de gelek serwer e. Hema bêje cih û warên eşîrên Kurdan kifş in û eşîrên Kurdan li seranserê Kurdistanê belav bûne. Eşîrên Kurdan, dixwazî bi tevahî cîwarbûyî bin, dixwazî jî koçer û nîvkoçer bin, ew tu car jî nav sînorên axa Kurdistanê dernakevin. Xêynî jî yên ku bi armanceke siyasî ji ser axa xwe hatine dûrkerin, hemû eşîrên Kurdan pergala xwe ya eşîrtî li ser axa Kurdistanê ajotîne. Di raporeke artêşa Osmanî ya (Osmanlı Ordu-yu Humayun Raporu) sala 1905an de, eşîrên Kurdan yê li wîlayetên Mûsil û Şehrîzorê (Kerkûkê) nav bi nav tên dayin.

Di sala 1905an de eşîrên Kurdan yê li Mûsil û Şehrîzorê: Yên Koçer, yê nîvkoçer û yê cîwarbûyî:

Tablo: 1

Nav	Milên Wan	Nifûsa Wan	Herêmên wan
Tayyârî	14	48.100	Îmadiye
Sûrçî	4	14.900	Akra, Rewandiz
Sûrçî	1	250	Erbîl, Altinkopru
Kakaî	1	220	Erbîl, Kekek
Kakaî	1	850	Dakûk
Rîzarî	2	630	Rewandiz
Herkî	12	12.270	Akra, Rewandiz
Şîrvan	1	4.670	Rewandiz
Mezûrî	2	4.400	Rewandiz
Bradost	3	4.500	Rewandiz
Hoşnâv	2	7.500	Koysancak
Pîşkelî	1	3.500	Raniye
Bezîrî	1	2.140	Raniye
Mandimira	1	430	Raniye
Belbâs	7	1.800	Raniye
Aker	5	2.610	Raniye
Yerlî Babûlî	2	435	Raniye
Susnî	1	265	Raniye
Kork	1	341	Raniye
Balekî	2	1.360	Rewandiz
Şeyh Bizînî	2	2.710	Erbîl
Pîşter	3	5.260	M. Hamid
Kafroş	1	1.588	Çemçemal
Bâne	1	2.310	Bane
Îsmail Azîzî	7	2.275	Silêmaniye
Berzenci	2	2.730	Silêmaniye
Guvara	-	650	Silêmaniye
Caf	25	45.460	Silêmaniye
Palânî	7	1.330	Qaratepe
Hemavend	6	840	Çemçemal
Şûvan	3	4.500	Şûvan
Tâlbânî	1	1.670	Qaratepe

Çavkanî: Osmanlı Ordu-yu Humayun Raporu-1905

Mihemed Emîn Zekî, di kitêba xwe ya bi navê *Dîroka Kurdistanê* (r. 345-348) de, eşîrên derûdora Kerkûkê wiha dide:

Tablo: 2

Herêma Îdarî	Eşîret	Milên Wan
Herêma Îdarî	Eşîret	Milên Wan
Mendelî	Qerelûs	Geş, Kaytûn, Çarmawend, Kaewend, Neftçî, Gawsuwarî
Xanekîn	Soremirî	Kelhor, Tûtik, Mamecan, Eyne, Entarî
Bajarê Kerkûkê	Şerefbiyan	Korekî, Emirhanbegî, Azîzbegî, Gaxar, Nadirî
Navçeye Xanekîn	Baclan	Comûr, Kazanlı
Navçeye Xanekîn	Delo	Camrêzî, Pencankeştî, Kaş
Navçeye Xanekîn	Delo	Tarkowend, Salimweysî
Navçeye Xanekîn	Gaxwar	
Navçeye Xanekîn	Keze	Sadallah Beg, Koxda, Baram, Serkal
Navçeye Xanekîn	Palanî	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Berzencî	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Omer Mil	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Tilşan	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Zengene	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Zend	Muhemed Salix Axa, Tahîr Xan, Ûlyan, Xenî
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Dawide	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Leylan	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Talabanî	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Cebarî	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Sewan	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Salihîye	
Bajarê Kerkûkê û Sancaka Xanekîn	Şêxbizînî	

Yek ji wan kesên ku cara pêşî bi awayekî akademîk li ser eşîrên Kurdan nivîsandîye Mark Sykes e. Beriya ku gotara xwe ya li ser eşîrên Kurdan di sala 1908an de, di kovara *The Journal of the Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland* de çap bike, Mark Sykes bi qasî 7 500 mîlî di nav axa Kurdan de digere û bi gelek kesan re dipeyive (Sykes, 1908, vol. 38: 461-486). Mark Sykes, kêr-zêde navê hemû eşîrên Kurdan û derên ku lê dijîn dide. Ew tenê li ser eşîrên Kurdan yê ku li ser axa Kurdistanê dijîn nesekiniye, her wiha ew qala eşîrên Kurdan yê ku li Enedolê dijîn jî dide.

Mark Sykes di gotara xwe de navê hin eşîrên Kerkûkê jî dide. Bêguman yek ji eşîrên Kerkûkê yê herî mezin û herî belavbûyî Şêxbizîni ne. Sykes gelek pesnê jîrtî û mêrxasiya Şêxbizîniyan dide û diyar dide ku ew gelek şervan û siwarên baş in. Sykes dibêje ew ewqas jîr in ku tivinga Martini Henry çêdikin. Milekî Şêxbizîniyan li çend bajarên Enedolê jî belav bûne û Sykes bawer dide ku ew eşîr di dema Yavûz Sultan Selîm de ji ser axa xwe hatine sirgûnkirin (Sykes, 1908, vol. 38: 461-486).

V. BI DEMOGRAFIYA BAJARÊ KERKÛKÊ LEYISTIN

Ji Kerkûkê qewirandin û paqijîya etnîkî ya li hemberî gelê Kurd, di sala 1963an de bi awayekî sîstematîk dest pê kir. Di Tîrmeha sala 1963an de, Alî Salih el Sadî li ser navê rejîma Baasê, li derûdora Kerkûkê 13 gundên Kurdan bi tevahî hilweşandin û li navçeya Dûbzê ya ku li ser bajêr e, 34 gundên Kurdan vala kir û Ereban di cihê wan de bicih kirin. Bêguman ev destpêk bû. Piştî ku rejîma Baasê cihê xwe baş bi keys kir û di sala 1968an de serwerî bi tevahî kir destê xwe, ji Kerkûkê qewirandina Kurdan bênavber dom kir. Di salên 1971 û 1972an de, rejîma Baasê bi hezaran Kurdên Şîî ji Kerkûkê derxistin û ew şandin Îranê. Çimkî Baasiyan dizanibûn, eger ew pêşniyaza Molla Mistefa Berzanî ya hejmartina nifûsa Kerkûkê qebûl bikin, hingê ewê kifş bibe ku pîrriya niştecihên derûdora bîrên petrolê yê Kerkûkê Kurd in (P. Sluglett: 715).

Di nabeza salên 1963 û 1988an de, 779 gundên Kurdan yê li derûdora Kerkûkê hatin hilweşandin. Ji bo ku pêşî li vegara Kurdan were girtin zevî û baxçe hatin şewitandin, pez û dewarên wan hatin talankirin, bîrên avan hatin korkirin û goristanên Kurdan hatin xerakirin. Di encama vê tevgera paqijîya etnîkî de, 37, 726 malbatên Kurd ji gundên xwe hatin derxistin. Eger serê her malbatê 4-5 nefer jî bê hesabandin, hingê di dora 200,000 kesî de Kurd ji cih û warê xwe hatin kirin. Rejîma Baasê, heta destpêka şerê Îran û Iraqê jî têkilî Tirkmenên Kerkûkê nedibû, belê di dema şer de, gundên Tirkmenên Şîî jî li Kerkûkê hatin xerakirin (Talabany, 2007: 75-78).

Bêguman dewleta Iraqê tenê Kurdên ku li gundan dijîyan ji cihê wan derne-xist, Kurdên bajarî jî armanca (hedefa) wê bûn. Karkerên ku di şirketên petrolê de

dixebitin, karmand û mamosteyên Kurd jî ji vê hovîtiyê para xwe standin. Rejîma Baasê navê hemû kuçe û dibistanên bajêr guhart û zivirand Erebi¹³. Kurdên ku ji bajêr derdiketin, tenê karibûn milkên xwe bifirosîn Ereban û kesên ku ne Ereban bûn, ji bo wan destûr nebû ku li bajêr milk bikin. Ji bo Ereban bi sedan, bi hezaran şengehên nû (residential area, cîhê rûnştinê) hatin vekirin. Paqijiya etnîkî piştî Şerê Kuveytê yê sala 1991an jî berdewam kir. Di sala 1997an de hukûmeta Iraqê, Kela Kerkûkê ya nav bajêr, bi dêr û mizgeftên wê ve hilweşand. Li gor Komîteya Şopandina Mafên Mirovî (Human Rights Watch), hukûmeta Iraqê di navbera salên 1991 û 2003an de, ji 120 000î heta 200 000 kesî ji Kerkûkê derxist (Human rights watch, March, 2003)

Di 40- 50 salên dawî de, tovbirriya (genocide) Helebçê û Enfal jî tê de; şer, kuştin, sirgûn, penaberî, malwêranî û bêbebestî, her çi xerabiya ku hat serê Kurdên Başûr jî, hema beje hemû jî ji ber Kerkûkê bûn (Kiran, 2016: 154). Di 11ê Adara 1974an Kurdan bi dewleta Iraqê li ser otonomiyekê li hev kirin, belê bi Peymana Cezayîrê re, gava ku Saddam Huseyîn û Şahê Îranê, di 6ê Adara 1975an de, di civîna OPECê de li hev kirin, dotira rojê Iraqê êrîşî Kurdan kir û otonomiyê Kurdan têk çû (Mcdowall, 2004: 452). Ji wê rojê bi şûn de siyaseta Erebkirina Kerkûkê û guhartina demografiya bajêr, hê bêtir bi awayekî sistematîk hat ajotin. Eger serokê Kurdan Mele Mistefa Barzanî, Kerkûkê bi destê Iraqê ve, bi nîvenîvî jî berda, dibû ku ev bela nehatana serê Kurdan. Belê gava ku Saddam Huseyîn pêşniyaza dabeşkirina Kerkûkê ji Mele Mistefa re anî, ewî ev pêşniyaz red kir¹⁴ (Çandar, Al-Monitor, October, 2017) Mesela Kerkûkê, piştî Mele Mistefa Barzanî ji bo hemû serokên Kurdan yê siyasî bû meseleyeke prensîbî. Serokê Kurdan yê ku cara pêşî got: “Kerkûk Qudsa Kurdistanê ye” Celal Talabanî bi xwe bû.

Kurdan bi tu awayî dev ji doza Kerkûkê bernedan. Îcar piştî ku Amerîka di sala 2003an de dawî li rejîma Saddam Huseyîn anî, herçiqas Kurdan nikaribû yekser Kerkûkê bi ser axa Kurdistanê ve berdin jî, di sala 2005an de, bi qebûlkirina Rêbazavahiya (Qanûnî Esasî) Iraqê, rûpelek nû ji bo çareserkirina mesela Kerkûkê vebû. Li gor rêbazavahiya Iraqê ya ku di 15 meha Razberê ya sala 2005an de bi referandûmê hat pejirandin, ewê her sê wîlayetên Kurdan wek herêmekê bihata naskirin û ji alî Hikûmeta Kurdistanê ya Herêmî (Kurdistan Regional Govern-

13 Ji bo siyaseta Erebkirina Kerkûkê, bnr. Şoriş Hacî, Kerkuk'un Araplaştırılması, Doz Yayınlar, 2006. Şoriş Hacî di vê berhema xwe de, siyaseta guhartina demografiya Kerkûkê û Erebkirina bajêr bi 80 belgeyên dîrokî, tevî kopyayên wan ên orjînal pêşkiş dîke. Her belgeyek bi serê xwe îbretêke sûtî ye, belê ji ber ku dewleteke Kurdan tune, her cûre hovîtiya dewleta Iraqê jê re kar maye.

14 Hingê Saddam xwestbû ku Kerkûk, bi awayê rojhilat û rojava bê dabeşkirin; rojavayê Kerkûkê girêdayî Bexdayê be, rojhilat jî girêdayî Erbilê be. Sedemê ku Saddam rojavayê Kerkûkê dixwest petrol bû, çimkî bîrên petrole li rojavayê bajêr diman. Ji vê pêşniyaza Saddam jî kifş dibû ku desthilatiya Bexdayê xema nifûsa Kerkûkê nedixwar, çavê wan li petrola Kerkûkê bû.

ment) ve bihatina rêvebirin. Di xala 113an ya Rêbazavahiye de dihat diyarkirin ku ewê Hikûmeta Kurdistanê ya Herêmî (HKH) ji ewlekariya xwe ya navxweyî berpirsiyar be û pêşmerge bi awayekî fermî hêza parastinî ya herêmê be. (Katzman&, 2016). Dîsa li gor xala 140an a Rêbazavahiya Iraqê, ewê di dawîya sala 2007an de ji bo Kerkûkê referandum bihata çêkirin û di encama vê referandûmê de biryar bihata dayin, bê gelo ewê Kerkûk bi hukûmeta navendî ya Iraqê ve bimîne an ku bi ser Kurdistanê ve bê girêdan.

Iraq li ser sozê xwe nesekinî û tu carekê nexwest ku li Kerkûkê referandûmek pêk were, ji ber ku baş dizanibû, bi pêkanîna referandûmê re ewê gelê Kerkûkê biryara xwe li ser vegeirîna nav axa Kurdistanê bide. Di Hezîrana 2014an de, gava ku hêzên DAÎŞê Mûsil dagir kirin, heta nêzikî Bexdayê çûn û hêzên artêşa Iraqê ji herêma Kerkûkê vekişyan, hingê Kerkûk ket destê Kurdan. Bi fedekarî û cangorîtiya Pêşmerge, di encama şer û berxwedaneke dirêj de, hêzên DAÎŞê pêşî ji Kurdistanê û dû re jî ji tevahiya Iraqê hatin avêtin.

Di Hezîrana 2014an de Hikûmeta Kurdistanê biryar da ku referanduma serxwebûnê çêke û gelê Kerkûkê jî beşdarî referandûmê bibe. Bi ser ku dewletên cîran, Amerîka û hema bêje pîrraniya dewletên dinyayê li hember derketin jî, referandûm bi awayê ku hatibû plankirin, di roja 25ê Îlona 2017an de pêk hat. 20 roj piştî referandûmê, di 16ê Razbera 2017an de, artêşa Iraqê û hin hêzên paramîlîter yên Îranê, bi hevkarîya hin hêzên Kurd, Kerkûkê dagir kirin û Kerkûk cardin ji destê Kurdan derket. Du şaşîtiyên sereke di ketina Kerkûkê de rolekî girîng leystin: 1) Bi ser ku 26 sal bû herêma Kurdistanê di bin desthilatiya hêzên Kurd de bû, Kurdan hê jî hêzeke pêşmerge ya ku hevpar ava nekiribû. 2) Roja ku Mûsil ketibû destê DAÎŞê, Kerkûk li Kurdistanê zivirîbû û Iraq hilweşîbû, hingê Kurdan, bêyî ku biçin referandûmekê dikaribûn serxwebûna xwe îlan bikirana, belê di vê yeke de jî dereng mabûn. Gava ku Kurdan biryara referandûmê girtin, êdî DAÎŞê bi tevahî têk çêbû û herkesî dizanibû ku ewê Iraq êrîş bibe ser Kerkûkê, nav bajêr nestîne jî, bixwaze ku bîrên petrolê ji destê Kurdan derxîne. Belê gava ku hin hêzên Kurd bi Iraqê re hevkarî kirin, hingê Iraqê tevahiya bajarê Kerkûkê jî stend. Eger parastina Kerkûkê, ne li ser milê pêşmergeyên partiyên, belê li ser milê hêzeke pêşmerge ya netewî bûya, dîsa jî Iraqê newêribû êrîş bibira ser Kerkûkê û Kurd bi vî awayî nedîşikestin.

Bi ser ku gelê Kerkûkê, di referanduma 25ê Îlonê de, bi dengê %80yî “erê” got jî, pişt re Kerkûk bi darê zorê ji Kurdan hat standin. Gava ku Amerîka û hêzên cîran bixwazin û Rêbazavahiya (Destûr) Iraqê bi cih were, Kerkûk cardin bi awayekî hiquqî dikare vegere ser axa Kurdistanê. Îcar çaxê ku ew nexwazin, hingê kar bi tevahî li ser yekîtiya Kurdan ya navxweyî dimîne. Çimkî roja ku Kurd bi hev re rast bin û bi dilsozî yekîtiya xwe pêk bînin, wê rojê ewê Kerkûk bizivire ser axa Kurdistanê.

VI. ENCAM

Hemû agahiyên dîrokî rastiyeke destnîşan dikin: Kerkûk bajarek Kurdan e û di nav sînorên Kurdistanê de cih distîne. Di demên dîrokê yê cihê de, bi taybetî di serdema navîn de car bi car, heta pirê caran desthilatiya Kerkûkê ketibe deste hin kesên Tirkmen û Tirknîjad jî, nifûsa Kerkûkê her gav bi pirranî Kurd bûne. Sedemê ku di serdama navîn de Tirkmen û pişt re jî Osmanî li Kerkûkê desthilatdariya xwe ava dikin û Kurd ji karê rêvebirî li paş dimîmin ew e ku di van deman de nasnameya Misilmantî di ser nasnameya etnîkî de tê. Hingê Tirk ne tenê li ser axa Kurdan, bi taybetî di dema Osmaniyan de li ser axa Erebaştanê jî serweriyê dikin û di dema Selçûkiyan de carna piraniya axa Îranê jî dikeve destê Tirkan. Çawa ku serweriya Tirkan ya li ser axa Erebaştan û Îranê nasnameya erdnîgariya Erebaştan û Îranê naguhêre, wusa jî serweriya Tirkan ya li ser axa Kurdistanê nasnameya wê naguhêre. Çawa ku desthilatdariya Osmaniyan ya li ser axa Erebaştanê, Erebaştanê nake Turkîstan, wusa jî desthilatiya Osmaniyan ya li ser axa Kurdan, nasnameya Kurdan ya etnîkî naguhêre. Eger di serdema navîn de Tirkmenên Selçûk û pişt re jî Osmaniyan serweriya xwe li ser Îran, Kurdistan û Erebaştanê ajotibin, hingê ev tê vê wateyê: Di van demên han de Tirkan li ser navê Îslamê û bi armanca jî Îslamê re xizmetkirinê, ev welatên han bi rê ve birine. Çimkî di van deman de, nasnameya Îslamî bi her awayî di ser nasnameya etnîkî de bû. Tirkbûn, Kurdbûn, Faris û Erebbûn li pişt nasnameya Îslamî dihat. Îslam û jî Îslamê re xizmet di ser her tiştî de bû. Eger wusa nebûya, Selaheddîn Eyyûbî, gava ku di sala 1183an de Amîd (Diyarbakir) stend, radîbû vî bajêrî wek mîrekî (begîfî) dida Nûredînê kurê Kara Aslan? Selaheddîn Kurd bû, Diyarbakir bajarekî Kurdan bû, belê Selaheddîn rabû Diyarbakir spart mîrekî Tirkmen.

Eger nasnameya etnîkî ya serok, rêber an desthilatdarekî nasnameya bajêr an welatên ku îdare dike biguherta, hingê di dema Eyyûbiyan de Misir, Yemen, Lîbya, Sûdan, Erebaştana Siûdî, Sûriye, Iraq û gelek der dibûn welatê Kurdan. Lê em dizanin, bi ser ku Eyyûbî demek li ser van welatan serwer bûbin jî, nasnameya etnîkî ya van deran neguherî. Çawa ku îro tu Kurdek nikare doz bike û bêje ev hemû welatên han axa Kurdan e, ne Tirkmen û ne jî Erebaştan ku pişt re hatine Kerkûkê an jî bi darê zorê li Kerkûkê hatine bicihkirin, nikarin bêjin ev der ne Kurdistan e. Kurdek Bexdayî an jî Kurdek Enqereyî, çiqas xwediyê Bexda û Enqerebin, Tirkmenek Kerkûkî an jî Erebaştanek Kerkûkî ewqas xwediyê Kerkûkê ne.

Dîsa em dizanin, ger îro Kerkûk li ser golege petrolê rûnenîştibûya, ne Tirkan û ne jî Erebaştan doza Kerkûkê dikirin. Belê ji ber ku Kerkûk li ser golege petrole rûniştîye û jî %6ê petrole cîhanê li Kerkûkê ye, îro herkes Kerkûkê dixwaze û lê xwedî derdikeve. Çimkî gava ku Kerkûk di bin desthilatiya Kurdan de be, hingê ew ê Kurd serxwebûna xwe ya aborî bi dest bixin û em dizanin, heta ku serxwebûna aborî neyê bidestxistin, serxwebûna siyasî jî pêk nayê. Sîrf ji ber vê

yekê, rejîma Seddam û hemû rejîmên zordar ên Iraqê hergav xwestin pêkhatina demografikî ya Kerkûkê biguherin.

VII. ÇAVKANÎ

- Anthropological Institute of Great Britain and Ireland*, Vol. 38: 1908-1909: 451-486.
- Çandar, Çengiz. (2017). "Kurds in Iraq: Back to Square one?" *Al-Monitor*, October 20
- Çetin, Seyfettin. (2014). *Yakût el Hamevî'nin Mû'cemu'l Buldan'ında Kürtler*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Darkot, Besim. (1971). "Musul." *MEB İslam Ansiklopedisi*. Cilt, 8: 741-744
- Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî Varlî. (1997). *Dîroka Dugelên Kurdan*. (Derpêç I. 600-1500). Stenbol: Weşanên Sîpan.
- Ephrem –İsa Yousif. (2009). *Sûryani Vakanüvisler*. (Çev. Mustafa Arslan). İstanbul: Doz Yayınları.
- Evliya Çelebî (2013). *Günümüz Tükçesi ile Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. (Yay. Haz: A. Kahraman; Y. Dağlı). 4. Kitap, 2. Cilt.
- Gregory Abû'l Farac. (1999). *Abû'l Farac Tarihi*. (Cilt. I-II). Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Gündüz, Ahmet. (2002). "Kerkük." *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, C. XXV, Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara. s. 290-292.
- Gündüz, Ahmet. (2010). "Şehrîzor." *Diyanet İslam Ansiklopedisi*. Cild. 38: 473:475
- İbrahim Hilmi. (1323/1907) *Memâlik-i Osmaniye Cep Atlası*. İstanbul, Kitabhane-i İslam ve Askeri
- J. H. Krames, *The Encyclopaedia of Islam* (1986), E. J. Brill, Leiden, V. 5
- Karademir, Nihat. (2016). *Sultan Abdülhamit ve Kürtler*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Kıran, Abdullah. (2001). "Türkiye'nin Kuzey Irak Politikası." *Birikim*. Sayı: 148
- Kıran, Abdullah. (2016). *Yeni Bir Ortadoğu ve Kürtler*. İstanbul: Nas Yayınları
- Mark Sykes. (1908). "The Kurdish Tribe of the Ottoman Empire." *The Journal of the Royal*. Vol.38 (Jul.-Dec 1908:451-486)
- Marufoğlu, Sinan. (1996). "Osmanlı Döneminde Kuzey Irak Kürtlerinin Sosyal ve Siyasi Konumları." *Türkiye Günlüğü*. Sayı: 42:
- Marufoğlu, Sinan. (1988). *Osmanlı Döneminde Kuzey Irak*. İstanbul: Eren Yayınları.
- Mcdowall, David. (2004). *Modern Kürt Tarihi*. (Çev: Neşenur Domaniç). İstanbul, Doruk Yayınları.
- Mevlânâ Mehmet Neşrî. (2008). *Cihannümâ*. (Haz: Necdet Öztürk). İstanbul: Çamlıca Basımevi
- Minorsky, *The Encyclopedia of Islam* (1997), Vol. IX, Leiden, Brill

- Muhamed Emin Zeki Beg. (2014). *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*. (Çev: Vahdettin İnce; Mehmet Dağ; Reşat Adak; Şükrü Aslan). İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- N. Şamî. (1949). *Zafername*. (Çev: Necati Lugal). Ankara: Türk Tarih Kurumu Basımevi.
- Nakip, M. (2007). *Kerkük'ün Kimliği*. Ankara: Bilgi Yayınevi.
- P. Sluglett, "Mustafa Barzani," *The Encyclopedia of Islam* (1993), Vol. VII, Leiden-New York, E. J. Brill.
- Reşîduddîn Fazlullah. (2013). *Camîu't-Tevarîh*. (Ilhanlılar Kısım). (Çev: İsmail Aka; Mehmet Ersan; Ahmad Hesamipour Khelejanî). Ankara: Türk Tarih Kurumu Basımevi.
- Şemseddin Sami. (2001). *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler*. (Çev: M. E. Bozarıslan). İstanbul: Deng Yayınları.
- Şeraffedin Han, Şerefname I. (2015). *Kürt Ulusunun Tarihi*. (Çev: Celal Kabadayı). İstanbul: Yaba Yayınları.
- Şerefuddîn Yezdî. (2013). *Emîr Tîmur (Zafername)*. (Çev: Ahsen Batur). İstanbul: Selenge Yayınları.
- Şihabbeddin b. Fazullah El-Ömeri. (2014). *Mesâlikü'l Ebsar, Türkler Hakkında Gördüklerim ve Duyduklarım*. (Çev: Ahsen Batur). İstanbul: Selenge Yayınları.
- Şoriş Hacî. (2006). *Kerkük'ün Araplaştırılması*. İstanbul: Doz Yayınları.
- Talabany, Nouri. (2007) "Who Own Kirkuk? The Kurdish Case." *Middle East Quarterly*, Winter 2007:75-78
- TBMM Gizli Celse Zabıtları. (1985). (Cilt: 4). Ankara: Türkiye İş Bankası Yayınları.
- V. Minorsky, TH. Bois, D.N.Mac Kenize (2004). *Kürtler ve Kürdistan*. İstanbul: Doz Yayınları.

Çavkaniyên Dîjital:

- Ali Rıza. (1318/1902). "Atlaslı Memâlik-i Osmaniye Coğrafyası." (Ragihêr: M. Bayrak, <https://www.pirha.net/musul-kerkuk-kimin-yurdu-mehmet-bayrak-4906.html> (gihîşin: 28.11.2017).
- Bayrak, Mehmet. "Musul Kerkük Kimin Yurdu." 13 Aralık 2016 <https://www.pirha.net/musul-kerkuk-kimin-yurdu-mehmet-bayrak-4906.html> (gihîşin: 28.11.2017)
- Iraq: Forcible Expulsion of Ethnic Minorities. (2003). vol. 15: 3. (E). (New York: Human Rights Watch, March, <https://www.hrw.org/reports/2003/iraq0303/>
- Katzman, Kenneth. (2016). Carla E. Humud, "Iraq: Politics and Governance," Congressional Research Service. March 9, <https://www.fas.org/sgp/crs/mideast/RS21968.pdf>

Extended Abstract:

After emergence of Islam, during the reign of Khalifa Omer, in 642 AD the Muslims took the administration of the city from Sassanid's. Then respectively, the Seljuk, the Ayyubids, Kwarazmshah, Mongols and Ottoman ruled over the Kirkuk and it's vicinities.

Yakût el Hamevî (1179-1229), in his well know book which entitled as *Mû'cemû'l Buldan* gave some intersting informations regarding the Kirkuk and its inhabitants. As he tells "The city of Shehrezor has been located between the city of Hemedan and Irbil. All the settlers of this region are Kurds." Besides, Hamevi pointed out that the people of Shehrezor were cruel and violence motivated; in order to protect the things that belongs to them, they could easly risk their lives. Hamevi gives more information regarding the fortress of city and he mentions that they are as high as four meetre. Acording to Hamevî, the rulers of the Shehrezor are kins to each other.

For a long period of time the word of Shehrezor refered to the town of Kirkuk an its region. Nîzamuddîn Şamî is the first author that uses the name of Kirkuk in his book entitled *Zafername* (1404). After N. Şamî, in the 17th centruy, first geographer Katib Çelebî (1609-1657) and later traveller Evliya Çelebî (1611-1685) provides some important information about Kirkuk. Both of them decribed the Kurdistan's borders and regarded the Kirkuk as a Kurdish city such as Cezira Botan, Mosul (Ninova), Meleti, Maraş, Van, Erzerum, Hakkari and etc. In 19th century Şemseddîn Samî gives very detailed information on Kirkuk location, the structure of the city, its mosques, churchs, sinagoges and its inhabitants. Sami puts forth that "Three out of four people in Kirkuk are Kurds, while one in four of them Turkoman, Arabs and the others. In the city there are 760 Jews family and 460 Kildans."

After the First World War and dismemberment of Ottoman Empire, Mosul and Kirkuk region became a serious problem between the newly established Turkish Republic and Great Britian. When Turkey wanted to annex this region and include it to its soils, Great Britain struggled to keep the region in Iraqi state, which was under its mandate. The Leaguge of Nation negotiated between Turkey and Great Britain and later on, the region was given to the Iraq.

Between 1930 and 1980, Turked didn't claim its rights over Musul and Kirkuk, but in 1986, when Iraq became too weak during the war against Iran and was about to dissolve, Turkey claimed some historical rights over Mosul and Kirkuk regions. Turkey hesitated that the Kurds could establish an autonomous region and oil rich city Kirkuk became part of this autonomus state. In 1991, the first Gulf War created an opportunity for Kurds to esablish a self ruled government. The second Gulf War ended with demise of Saddam regime and the Kurds officaly

became the federate state in Iraq. According to the Iraqi Constitution (article 140), which was ratified in 2005, the Kirkuk issue should be solved by a referendum which would be held until the end of 2007, whether it will be part of Iraqi central government or became a part of Kurdistan Regional Government. But the referendum has never taken place.

In 2014, when ISIS occupaided the Iraq's second largest city Mosul, the Iraqi army escaped from Kirkuk and Kurdish Peshmerge took control over the city. Despite the Kurdsitan region independence referendum, which was held in 25 September 2017, the majority of Kirkuk inhabitants voted in favour of independence, in 16 October, the Iraqi forces; with the cooperation of some Kurish groups entered the city. Thus the Kirkuk question remained unsolved between the Kurds and Iraqi central government.

WERGEREK / A TRANSLATION

Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldanî yên Bakur – Pêşgotin*

Peter J. A. Lerch (1827-1884)

[Ev nivîsa han pêşgotina rojhilatnasê navdar Peter J. A. Lerch e ku di berhemaxwe ya bi navê *Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldanî yên Bakur* çap kirîye. Kunyeya kitêbê ev e: *Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldäer, Sankt Petersburg-1858*. Ji bo zêde agahî di heqê Lerch de binihêre Seyîdxan Kurij, Nûbihar Akademî, hijmar 1]

Bi vê xebata di destê we de ez verziyona Almanî ya lêkolînên xwe yê li ser ziman, dîrok û rewşa niha ya gelê Kurd ji raya giştî re eşkere dikim. Wiha xuya ye ku îfadekirina sebebên amadekirina vê berhemê ne tiştêkî fizûlî ye.

Hê di destpêka lêkolînên min yê li ser Şerqê de ez bi hezkirineke berbiçav li wê geriyabûbûm ku ziman û edebiyata Farisên îro, ku bi pirranî hîna jî jê nehatiye îstîfade kirin, nas bikim. Di vir de diviyabû min bala xwe bida ser çîroka egidîyê ya Farisî û têkiliya wê bi efsaneyên qewmên Sanskrît ve. Herçiqas bi vî awayî perspektîfa min firehtir biba jî, min ferq kir ku lêkolîneke kûr û dûr li ser kevnareyên Îranî ne di quweta min de ye û ji ber vê jî diviyabû ez xebata xwe ya ilmî li ser hêlekê sinor bikim. Piştî ku min di sala 1852yan de xebata birêz akamesiyen Kunik ya bi navê „Essai pour éclaircir, au moyen de l’histoire comparée, la question de l’influence des Iraniens sur les destiées de la race sémitiques“¹ xwend, kifşkirina vî tiştî êdî li min giran nebû. Digel ku xebata navê wê derbas bû, tenê bi pêşgotinekê li ser beşên etnografîk-dîrokî yê berhema Chwolsohn -ya li ser Sabîyan- disekinî û nivîskarê wê tenê bi gotinên manedar û îmayan qîma xwe dianî, dîsa jî min bi gelek awayan jê îstifade kir. Me’neya dîrokî ya Îranîzmê di cîhanê de êdî bi min zelaltir bû û bi vê rê jî ez pê hêsiyam, ku ev noqte bi lêkolînên

* Ji Almanî: Abdullah İncekan, Dr. lêkoler, Almanya. / Dr. reasercher, Germany.
e-mail: aincekan@gmail.com

1 Di *Bulletin historico-philologique Cild. IX. No 15 û Mélanges asiatiques tirés du Bulletin historico-philologique Cild I*, rûpel 502 û dewama wê da çap bû.

li ser ziman, dîrok û rewşa niha ya neteweyên Îranî yeko-yeko dikare bê eşkere kirin. Birêz Kunik di vê çarçevyê de bal kişandibû ser lêkolînên Kurdî jî: Ew di ceribandina hijmara 21an de dibêje „Eşîrên Kurdên îranê dikarin herwiha îmkaneke ji bo lêkolînên gelek balkêş bidin, ku meriv pê dîroka Asûrîyan, ya Babilê û Asyaya Piçûk piçekî ronî bike. Di edebîyata Ermenî, Ereb, Îranî de hin agahiyên li ser eşîrên cihê-cihê yên Kurdan cî digrin.“ Bi rastî jî lêkolînên li ser neteweyê Kurd ji bo lêkolînên asûrî û babilan, ku nû dest pê dikin, gelek muhîm in, gava ew îddîaya hin aliman, ku têkiliyeke di navbera qewmê şervan ê Keldanî û Kurdan de ji aliyê dîrokî ve rast be û gava –weku hin kes bawer dikin- hin xanedanên Asûrî û maiyetên wan Kurd bin.

Ji vê noqteyê şûnda min qerar da, ku ez li ser dîroka Kurdan bixebitim. Pêşîn ez li wê geriyam, ku bizanibim, ka hecma çavkaniyên ez dighêjimê çiqas e, lê zû hat fahm kirin, ku li Ewrûpayê ji bo bidestxistina armanca min kêma cî hene, ku bi qasî Koşka me îmkanan didin meriv. Li Kitûbxaneyaya Vekirî ya Qraliyetê nusxeyeke dîroka Kurdan ya Şerefyan² heye, ku ji aliyê nivîskar bi xwe ve hatiye serrast kirin. Ev berhem herweha li Muzeya Akademîya Zanistê ya Qraliyetê ya Asyayê heye, ku bi destxetan dewlemend e û serokê wê –Cenabê akademisyên, endamê Meclîsê *von Dorn*- ji demeke dirêj vir ve ji bo bikaranîna xezîneyên di bin mayeta wî de ne, musaade daye min. Xencî vê tevahîya kitêbên çapkirî yên dîrokî û coxrafî yên di heqê berhemên rojhilata navîn de ji bo min muhîm bûn di wan herdu enstitûyên min li jorê behsa wan kir da cî digirtin. Ji raporên gerê min tenê xwe negihand yên misyonerên Amerîkî yên li „*Missionary Herald* û li *Bibliotheca Sacrayê*.

Piştî ku min çavkaniyên bi mijara min re eleqeder nas kirin, min dest bi xebata li ser materyalên ku min kom kiribûn, kir. Li ser hîlbijartina tiştên ku diviyabû ez bi hûrgilî li ser bisekinim, dudilî nemam; ji xwe tevahiya xisletê dîroka Kurdan di hîlbijartinê de dibe xwediyê qerarê. Kurd, di kîjan qonaxa dîrokê de xwe nîşan didin, bira bidin, tu carî wek neteweyekî yekbûyî bi dezgehên dewletî dernakevin meydanê, di dêleva vê de em dibînin, ku ji nav wan hin eşîr xwe ji tariya dîrokê

2 Binihêre: *Catalogue des manuscrits orientaux de la Bibl. Impériale de St. Petersb. No CCVI. (rûpel 295)*; Fraehn *Die Bibliothek aus der Scheich-Sefy – Moschee zu Ardebil in d. St. Petersb. Zeit. 1829 No. 44-46, S. 296*; Wolkoff *Journ. asiat. (1-e Série), T. VIII, S. 291 u. fg.*; Dorn *Das asiatische Museum S. 283, 348 u. 661*; Morley *A descriptive catalogue of the historical manuscripts in the arabic and persian lang. preserved in the library of the Roy. As. Soc. of Great-Britain and Ireland. Lond. 1854. 8. No. 158 (cf. Journ. asiat. 1854. V^e Série, T.I.S. 869)*; Hadgi-Khalfa *Lexikon bibliogr. ed. G. Flügel No. 2135, 2144*; Herbelot *Biblioth. orient. s.v. Tarrikh – al – Akrad. Barb Über die Kurdenchronik von Scheref in d. Sitzungsberichten der philos.-hist. Classe der (Wiener) Akademie d. Wiss. Bd. X. S. 238 und Geschichtliche Skizze der in der Chronik von Scheref behandelten kurdischen Fürstengeschlechter; ibid. Bd. XXII, S. 3 u. fg.*

nîşan didin – carna ji bo ku qedera welatê xwe tayîn bikin; carna jî bi hinceta ku tevî qedera gel û welatên cînarên bibin, lê bi pirranî bêyî ku serketî bin. Ji ver vê jî avahiya dîroka Kurdan, yanê ya Şerefnameyê, yeke etnografîk-dîrokî ye; yan jî, ku meriv kurt bibêje, Şerefname di eslê xwe de dîroka hin eşîrên Kurda ye. Êdî e'yan e, ji bo fehmkirina eşîrên Kurdan, ku bi awayê ku di Şerefname û gelek çavkaniyên din de bi tafsîlat hatiye îzah kirin, diviyabû ez zêdetir bi avahiya eşîrên Kurdan re mijûl bibim û wan temsîlkarên eşîrên Kurdan yên îro, ku hejmara wan gelek e, nas bikim. Ya rast ev pêdiviyeye ilmî bû -heta ji dest tê- meriv çavkaniyeke berfireh ya eşîrên naskirî yên Kurdan û cîûwarê wan amade bike, ku xebatên Ewrûpî û Amerîkiyan yên li ser coğrafya û etnografiya Asyaya Pêşîn sal bi sal zêdetir dibin, ji bo vê armancê îmkanên baş didin me. Di ser de bi min zelal bû, ku çavkaniyeke bi vî awayî ji bo kesên di pêşerojê de diçin li cîûwarên Kurdan digerin û behsa wan deran dikin, û bi vî awayî kêrî zanistê tî, pirr bi fêyde ye. Bi saya wê meriv dikare edîsyon-kritîkekê ya Şerefnameyê tevî wergera wê ya baştir amade bike.

Mixabin demeke dirêj îmkanên min rê nedan min, ku ez bi rêk û pêk bi xebata xwe re mijûl bibim, loma jî min tenê karîbûye hinekî wexta xwe bidimê. Ji dêleva vê min dewam kir û materyalên din tovî serhev kirin, ku di dawîya sala 1885an de min îmkan bi dest xist, ku çavkaniya min li jor behs kiribû ya li ser eşîrên Kurdan û cîûwarê wan, bi dawî bînim û herweha jê re pêşgotinekê binivîsim, ku tê de rewşa niha ya hêlên lêkolînên Kurdolojiyê zelal bikim. Birêzê akademîsyen von Dorn, ku min ev xebat pêşîn gihandibû wî, ji ber qedirzaniyê ew pêşkeşî Koma dîrok-filolojiyê kiribû. Ji ber serîlêdana wî, vê komê qerar da ku xebata min di bin sîwana³ xwe de çap bikin. Di çîleya pêşîn ya 1855an de dest bi çapa deftera pêşîn ya *Lêkolînên li ser Kurdên Îranê û pêşîyên wan, Keldanîyên Bakur, St. Petersburg 1856 VI û 121 rûpel 8. kir.*

Sirf ji ber wê ku Akademîya Zanistê ya Qraliyetê mesrefên çapkirina xebata min da ser xwe, ez gelekî motîve bûm, ku mijara min hîlbijartîye –hetanî quweta min têr dike- bi her hêlî ve bikolînim. Gava ez bûm xwediyê wê rûmetê, ku ji aliyê vê Komê ve bi xebateke nû ji bo pêşdexistina lêkolînên Kurdolojiyê hatim wezîfedar kirin, min xwe êdî ji vî tiştî re zêdetir mes'ûl hûs kir.

Die Nordische Biene di 23yê Çilêya Pêşîn ya 1855an de di pêveka xwe de nivîsek („Die Kurden im Gouvernement Smolensk“ von K. Mikeschin – Kurdên li herêma Smolenskê) derket, ku jê Akademîya Zanistê xebera girtina girtîyên şer yên Kurd li navenda Împaratoriye stend. Di civîna pêşîn ya sala 1856an de Birêz von Dorn, bi alîkariya birêzên akademîsyen Böhlingk, Brosset, Köppen, Kunik û Schiefner

3 Binihêre: *Bulletin historico-philologique de l'Académie Impériale des sc. de St. Pétersb. T. XIII. S. 142, Séance du 16 (28) Nov. 1855; Compte rendu de l'Académie Impériale de. sc. 1855. Par M. A. de Middendorf, Secrétaire perpétuel. St. Pétersb. 1856. 8^o. S. 122.*

yên Koma dîrokî-filolojîk,, serî li Serokê Akademiyê da, ku ew destûrê bidin min, ez di bin sîwana wan de herim cem wan Kurdên, ku li Roslawlê êsîrên şer⁴ in. Cenabê Kont, D. N. Bludow, destûr da. Rapora, ku min di *Bulletin historico-philologique Cild XIV* rûpel 76-96 (*Mélanges asiatiques Cild II*, rûpel 621-649) de weşand, ku li gorî lizûmiyê ez hin tiştan jê di vê berhemê de jî tînim ziman, piştî vegera min ji Roslawlê, min pêşkêşî Komê kir û loma jî êdî ez gerek nabînim li vir behsa hevdiştina xwe bi Kurdan re bikim.

Ji ber gera min xebatên min yên li ser dîrok û etnografyaya Kurdan ji bo demeke dirêj li aliyekî man, lewra diviyabû êdî min tevahiya bala xwe bida ser zimanê Kurdan. Bi lêkolîna li ser ziman pê de-pê de ez gîhiştim wê qenaetê ku xebatên dîrokî ancak gava mil bidin yên zimên pêş de diçin.

Lê materyalên ziman yên min hetanî niha kom kirine ji bo têkiliya Kurdî bi devokên din yên Îranî re ji aliyê gramer û leksîkolojîk ve bi awayekî serketî zelal bikin, kêmin in. Ji bo ku ev mûmkîn be, divê ji aliyên cihê-cihê ve materyalên nû, û ya muhîm, yên saxlem bînin kom kirin. Gava destpêkê hatiye avêtin. Birêz v. Dorn, gava li ser biserketina gera min ya Roslawlê raporek nivîsî, ev kêmasî dît û bêyî ku bisekine gav avêt, da ku di peydakirina materyalan de alî min bike. (Binihêre: *Bulletin historico-philologique Cild XIV*. rûpel 75-76 û *Mélanges asiatiques* rûpel 619) Ji ber vê wî serî li du hev hevalên xwe yên akademîsyen da, ku herduyan jî şukir bersiveke erênî dan xwestinên birêz v. Dorn. Yê yek ji wan konsolosê bi Oriyentalîstan e'yan e, endamê Akademiyê, Cenabê Nicol. von Chanykow e. Di Çilêya Pêşîn yê 1856an de wî ji Akademiyê⁵ re destxetêke piçûk şand ku tê de xêncî şîrên bi Farişî û Tirkî, herwiha yên bi Kurdî jî cî digirtin. Xêncî vê bi saya Birêz von Chanykow li Sauçbulaqê [Mehabad], li navenda eşîra Kurdên Mukrî, wergereke Gulistanê hate çêkirin, ku beşên destpêkê di Tirmeha eynî salî de xwe gihandibû Akademiyê. Ji bo nasîna devokên Kurdî ezê gotina xwe ya bi saya van herdu çavkaniyan di ciyekî munasib de divê bê îfade kirin, teksîr nekim.

Di e'ynî demê de bi Birêz Chanykow nûnerekî din e berjewendiyên Rusyayê temsîl dike li Rojavayê ye; Konsolosê Erzurumê Birêz Jaba, endamê konseyê yê teqawûdbûyî, ji bo lêkolînên li ser zimanê Kurdî bi awayekî jêhatî materyalên bi qedr û qîmet derdixe meydanê. Min di pêşgotinê de behsa materyalên pêşîn yên wî sala par şandin, kir (mêze bike rûpel V, dîpnot û S. 28). Di heqê paketa dudiyar ya ku Akademiyê di Temmuza îsal de girt, raporeke min ya bi rêk û pêk de di *Bulletin historico-philologique* de derkeve. Ev materyal ne tenê ji aliyê ziman ve balkêş e, ji ber ku tê de tenê werger cî nagrin -weke materyalên pêşîn. Tê de metnên orîjînalên yên bi Kurmancî cî digrin, ku herwiha agahiyên biyografîkên yên gelek

4 Binihêre: Séance du 8 (20) Février 1856, im *Bullet. hist. phil.* T. XIII p. 207, 208

5 *Bulletin de la Cl. hist. philologique T. XIV* rûpel 219

şairên Kurd yê hetanî niha nenas mane, tên dayîn. Piştî wê detayên etnografîk-statîstîk di derbareyê eşîrên Kurd yê di nav sinorên Tirkan de cî digrin, tên. Konsolosê birûmet zehmeteke mezin kişandiyê, ku meriv çiqas pesnê wî bide jî têr nake. Wî hemû metnên, ku wî ji Akademiyê re şandine, bi alfabeya Latîni li gorî telafûza Frensî transkirîbe kiriye. Da ku rêya zimanê Kurdî ji lêkolînên ilmî re bê vekirin, ew di cehda xwe de îsbateke ji vê mezintir nîşan dide, gava Birêz Jaba bi şandina wan materyalan herwiha wergera wan ya bi zimanê Frensî jî dişîne, da ku ew bên fehm kirin.

Herkes dê bizanibe ka Birêz Chanykow û Jaba xwediyê kîjan rûmetî ne, gava ew ked û emega wan ji bo pêşdexistina lêkolînên Kurdî û bi vê re jî ji bo lêkolînên Îranîzmê dibîne.

Gava ez van rêzan dinivîsim, herdu hejmarên Nîsan û Gûlanê yê îsal yê *Journal asiatique* dikevin destên min, ku tê de materyalên nû yê bi qedr û qîmetê mezin ji bo lêkolînên Kurdî cî digrin. Qesta min „Études philologiques sur la langue Kurde (dialecte Soleimanie)“ ya birêz Alexander Chodzko ye, ku di vê berhema han de ezê serê carê behsa wê bikim.

Ev metnên Kurdî yê ku ji aliyê min ve di beşa pêşîn de tên weşandin, tev li Roslawlê hatine kom kirin – xêncî pêvekê. Stranên gelêrî yê min li wir tov kirine, ez hê parve nakim; weşana wan li hêviya xebateke bi taybet ya li ser strana gelêrî ya Kurdî ye.

Min cehd da ku metnên ji êsîrên şer peyda bûne, hetanî ji destê min hat, yekoyeko wergerînim⁶, da ku hînbûna ziman hêsantir bikim. Kevan ji aliyê min ve di du maneyan de hatine bikar anîn. Yek (û bi pirranî) ew nîşan dide, ku tiştê di nav de ye, di metnê de tune ye.

Dudi: Di nivîsîna metnê de ez li wê geriyam, ku herikîna axaftinê ya Kurdan bi dest bixim. Ji ber vê jî carna li hin ciyên ku mantiqa cumleyê wê bixwaze jî, hin virgul dê tunebin. Di nivîsîna îşareta pirsê (?) û ya balkişandinê (!) de ez pêşîn pîrr bi dîqet nebûm û ji ber vê jî ji xwendevanan daxwaza qebûlê dikim.

Di pêvekê de min 1) hin rêzik ji perçeyê wergera Îskendernameya Nîzamî ya ku Jaba ji me re şandibû, 2) wergera 25 gotinên pêşyan yê ji Tirkî (ji gramera Tirkî ya Jaubert), ku birêz Jaba ji 200 hevî zêdetir dabû wergerandin⁷, û 3) wergera Gulistanê, bi qasî ku Birêz Chanykow ji me re şandiyê.

6 Di eynî wextî de cildê dudiyar yê derdikeve, ku eynî metn in lê bi wergera Rûsî û raporek li ser gerê çap dibin.

7 Min li van wergeran transkripsiyonek li gorî alfabeya Lepsius, wergereke motamot ya almanî û orjînalên Farisî û Tirkî lê zêde kir. Li transkripsiyonê min dupatkirin zêde nekir, ji ber ku di metna Jaba de ew tunebûn. Herwiha dengên dirêj jî min lê zêde nekirin. Zimanên Slavî dengên dirêj nas nakin, loma jî di metnên ku Jaba berhev kirine de transkripsiyona wan cî nagre. Ji metnên birêz Chodzko de jî dirêjîya dengên hertim nehatiye nîşan kirin.

Çapkirina ferhengokê û ya gramer û hwd. di dema pêşiya me de ewqas wextê min bistîne, ku ez fikra weşandina kronojoliya Kurdan ji bo niha û belkî jî tim û tim ji plana xwe derxim. – Xwezila meriv bikarîbaya di heqê vê berhema han, ku di xebata Dittel de di du jêrenotan de navê wê derbas dibe, agahî bi dest xistiba. Ew li Konstantinopolê bi navê *Storia della Regione des Kurdistan; Constantinopoli; Giuseppe Campanelli. 1818* derketiye. Herwiha di heqê kitêbeke li ser dîroka Kurdistanê çap bûye jî, ez xwediyê zêde malûmatan ninim. Di *Nameyên wî yên ji gerên wî yên li biyaniyê yên Jacob Jonas Björnstahl* di heqê sekna wî ya li Constantinopolê em rastî van rêzan ten:

„Di 8 Çileyê Paşîn ya 1778an de ez çûm dêra Dominikan ya li Galatayê, ku min li wir rahîb Raphael Zerowinsky zîyaret kir. Ev zilam li Pragê hatiye dinê û eslê wî Polonî ye. Ew li Ninovayê gelek maye û ew wî welatî gelek baş nas dika. ... Lê her çî Kurdên li Kurdistanê ne yan jî li Medyaya kevn in, ku bi zimanê Kurdî qise dikin, ew musulman in. Sê kesên ji dêra Dominikan gava wê demê li Musilê dimînin bi zimanê Îtalî bi xarîteyên coxrafîk dîroka Kurdistanê dinivîsin û berî çend mehan ji bo çapkirinê şandine Romayê. Wan agahiyên xwe bi pirranî ji Paşayê Amediyê stendine, ku navê wî Baram e û li bajarê Zaxoyê li ber çemê Zapê bi rêwîtiya çar rojan ji Ninovayê ber bi Rojavayê tê. Ew ji xelîfeyê Bexdayê ye û di destên wî de gelek nûsxyên li ser parşomenan, ku heft hetanî heşt sedsal kevn in, û tomarên bi zimanê Farisî hene. Wan misyoneran herwiha ji bo berjewendiyên xwe ferhengeke bi kurdî-îtalî amade kirine, ku hê bi dest hatiye nivîsîn. Ji bo ku ew bi Kurdî binivîsin, wan alfabeya Erebi girtine –weke Tirkan.“

Sankt Petersburg, 16. Tebaxa 1857

Peter Lerch

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

Sefheî Sibyan a Mela Mehmûdê Bazidî

Tahirhan Aydin*

KURTE

Ev berhema ku di vê xebatê de hatiye pêşkêşkirin, xuya ye ku ya Mele Mehmûdê Bazidî ye, bi navê “Sefheî Sibyan” di nav koleksiyona Auguste Aleksandre Jaba de bi numareya Kurd06ê cih digire. Berhem, di teşeya elifba/alfabeyê de ye û ji bo hînkirina alfabeya Kurdî-Erebî hatiye amadekirin. Ji ber vê yekê, berhem bi wateya “rûpela/pirtûkçeya zarokan” wek “Sefheî Sibyan” hatiye binavkirin. Zimanê destxetê yek ji zaravayên Kurdî, Kurmancî ye. Ev lêkolîn digel rewşa fizikî ya destxetê li ser nasname û naveroka wê rawestîyaye. Herweha, deqa destxetê digel tehqîqa wê hatiye pêşkêşkirin. Ev destxeta serbixwe ku ji aliyê Bazidî ve hatiye nivîsîn, di Akademiya Zanistan a Petersbûrgê ya Rusyayê de ye. Destxet 39 rûpel e û ji aliyê fizikî ve baş xuya dike. Herweha berhem ji bo hînkirina alfabeya Kurdî-Erebî, herekeyan/dengdêran, xwendina peyv û hevokan hatiye amadekirin.

Peyvên sereke: Mela Mehmûdî Bazidî, Aleksandre Jaba, Koleksiyona Jaba, Alfabeya Kurdî-Erebî, hareke/dengdêr, xwendin, destxet, Sefheî Sibyan, Abécédaire Kurde

ABSTRACT

“*Mela Mehmudi Bazidi's Sefhei Sibyan*” The introduced manuscript -wich apparently is belonged to Mela Mahmoudi Bazidi- “Sefhei Sibyan” is located in Auguste Alexandre Jaba collection with number of Kurd06. The work is in the form of an elifba/alphabet and has been prepared to teach children the Alphabet of Kurdish. Hereby, the name of the work had been put as “Sefhei Sibyan” meaning “pages of

* **Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluçyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.** / Assoc. Prof., Visiting scholar at Department of Near Eastern Languages and Cultures (NELC), Indiana University, Bloomington/IN/USA.
tahirhan@hotmail.com / taydin@iu.edu

the children”. The language of the manuscript is one of the Kurdish dialect, namely Kurmanji. This work focused on the identity of the work beside its physical structure and contents. In addition, the text of the manuscript has been offered with its verification. This independent manuscript which copied by Bazidi, takes place in The Academy of Sciences in St Petersburg in Russia. The unharmed manuscript consists of 39 pages. The work aims to teach the Kurdo-Arabic alphabet, vowels and to teach reading the words and sentences.

Key words: Mela Mahmudi Bazidi, Auguste Alexandre Jaba, Jaba’s collection, Kurdish alphabets, vowels, reading, manuscript, Sefhei Sibyan, Abécédaire Kurde.

I. DESTPÊK

Piştî ku kurd bûne Musluman alfabeya Erebi adapteyê Kurdî kirine û serdemeke dirêj vê alfabejê bi kar anîne ku îro jî li gelek deverên kurdan ev tê bikaranîn. Ev destxeta bi navê “Sefhei Sibyan”¹ (rûpela zarokan, pirtûkçeya zarokan, elifbaya zarokan) ku mijara vê lêkolînê ye, derheqê hindekariya alfabeya Kurdî-Erebî de ye² û di nav koleksiyona A. Jaba³ da, bi numareya Kurd06ê⁴ hatiye tomarkirin. Wekî ku tê zanîn, heta sedsala dawî kurdan bi gelemperî alfabeya Kurdî-Erebî bi kar anîne. Ji ber vê yekê piraniya çavkanîyên Kurdî yên sereke bi vê alfabejê ne. Îro jî bi taybetî jî li Başûr, Rojhilat û Rojava girseyeke mezin vê alfabejê bi kar tînin.

Xebata me, derheqê danasîn, şirove û tehqîqa vê berhemê de ye. Em li vir ji aliyên curbicur ve vê destxetê didin nasîn (ji bo rêbaza danasîn û nirxandina destxetan bnr. el-Munecim, 1966: 245-262; Omerî, 1995; ISAM, 2010). Em pêşî nasnameya destxetê diyar dikin: navê berhemê, nivîskar, mutercim, şarîh; cureya berhemê (te’lif, tercume, şerh),

- 1 Sebî (صبي) peyveke Erebi ye û pirjimara wê di Erebi de “Sibyan/صبيان” e ku wateya wê di Kurmancî de “zarok” e. Di Kurdî de bikaranîna peyvên “sebi” û “sibyan”ê heye. Jaba jî di kataloga xwe ya bi numara Kurd53ê de navê berhemê wek “*Sefhei Sebian*” nivîsiye. (Jaba, *Catalogue De Manuscripts Kurdes*, r. 2); “Sefhei Sibyan” ravek e. Peyva “sibyan” ravekera peyva “sefhei” ye. Yekjimara wê “sebi” ye ku di ravekê de wek pirjimar bûye “Sibyan” ango “zarokan”.
- 2 Rudenko jî dibêje kur ev berhem derheqê alfabeja Kurdî de ye (Список представляет собой курдский букварь) û kurteyêke alfabeja Kurdî dihewîne (содержат изложение абджд’а), (Rudenko, 1961, 110).
- 3 Bi eslê xwe Polonî ye. Serdemekê li Erzurûmê konsolostîya Rûsyayê kiriye. Di vê serdemê de bi alîkariya hindek zanyarên Kurd (di serî de Mela Mehmûdê Bazidî) derheqê dîrok, çand, ziman û edebiyata Kurdî de gelek berhemên hêja berhev kirine û şandine Rûsyayê. Ev koleksiyon hê jî li Akademîya Zanistan a Petersburgê ya Rûsyayê disekine û gelek xebatên akademîk li ser hatine kirin. (Derheqê A. Jaba û koleksiyona wî de bnr: Alakom, 1991; De Testa & Gautier, 2003; Leezenberg, 2011, 86-102; Adak, 2015; Celalî, 2016, 18-25).
- 4 Rudenko ji bo cihê destxetê weha nivîsiye: “Уп. рук. : Восточный сборник, стр. 174.” (Rudenko, 1961, 110). Rudenko, vê berhema xwe ya giranbuha li ser danasîna berhemên Kurdî yên di koleksiyona A. Jaba de hazir kiriye.

dîroka nivîsandinê (îstînsaxê), xwedîyê destxetê û hwd. Herweha cihê ku berhem lê tê parastin didin û eger hebe behsa qeyda feraxê, ketebeyê û istînsaxê dikin. Dîsa di bin vê sernavê de em behsa hebûn yan nebûna teshîh, muqabele, sema', îcazet, qiraet, temelluk, mutale'e, teshîh û weqfê jî dikin.

Piştê danasîna nasnameya destxetê em ji aliyê fizîkî ve berhemê didin nasandin. Li gorî rêbaza danasîna destxetan, ji aliyê fizîkî ve agahiyên derheqê berg, miqleb, şîraze û xemlên wek şemse û zencîrekê tên dayîn. Serxwebûna berhemê, jimara bergan, ji aliyê nezm û pexşanê ve taybetîya berhemê tên gotin. Zimanê destnivîsê tê îfadekirin. Zehriye, taybetmendiyên kaxezê û jimareyên wereqan jî di vê beşê de cih digirin. Derheqê qewareyên kaxezê, cureya xetê, îmlaya berhemê, mirekeb, cedwel, sitûn, peyvên te'qîbê, tezhîb, wêne, minyatur û nexşe, hamîş/derkenar, îfadeyên pêşî/dawî û rêzan de jî agahî tên dayîn.

Hedefeke vê xebatê jî pêşkêşkirina naveroka berhemê ye. Wekî ku tê zanîn her berhem ji bo armançek tê nivîsîn. Di vê berhemê de em gav bi gav hînkirina alfabeya Kurdî-Erebî dibînin. Ji ber ku di koleksiyona Jaba de ji bilî vê nusxeyê ti nusxe tune pêdivî û îmkan muqayese û berawirdkirinê tune.

Di dawiya vê xebatê de me metna Sefheî Sibyan û tehqîqa wê digel serrastkirin û jêrenotan pêşkêş kiriye.

II. SEFHEÎ SIBYAN JI ALÎYÊ NASNAMEYÊ VE

Di destpêka destxetê de wek sernav bi tîpên Erebî *صفحة صبيان/هذا/Haza Sefhei Sibyan*⁵ (*Ev Rûpela/pirtûkçeya Zarokan e*) (*Sefheî Sibyan*, r.2) hatiye nivîsîn. Herweha, di heman koleksiyonê de di kataloga bi numareya Kurd53ê de (r. 2)⁶ bi tîpên Erebî *صفحة صبيان* û bi yêna Latîni jî “Sefheî Sebian” hatiye nivîsîn.⁷ A. Jaba jî li ser berga ewil a hundir bi Frensî “*Abécédaire Kurde*” (Wer: *Alfabeya Kurdî*; Sefheî Sibyan, 1; Rudenko, 1961, 110) nivîsîye. Herçiqas navê berhemê di destpêkê de wek hevokeke Erebî hetibe nivîsîn jî (*هذا صفحة صبيان/Haza Sefhei Sibyan*, bnr. Sefheî Sibyan, 2) zimanê ku destxet pê hatiye nivîsîn Kurdîya Kurmancî ye. Ji ber ku berhem derheqê hînkirina alfabeya Kurdî-Erebî de ye, danasîn, şîrove û îzah hemû bi kurmancî ne.

-
- 5 Rudenko navê pirtûkê bi Erebî *صفحة صبيان* û bi Rûsî jî “*страница для мальчиков*” (*Rûpela zarokan*) nivîsîye (Rudenko, 1961, 110).
- 6 Ev dosya bi Frensî hatiya amadekirin, di rûpela 2yan de wek sernav “*Catalogue De Manuscrits Kurdes, Appartenant à A. Jaba*” (*Kataloga destxetên Kurdî yêna A. Jaba*, niv.) hatiye nivîsîn. Dema em vê berhemê û xebatên Jaba yêna din ên di koleksiyonê de didin berhev em dibînin ku ev berhem destnivîsa Jaba ye. Ev katalog, 56 dosyayên koleksiyonê yek û yek bi kurtahî dide nasîn û 12 rûpel e (Jaba, *Catalogue*, 2).
- 7 Jaba, di rûpela 2yan a *Catalogue De Manuscrits Kurdes* de bi Frensî jî bo danasîna berhemê “*Sefhei Sebian, pages des enfants. C'est un abécédaire Kurde.*” (Wate: Sefheî Sebian: Rûpela zarokan. Ev alfabeya Kurdî ye. niv.) dibêje (r.2).

Li gorî agahîyên li ser berhemê ne diyar e ku ev berhem telîf e yan îstînsax e. Dîrok û cihê telîf/îstînsaxê nehatiye dîyarkirin lê mirov dikare bibêje di nav pêvajoya berhevkirina koleksiyona A. Jaba de hatiye amadekirin. Rudenko jî di xebata xwe de hem dibêje ku di sedsala 19em de hatiye nivîsîn (время переписчик - XIX в.) û hem jî dibêje ku sala 1868an di koleksiyona A. Jaba de cih girîtiye (Rudenko, 1961, 110). Her çiqas navê nivîskar/mustensixê berhemê li ser berhemê tunebe⁸ jî ji şêweya nivîs û hin şeklên di hûndirê berhemê da⁹ tê famkirin ku berhem bi destê Mela Mehmûdê Bazidî ve hatiye nivîsîn/îstînsaxkirin. Berhem di nav koleksiyona Jaba de hatiye parastin. Koleksiyona Jaba îro li Akademîya Zanistan a Petersbûrgê ya Rusyayê (The Library of the Russian Academy of Sciences/Библиотека Российской академии наук) ye.

Derheqê qeyda ferexe, ketebe û îstînsaxê de tu agahî tune. Di berhemê de derheqê teshîh, berawirdkirin, sema', îcazet, qiraet, mutale'e, teshîh, temelluk û weqfê de agahî tune. Li tu derê rûpelan şerh, rave yan têbînî tune. Herweha, li pêşî û paşîya berhemê tu agahî û îfade tune.

III. SEFHEÎ SIBYAN JI ALÎYÊ FÎZÎKÎ VE

Berhem ji alîyê fîzîkî ve paqij e û herwekî nehatiye emilandin. Nîşaneyên kevinbûn, qirêjbûn û xerabûnê xuya neke. Berhemeke serbixwe ye, ango di nav berhem yan mecmueyeke din de cih negirtiye. Ev berhema yek cild bi qasî rîsaleyek e û mensûr/pexşan hatiye nivîsîn.

Kaxeza destxetê nû dixuye¹⁰ û diyar e ku di rewşeke baş de hatiye parastin. Hetta, mirov dikare bibêje ku herwekî piştî nivîsandinê hîç nehatiye bikaranîn. Lewra qet tehrîf nebûye. Tenê li çend cihan (belkî ji ber şilbûnê) hibra/mirekeba nivîsê belav bûye. Weke kaxezên îro yên ku di çapxaneyan de tê bikaranîn xuya dike û tenik e. Li ser kaxezê xêz hene. Rengê kaxezê sorahîyeke ronahî ye. Berhem li ser defter/lênûsekê hatiye nivîsîn û bi tayê hatiye dirûn. Rengê rûpelên berhemê ji rengê bergê cuda ye. Rengê berga hundir şîn e.

Piştî rûpela nivîsandî vala ye. Muhtemelen ji bo ku nivîs ji ber mirekebê xerab nebe pelên destxetê yek alî hatine nivîsîn. Hejmarên rûpelan li jêra van rûpelên vala bi jimareyên Latînî hatine nivîsîn. Rûpel bi jimareya 1(yek)ê dest pê dike bi 39an diqede. Digel rûpela ku bi Frensî "Abécédaire Kurde" hatiye nivîsîn ji 39 rûpelan pêk tê. Rûpel li ser yek sitûnê ava bûye û di her rûpelê de 7 rêz hene. Di navbera van rêzan de valahîyeke fireh hatîye

8 Rudenko jî dibêje ku nivîskar ne kifş e (автор неизвестен) (Rudenko, 1961, 110).

9 Wek minak peyva فصل a di vê berhemê de û yên ku bi destê Mela Mehmûdê Bazidî hatine nivîsandin bi heman teşeyê ne. (Ji bo peyva فصل bnr. Bazidî, *Exercices*, r. 32); Herweha Rudenko di xebata xwe ya ku li ser vê koleksiyonê amade kiriye de dibêje ev berhem ji alîyê Mela Mehmûdê bazidî ve hatiye nivîsîn (*Переписчик, судя по почерку, -Mela Mehmûd Beyazîdî*), (Rudenko, 1961, 110).

10 Rudenko ji bo kaxezê "kaxeza Ewrûpî" dibêje (бумага европейская) (Rudenko, 1961, 110).

dayîn da ku nivîs bi hêsanî bê xwendin. Her çiqas li rast û çepa rûpelan de zêde valahî tune be jî li jêr û jora rûpelan valahî heye. Ev jî rûpelan ji alfyê dîtbariyê balkêştir dike.

Berhem bi xetê nex û riq'eyê tevlihev hatiye nivîsîn. Nivîsa destxetê zelal e. Bi hêsanî tê xwendin. Li hin cihan hereke hene lê li gelek cihan jî tunene. Ji alfyê rastnivîsê ve hin şaşî hene. Du cure mirekeb/hibir hatine bikaranîn. Reş û sor. Sernev û mijarên derbandî exleb bi rengê sor, şîrove û îzah jî bi yê reş hatine nivîsîn. Kevinbûn, oksît û hwd. tunene di berhemê de. Ji ber ku ev destxet ji bo koleksiyona Jaba hatiye amadekirin piştî îstînsaxê herwekî nehatiye bikaranîn. Lo ma jî paqij dixuye. Li dora metnê çarçove, tehzîb û nexş tunene. Tenê li ser rûpelan, ji bo ku xet rast bê nivîsîn xêzên reş hene. Di her rûpelê de peyva rûpela li pey xwe (peyva te'qîbê) hatiye nivîsîn. Di berhemê de ti tehzîb, wêne, minyatur û nexşe tunene.

IV. SEFHEÎ SIBYAN JI ALÛYÊ NAVEROKÊ VE

a) Di rûpela ewil de bi tîpên Latînî û bi Frensî “Abécédaire Kurde” (*Alfabeya Kurdî*) (*Sefheî Sibyan*, 1) hatiye nivîsîn. Di wereqa 2yem de ku wereqa destpêkê ye, navê pirtûkê bi Erebi wek *هَذَا صَفْحَةُ صَبِيَّانِ / haza sefheî sibyan* (*ev rûpela zarokan e*) hatiye nivîsîn (*Sefheî Sibyan*, 2). Piştî, bi her sê navên Xwedê dest pê dike û dibêje “*Ya Ellah, ya Fettah ya Rezzaq*”. (*Sefheî Sibyan*, 2) Di serê berhemên berê de kevneşopîya destpêkirina bi besmele, hemdele û selweleyê dîyardeyê berbelav e.

b) Nivîskar di destpêkê de alfabeya Kurdî ya Erebi bi rêzê pêkşêş dike. Ji ber ku li ser xîma afabeya Erebi hatiye sazîkirin li gorî rêza alfabeya Erebi hatiye çêkirin. Lê tîpên ku xasê Kurdî ne jî di alfabejê de li gorî nêzîkbûna dangan hatine bi cihkirin. Wek mînak ji ber ku bilêvkirina P'yê nêzîkê B'yê ye, ji aliyê teşeyê ve tîpeke nêzî b'yê hatiye sazîkirin û di alfabejê de jî li kêleka b'yê hatiye bi cihkirin. Em dikarin heman şîrovejê ji bo C-Ç (ج - ج), J-Z (ز - ز) û F-V (ف - ف) jî bikin (*Sefheî Sibyan*, 2-3).

c) Piştî alfabejê nivîskar navê çend îşaretan dinivîse. Ji ber ku dê nivîskar, paşê xal û noqteyên tîpan bide nasîn û xwendina peyvyan îzah bike pêşî amadehîyek kiriye. Ew îşaret ev in: “noqte, du noqte, sê noqte, elifa dirêj, hemze, ser, jêr, ber, cezîm, şedde” (*Sefheî Sibyan*, 3-5).

ç) Nivîskar carinan bi “fesi”ê (*Sefheî Sibyan*, 3) carinan jî bi serenavekê mijaran/beşên xwe ji hev vediqetîne. Piştî pêşkêşîya alfabe û danasîna îşaretan dest bi îzaha noqteyên/xalên tîpan dike:

(*Elif: elifê noqte tune; Bê: bê noqteyek li bin*) «ب: بى نطقك لين»

(*Pê: pê sê noqte li bin; Tê: tê du noqte li ser*) «پ: پى سه نقطه لين، ت: تى دو نقطه لسر»

d) Nivîskar piştî danasîna tîpan dest bi herekeyan dike. Lê vê carê mijara xwe hem bi “fesi”ê hem jî bi serenavê veqetandiyê: «سَرَا رِيْرَا بَرَا». Di bin vê serenavê de bi alîkarîya herekeyên wek ser (ـ), jêr (ـ) û ber (ـ)ê dengdayîna herfên bédeng dide nasîn (*Sefheî Sib-*

yan, r. 5-7). Mînak: « خى سرخه ژيرخي برخو », (xê ser xe jêr xi ber xu); دال سرده : دُ : « دال سرده »
« ژيردي برئو » (dal ser de jêr di ber du).

e) Piştî pêşkêşkirina her sê herekeyan beşê dîsa bi “fesl” û seravekê vediqetîne û vê carê jî cureyeke din a herekeyan dide ku bi Erebi jê re tenwîn tê gotin:

« دُو سَرَأُ، دُو ژِيرَأُ، مِمْ دُو بَرَأُ » (du ser en, du jêr in, du ber un) (*Sefheî Sibyan*, 7-12). Ango pêşî “ser, jêr û ber”ê dabû, vê carê “du ser, du jêr û du ber”ê dide. Wek rêbaza berê van her sê herekeyan li ser hemû tîpan yek û yek tetbîq dike û îzaha wen dide. Lê her sê herekeyan li ser tîpê di heman demê de nade, li ser heman tîpê cuda cuda dide. Mînak:

مِمْ دُو سَرَمَنْ، مِمْ دُو ژِيرَمَنْ، مِمْ دُو بَرَمَنْ؛
(*mim du ser men, mim du jêr min, mim du ber mun*)
نُون دُو سَرَمَنْ، نُون دُو ژِيرَمَنْ، نُون دُو بَرَمَنْ؛
(*nûn du ser men, nûn du jêv nin, nûn du ber nun*)
ههه دُو سَرَهَنْ، ههه دُو ژِيرَهَنْ، ههه دُو بَرَهَنْ؛
(*hê du ser hen, hê du jêr hin, hê du ber hun*)

ê) Piştî ku nivîskar tenwînê li ser heman tîpê cuda cuda dide, ji bo hîndeke û xurtkirinê dixweze ku bi awayeke din dubare bike. Îcar vê carê heman mijarê yanî her sê herekeyên tenwînê li ser tîpê bi hev re pêşkêş dike. Ji bo vê mijarê “fesl”ek datine û wek serena vî wiha dinivîse:

دُو سَرَأُ دُو ژِيرَأُ دُو بَرَأُ (du ser en, du jêr in, du ber un) (*Sefheî Sibyan*, 12-17)

Lê أ: الف دُو سَرَأُ، ا: الف دُو ژِيرَأُ، ا: الف دُو بَرَأُ: Wek mînak, berê tenwîna “elif”ê wiha dabû: أ: الف دُو سَرَأُ، ا: الف دُو ژِيرَأُ، ا: الف دُو بَرَأُ. (أ: الف دُو سَرَأُ، دُو ژِيرَأُ دُو بَرَأُ). Ji aliyê perwerdeyê ve ev, rêbazeke bikêrhatî ye. Lewra hem rêbaza “ji hêsaniyê ber bi diwarîyê ve” û hem jî ya “dubarekirin”ê hatiye bikaranîn. Birastî jî ji herfa “elif”ê heta “sê”yê vê rêbazê meşandîye. Lê piştî herfa “sê”yê rûpel guherîye û mustensix/nivîskar derbasî rûpeleke din bûye û sîstem jî guherîye. Êdî her sê hereke/dengdêr ser heman herfê nehatine dayîn, wekî serena derbasbûyî, ji hev cuda hatine dayîn. Wisa dixuye ku ev bi şaşî qewimîye. Lewra heman rêbaz jî xwe derbas bûbû û bi heman rêbazê hewceyî dubarekirinê tune.

g) Piştî tenwînê nivîskar derbasî cezmê (ع) (*Sefheî Sibyan*, 17) dibe ku jixwe berê îşareta cezmê û navê wê pêşkêş kiribû (*Sefheî Sibyan*, 3). Ji bo cezmê sê beş/fesl veqetandîye. Di beşa yekem de tîpa elifê bi hemû tîpan re yek û yek bi denga “e”yê angî bi “fethe/ser”ê cezm dike (*Sefheî Sibyan*, 17-19). Wek mînak:

أَبَا: الف بِي سَرَأَبْ؛ أَيْ: الف بِي سَرَأَبْ؛ أَتْ: الف تِي سَرَأَتْ؛ أَتْ: الف ثِي سَرَأَتْ ...

Wekî ku tê dîtin tîpan, tenê bi hev re cezim nake, herweha xwendina wan jî fêr dike û dibêje: **eb:** elif bê ser eb, **ep:** elif pê ser ep, **et:** elif tê ser et, **es:** elif sê ser es û hwd. Piştî ku cezma elifê bi dengdêra/herakeya “ser”ê li ser hemû tîpan tetbîq dike, heman rêbazê

ji bo cezmkirina/lihevexistina tîpan bi dengdêra “jêr/kesre/i”yê didomîne (*Sefheî Sibyan*, 19-21). Mînak:

إِبُّ: الف بى ژیراب؛ اِبُّ: الف پى ژیراب؛ اِبُّ: الف تى ژیراب؛ اِبُّ: الف ئى ژیراب...

Nivîskar wek rêbaza beşa pêşî, hem yek û yek tîpa elifê bi hemû tîpên alfabeyê re bi dengdêra “jêr/i”yê li hev dixê û hem jî ji bo fêrkirinê, xwendina (bilêvkirina) wê pêşkêş dîke: **ib:** *elif bê jêr ib*, **ip:** *elif pê jêr ip*, **it:** *elif tê jêr it*, **sê:** *elif sê jêr is* ...

Piştî ku cezma elifê a bi dengdêra/herekeya “ser”ê bi hemû tîpan re diqede, heman rêbazê ji bo cezmkirina tîpan a bi dengdêra “jêr/kesre/i”yê didomîne (*Sefheî Sibyan*, 21-23). Mînak:

أِبُّ: الف بى بَرَاب؛ أِبُّ: الف پى بَرَاب؛ أِبُّ: الف تى بَرَات؛ أِبُّ: الف ئى بَرَات...

Ub: *elif bê ber ub*, **up:** *elif pê ber up*, **ut:** *elif tê ber ut*, **us:** *elif sê ber us*...

h) Nivîskar piştî cezmê, bi “fesl”ê beşeke nû vedike û dest bi pêşkêşkirina herfên dirêjkirinê/meddê dike ku elif (ا) û waw (و) û yê (ي) ne (*Sefheî Sibyan*, 23-28). Em dikarin van dangan bi alfabeya Kurdî-Latîni bi dengdêrên dirêj ên wek “a”, “û”, “î”yê destnîşan bikin. Pêşî bi elifê dest bi dirêjkirina tîpên alfabeyê dike. Wek **جا**, **تا**, **ئا**, **با**, **پا**, **ئا**, **ئا**. Lê tenê bi vê nasekine û xwendina van jî dide ango serûber (serjêrber) dike.¹² Mînak:

آ: الف الفآ؛ بآ: بى الفآ؛ پآ: پى الفآ؛ تآ: تى الفآ؛ ئآ: ئى الفآ؛ جآ: جيم الفآ...

آ: elif elif **a**, بآ: bê elif **ba**, پآ: pê elif **pa**, تآ: tê elif **ta**, ئآ: sê elif **sa**, جآ: cîm elif **ca** ...

Piştî medda bi elifê nivîskar derbasî medda bi waw (و)ê dibe (أو، بُو، پُو، تُو، ئُو، جُو، حُو، حُو) û bi heman rêbazê serûber û îzaha xwendina wan dike. Mînak:

أُو: الف وا أُو؛ بُو: بى وا بُو؛ پُو: پى وا پُو؛ تُو: تى وا تُو؛ ئُو: ئى وا ئُو؛ جُو: جيم وا جُو...

أُو: elif wa **û**, بُو: bê wa **bû**, پُو: pê wa **pû**, تُو: tê wa **tû**, ئُو: sê wa **sû**, جُو: cîm wa **cû**...

Di pêşkêşkirina dengdêrên dirêj de denga dawî **ي** ye. Bi heman rêbazê nivîskar hemû tîpan bi “ya”yê dirêj dike (... **زى**, **زى**, **زى**, **زى**, **زى**, **زى**, **زى**) û ji bo fêrkirinê xwendina wan dide:

إي: الف بى إي؛ بى بى إي؛ پى بى إي؛ تى بى إي؛ ئى بى إي؛ جى بى إي؛ جى بى إي...

إي: elif yê **î**, بى: bê yê **bî**, پى: pê yê **pî**, تى: tê yê **tî**, ئى: sê yê **sî**, جى: cîm yê **cî**...

i) Piştî dengdêrên dirêj nivîskar dîsa dest diavêje cezmê. Vê carê tîpa “be”yê (ب) bi hemû tîpên din re û bi her sê dengdêrên kurt (ser û jêr û ber) li hev dixê (بَب، بَب، بَب، بَب) û îzaha wan dike (*Sefheî Sibyan*, 28-33). Wek minak:

بَب: بى بى سَرَبَب؛ بَب: بى بى ژَرَبَب؛ بَب: بى بى بَرَبَب؛ بَب: بى بى سَرَبَب؛ بَب: بى بى ژَرَبَب؛ بَب: بى بى بَرَبَب؛ بَب: بى بى بَرَبَب؛ بَب: بى بى سَرَبَب؛ بَب: بى بى ژَرَبَب؛ بَب: بى بى بَرَبَب...

11 “بَرَاب” wek “بَرَاو أَب” û “بَرَاب” jî wek “بَرَاو أَب” hatiye nivîsîn. Lê piştî derbasî rûpela din bûye rêbaz guherîye û heta dawîyê jî bilî çend şaşîyan weha dewam kiriye.

12 Serûberkirin, bi herekeyan (ser-jêr-ber) xwendin yan herekekirina peyvan e.

بَب: bê bê ser **beb**, بَب: bê bê jêr **bib**, بُب: bê bê ber **bub**; بَب: bê pê ser bep, بَب: bê pê jêr bip, بُب: bê pê ber bep ...

i) Wekî ku tê dîtin nivîskar heta vê gavê, li gorî plansazîya xwe bingeheke xwirt pêşkêş kiriye. Lewra alfabeyê pêşkêş kir, danasîna tîp û îşaretan kir. Piştî herekeyên kurt, tenwîn û herekeyên dirêj li ser hemû tîpan, lê cezmê li ser çend tîpan ceriband û xwendin û şîroveya wan pêşkêş kir. Di dawîyê de derbasî xwendina bêjeyan dibe lê dixwaze ji bo mijarên borî şîroveyek bike (*Sefheî Sibyan*, 33-35). Ji ber vê yekê jî beşeke nû vedike û tê de dibêje ku ev ceribandînen ku me li ser herekeyên kurt, tenwîn, cezim û herekeyên dirêj pêşkêş kirin mînak in û hûn dikarin li ser hemû tîpan tetbîq bikin. Herwekî dibêje ji bo hîndekeyîyê tenê pêşkêşkirina mînakan fêrker bes e. Eger mirov tetbîqa van mijaran li ser hemû tîp û peyvên bike dê bi sedan rûpel cih bigire. Ji ber vê dibêje, yê din jî li ser van qîyas bikin.

j) Piştî van şîret û şîroveyan dest bi pêşkêşkirina xwendina peyvên dike. Pêşî duayek dide ku ev dua ji mêj ve di pirtûkçeyên elifbayên kurdan de cih digire:

(*Sefheî Sibyan*, 35) «رَبِّ يَسِّرْ وَلَا تُعَسِّرْ سَهِّلْ عَلَيْنَا بِفَضْلِكَ يَا مُيسِّرَ كُلِّ عَسِيرٍ رَبِّ نَمِّمْ لَنَا بِالْخَيْرِ يَا اللهُ»

37)¹³

Wekî ku tê dîtin peyvên ku nivîskar bi kar anîne ne peyvên serbixwe ne lê, ji metnekê hatine vergirtin. Wek hemû mijarên berê nivîskar vê duayê jî ji bo hêsankirina xwendinê serûber kiriye: Mînak:

رَبِّ: رى سره بى ژىربى رَبِّ؛ يَسِّرْ: بى سريه سين رى ژىرسىرُ يَسِّرْ؛ وَلَا: واو سروه لام الفلا وَلَا؛ تُعَسِّرْ: تى برتو عين سرعه سين رى ژىرسىرُ تُعَسِّرْ؛ سَهِّلْ: سين سراسه هى لام ژىرهلُ سَهِّلْ....

رَبِّ: rê ser re bê jêr bi **rebbi**, يَسِّرْ: yê ser ye sîn rê jêr sir **yessir**, وَلَا: waw ser we lam elif la **wela**, تُعَسِّرْ: tê ber tu ‘eyn ser ‘e sîn rê jêr sir **tu’essir**, سَهِّلْ: sîn ser se hê lam jêr hil **sehhl**...

k) Di beşa dawî de nivîskar dîsa li ser pêşvebirina xwendinê radiweste û xwendin û

13 Wateya duayê: “Ya Rebbê me! Tu –bi kerema xwe vê xwendinê- ji bo me hêsan bike, zor û zehmet neke. Ey ew kesê ku hêsankirina her tiştî di destê de ye, tu ji fedla xwe her cure dijwarîyan ji bo me asan bike. Ya Rebbê me! Tu –vê xwendina ku me dest pê kiriye- bixêr li me bidî temam kirin û serkeftinê nesibê me bikî ey Xwedê.” Di hin elifbayan de عَسِيرٍ كُلِّ مُيسِّرِ di hinan de jî مُيسِّرِ cih nagirin; Rudenko dibêje “*ev berhem bi dawî nebûye*” (“*рукопись не окончена*” bnr. Rudenko, 1961, 110) lê behsa qismên kêr nake. Bi rastî jî di elifbayên Kurdî-Erebî de ji bilî van agahîyan gelek agahîyên din jî hene. Bi gîştî xwendina elifbayê li ser perwerdeya dînî/olî ava dibû. Ango di nav Kurdan de perwerde bi dîn ve têkildar bû. Ji ber vê yekê di elifbayên Kurdî de piştî hînkirina alfabe, peyv û hevokên kurt dua û sûreyên nimêjê dest pê dikin. Îro jî di elifbayên Kurdên şafîî de digel hînkirina elifbayê duayên wek “teşehhud/tehiyyat, sellî-barik, fatîhe, teweccuh/weccehtu, qunût/allehummehdînî û amentu” hene (Bnr. Nas, *Şafîî Kolay Öğreten Kur’an Elifbastı*); Lê di navbera vê destxeta Mela Mehmûdê Bazidî û berhemên alfabeyan ên ku ji bo hîndekeyîya Qur’anê hatine amadekirin ferq hene. Di alfabeyên Qur’anê de tîpên Kurdî yê wê wê “پ چ ژ ف” tunene.

serûberkirina peyvvan dide. Peyvên ku hîlbijartiyê jî peyvên ebcedê¹⁴ ne. Ev peyv jî dîsa wek duaya borî ji mêj ve di nav elifbayên Kurdî de cih digirin (*Sefheî Sibyan*, 37-39):

أَبَجْدُ، هَوَزُ، حُطَي، كَلَمُنْ، سَعْفَصُ، قَرَشَتْ، تَخَذُ، فَتَبَارَكَ اللهُ، أَحْسَنُ، الْخَالِقِينَ.

Nivîskar bêjeyên ebcedê jî serûber dike:

أَبَجْدُ: الف بى سرأب جيم دال سَرَجْدُ أَبَجْدُ؛ هَوَزُ: هى سَرَهه واو زين سَرَوَزُ هَوَزُ؛ حُطَي: حى برحو طى بى طى حُطَي...

أَبَجْدُ: elif bê ser eb cîm dal ser ced ebcad; هَوَزُ: hê ser he waw zeyn ser wez hewwez; حُطَي: hê ber hu tê yê tî hutî....

Di dawîya destxetê de nivîskar dîsa her sê dengdêrên kurt ser-jêr-ber, du ser- du jêr- du ber û navê *إي، أو،* yê dide û pirtûkê bi dawî tîne. Lê ji bilî van agahîyan di dawîya pirtûkê de tiştek tune. Lê bi gelemperî di dawîya berheman de hin dua û agahîyên derheqê nivîskar an mustensix de tînin dayîn.

V.TAYBETMENDÎYÊN ALFABEYA KURDÎ-EREÎ

-Di destxetê de hejmara tîpan 32 ye. Ev tîp hemû bêdeng¹⁵ in. Hemû tîpên alfabeya Ereî di vê alfabe yê de cih digirin. Lê ji dervayê alfabe ya Ereî 4 tîp hene ku ev di Ereî de tunene û xasê Kurdî ne: “پ چ ژ ژ ف”.

-Di alfabe ya Kurdî Latîni de tîpên dengdêr¹⁶ (a,e,ê,i,î,o,u,û) hene. Ji van “e, i, u” kurt in “a, ê, î, o, û” jî dirêj in (Bedirxan û Lescot, 2012, 3). Lê di ya Ereî de dengdêr wek tîp tunene. Di Ereî de şuna dengdêrên kurt sê hereke hene ku navên wan, ser (ـ), jêr/zêr (ـ) û ber (ـ) in. Ji van, herekeya “ser”ê (ـ) di alfabe ya Kurdî-Latîni de tîpa “e”yê, herekeya “jêr”ê (ـ) tîpa “î”yê û herekeya “ber”ê (ـ) jî tîpa “u”yê temsîl dikin ku hemû jî kurt in. Lê ji bo dengdêrên dirêj tîp tînin bikaranîn ku navê wan di Ereî de herfên medde ango dirêjkirinê ye: “ا، و، ي”. Ev tîp ne hereke ne lê beramberê her sê herekeyan (ـ) (û herweha bê

14 Heca ebcedê, ji 8 peyvvan pêk tê û di nav xwe de hemû tîpên alfabe ya Ereî dihewîne. Ji bo ku tîpên alfabe yê bi hêsaniyê bê jiberkirin wek formulek ji mêj ve hatiye amadekirin û bikaranîn. Ji ber ku peyvva serî ebcad e bi vî navî hatiye nasîn. Li gorî çavkanîyan ji bo her yek ji van tîpan hejmarek hatiye tayînkirin. Sîstema ebcadê di çavkanîyan de bi gelemperî weha çîh digire:

أَبَجْدُ هَوَزُ حُطَي كَلَمُنْ سَعْفَصُ قَرَشَتْ تَخَذُ صَطَغُ

(*Ebcad, hewwez, hutî, kelemen, se'fes, qereşet, sexxaz, dazix*). Di elifbayên Kurdî de exleb li ser peyvva dawî *لا* tê zêdekirin *صَطَغًا* (dazixlên) ku di sîstema ebcadê de ji bo vê yekê hejmar nehatiye tayînkirin. Çavkanî dibêjin ku ev sîstem bi rêya zimanê Nebatîyê ji zimanên Îbrani û Aramiyê derbasî Ereî bûye. Lewra hem ji aliyê rêza tîpan hem jî ji aliyê hejmarên ku hatine tayînkirin ve, alfabe ya van zimanan li ebcadê tê. (Uzun, 1994).

15 Celadet Alî Bedirxan ji bo bêdengê peyvva “dengdar”ê bi kar tîne û weha dide nasîn: “Dengdar ew herf e ko dixwedeng e lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.” (Bedirxan, 2011, 21).

16 “Dengdêr ew herf e ko dixwedeng e û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran de -dixe.” (Bedirxan, 2011, 21).

wan jî) tèn bikaranîn û denga dirêj dikin. Ji van tîpan bi alîkarîya elifê (l) dengdêra dirêj “a” derdikeve. Bi alîkarîya wawê (و) dengdêra dirêj “û” derdikeve û bi alîkarîya “yê”yê (ي) dengdêra “î”yê derdikeve. Li vir dengdêra “ê”yê dimîne. Di vê destxetê de ji bo denga “ê”yê bi gelemperî “yê”ya bênoqte/bêxal (ى) hatiye bikaranîn lê di nav danasîn û listeyên nivîskar de wek dengdêrek nehatiye destnîşankirin. Lê îro di alfabea Kurdî-Erebî de ji bo vê dengê tîpa “ئ”yê tê bikaranîn û dengê “ê”yê temsîl dike.

-Ji bo denga G’yê di alfabea destxetê de tîpek tune. Lê şûna wê de tîpa ك’yê hatiye bikaranîn. Wek mînak ji bo peyva “digel”ê “دگل” hatiye nivîsîn (*Sefheî Sibyan*, 34). Lê îro bi tîpa “گ”yê wek “دگل” tê nivîsîn ku ev tîp ji mêj ve di alfabea Kurdî-Erebî de rûniştîye û berbelav e.

-Em dikarin tîpên ku di destxetê de hatine rêzkirin û alfabea Latînî wiha bidin berhev:

ا	ب	پ	ت	ث	ج	چ	ح	خ	د	ذ	ر	ز	ژ	س	ش
a	b	p	t	s	c	ç	h	x	d	z	r	z	j	s	ş
ص	ض	ط	ظ	ع	غ	ف	ڤ	ق	ك	ل	م	ن	ه	و	ي
s	d	t	z		x	f	v	q	k	l	m	n	h	w	y

-Di alfabea Kurdî-Erebî de hindêk tîp hene ku di alfabea Kurdî-Latînî de li hemberî wan yek û yek tîp tune. Ji ber vê yekê carinan ji bo çend tîpên Erebî tenê tîpeke latînî hatiye bikaranîn. Ev tîp exleb ji aliyê dengê ve nêzîkê hev in: Ji bo “س، ث، ص” tîpa “s”yê, ji bo “د، ض” tîpa “d”yê, ji bo “ت، ط” tîpa “t”yê, ji bo “خ، غ” tîpa “x”yê, ji bo “ح، ه” tîpa “h”yê û ji bo “ز، ذ، ظ” tîpa “z”yê hatiye bikaranîn.

-Tîpên ku Erebî ne û bi wan denga peyvên Kurdî tunene jî di alfabeayê de cih girtine: ¹⁷“ث، ح، ذ، ع، غ”.

-Di destxetê de ji bo tîpa Ê’yê exleb ع’yê ya bê xal hatiye bikaranîn, digel ku wek tîpeke serbixwe di alfabeayê de nehatiye nîşandan. Îro di alfabea Kurdî-Erebî de ji bo denga “ê”yê ئ tê bikaranîn.

-Di elifbayên ku ji bo xwendina Qur’an û Erebî hatine amadekirin de, tîpên xasê Kurdî cih nagirin. Di vê berhemê de nivîskar bi taybetî cih daye Kurdî jî. Ev jî tê wê wateyê ku ev berhem ne ji bo xwendina Qur’anê belkî ji bo xwendin û nivîsandina Kurdî ye.

-Di nivîsandina Kurdî-Erebî de ji bo dengdêran tîp tunene û exleb hereke jî nayên bikaranîn. Ji ber vê yekê di xwendin û nivîsandinê de şaşî çê dibin. Lê di alfabea Kurdî-Latînî de tîpên wek a, e, ê, î, û, o hene. Hereke û îşaretên dengdarîyê nikarin bi zelalî van denga temsîl bikin.

17 Di Kurdî de li ser hebûn û nebûna hin tîpên wek ح û غê niqaş hene.

VI. JI ALÎYÊ PERWERDEHÎ VE SEFHEÎ SIBYAN

Bê guman pirtûk ji mêj ve keresteyeke sereke ye ji bo pêvajoya hîndekeyîyê. Her çiqas îro di serdema modern de beramberê pêşveçûna teknolojîyê di warê keresteyên dijîtal ên wek tv, cd, komputer, tablet, texteya bîaqil, înternet û hwd. de pêşveçûneke balkêş pêk hatibe jî girîngiya pirtûkê ji holê ranebûye. Hetta em dikarin bi hêsanî bibêjin ku li gorî derfetên îroyîn di cîhana pirtûkê de jî bi qasî alavên din pêşveçûn çêbûne. Lewra îro jî li dinyayê bi giştî pirtûk di warê pererdehîyê de cihê xwe yê girîng diparêze. Ji ber vê yekê pirtûk jî ji gelek alîyan ve bûye mijara lêkolînê. Yek ji van mijaran jî ji aliyê hîndekeyîyê ve çawabûna pirtûkê ye.

Bi rastî jî em nikarin *Sefheî Sibyan* li gorî derfetên îro binirxînin û bi pirtûkên nûjen re muqayese bikin. Lê gava ku em li gorî serdema wê bixwe binirxînin çen xalên balkêş derdikevin ber çavan.

Wekî ku me li jor jî anî ziman, berhem li ser deftereke birêkûpêk hatiye nivîsîn. Ji ber ku bi tayê hatiye dirûn belav nebûye. Rûpel kevin nebûne. Ji ber vê yekê li gorî serdema xwe ji aliyê fîzîkî ve bikêrhatî dixuye.

Wekî tê zanîn *Sefheî Sibyan* ji bo hînkirina alfabeya Kurdî hatiye amadekirin û ev pirtûkên bi vî rengî exleb xîtabê zarokan dikin. Ji ber vê yekê divê ji aliyê dîtbarîyê ve balkêş bibin. Di her rûpelê de 7 xêz hatine kişandin û agahî li ser van xêzikan hatine nivîsîn. Ji ber ku xêzik ji hev dûr in nivîs tevlihev nebûne û bi hêsanî tên xwendin. Her wiha mezinbûna nivîsê jî xwendinê hêsan dike. Bikaranîna mirekebên sor û reş ji aliyê dîtbarîyê ve pirtûkê balkêştir dike. Rûpelên berhemê yek alî hatine nivîsîn, ango piştî rûpela nivîsandî vala maye. Loma jî nivîs tevlihev nebûne û rûpel paqij maye.

Di perwerdehîyê de bikaranîna mînakên ji mêj ve rêbazeke bikêrhatî û berbelav e. Nivîskar bi bikaranîna wek “mesela wekû niha, mesela wekû”, (*Sefheî Sibyan*, 34) mijarên xwe îzah dike. Herweha nivîskar dibêje ev mijarên ku hatine pêşkêşkirin mînak in û divê ji bo pêşvebirina yê mayî jî bi van re bîn muqayesekirin.

Nivîskar di pêşkêşkirina mijaran de rêbaza “ji hêsanîyê ber bi dijwarîyê ve” bi kar anîye. Bi alfabeyê dest pê dike, paşê alfabeyê yek û yek îzah dike, îşaretên xwendinê dide nasîn, herekeyan li ser her tîpê cuda cuda tetbîq dike. Her diçe derbasî mijareke diwartir dibe. Ji ber ku îzah û şîroveyan bi hûrgilî pêşkêş dike xwendekar dikare bi hêsanî derbasî mijareke diwartir bibe.

Di perwerdehîyê de dubarekirin jî rêbazeke hînkêr e. Nivîskar vê rêbazê jî bi bandor bi kar anîye. Wek mînak, “ser, jêr û ber” li ser hemû tîpan ceribandîye û bilêvkirina hemûyan jî yek û yek îzah kiriye. Herweha hemû hereke û îşaretan bi vî rengî tetbîq kiriye. Xwendevan heta van îzah û mînakên xelas dike, mijar bi dubarekirinê, di hişê wî/wê de bi hêsanî rûdine. Digel van taybetmendîyan, dema ku nivîskar ji mijarek derbasî ya din dibe yan fêsl yan jî sernav bi kar anîye. Ev jî pêşîya tevlihevîyê digire û bikaranîna berhemê hêsantir dike.

VII. TEWSÎFA DESTXETÊ

1. **Navê berhemê:** Sefheî Sibyan
2. **Navê nivîskar/mustensix:** Mela Mehmûdê Bazidî
3. **Cihê berhemê:** Koleksiyona Jaba a li Akademîya Zanistan a Petersbûrgê ya Rusyayê
4. **Navê Pirtûkxaneyê:** Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê (The Library of the Russian Academy of Sciences (Библиотека Российской академии наук (БАН)))
5. **Serxwebûna berhemê:** Serbixwe
6. **Jimara Bergan:** Yek cild e, berga wê kartona Ewrûpî ya şin e¹⁸
7. **Menzûm-Mensûr:** Mensûr
8. **Ziman:** Kurmancî-Kurdî
9. **Zehriye:** Zehriye tune.
10. **Kaxez:** Kaxeza destxetê nû dixuye û diyar e ku di rewşeke baş de hatiye parastin.
11. **Wereq:** 38¹⁹
12. **Qeware (eb'ad):** rûpel: 25x17 mm; metin 18,5x16 mm (Rudenko, 1961, 110)
13. **Xet:** Bi xetên nesx û rîq'eyê tevlihev hatiye nivîsîn.²⁰
14. **Îmla:** Nivîsa destxetê zelal e. Bi hêsanî tê xwendin. Li hin cihan hereke hene lê li gelek cihan jî tunene. Ji aliyê rastnivîsê ve hin şaşî hene.
15. **Mirekeb:** Reş û sor.
16. **Cedwel:** Tune
17. **Sitûn:** 1
18. **Rêz:** 7
19. **Sernav:** Di rûpela ewil de bi tîpên Latînî û bi Frensî “Abécédaire Kurde” (*Alfabeya Kurdî*) hatiye nivîsîn. Di rûpela 2yem de ku rûpela destpêkê ye, navê pirtûkê bi Erebi wek صبيان هذا/haza sefheî sibyan (ev rûpela zarokan e) hatiye nivîsîn. Mijar exleb bi peyva fesl/فصل ji hev hatine veqetandin.
20. **Peyvên te'qîbê:** Heye
21. **Tezhîb:** Tune
22. **Wêne, minyatur û nexşe:** Tune
23. **Qeyda feraxê/ketebeyê/istinsaxê:** Derheqê feraxe, ketebe û îstînsaxê de tu agahî tunene.

18 “Переплет европейский, картонный зеленого цвета.” (Rudenko, 1961, 110).

19 Rudenko dibêje hejmara rûpela berhemê 37-38 e (Rudenko, 1961, 110); Di rûpela 1(yek)em de ji bilî nivîsa “Abécédaire Kurde” tiştek tune. Bi temamî 39 rupel e. Piştî ku rûpela 1(yek)em jê hat derxistin destxet bixwe 38 rûpel dimîne.

20 Rudenko dibêje ku cureya xetê rîq'eya mezin e (почерк: крупный рик а) (Rudenko, 1961, 110).

24. **Îfadeyên destpêkê:** هذا صفحهء صبيان

25. **Îfadeyên dawî:** اي اشباع

26. **Naveroka berhemê:** Alfabeya Kurdi-Erebî, danasîna tîpan, xwendina alfabe, peyv û hevokan.

7. **Sefheî Sibyan: Metin û Tehqîq**

صفحهء صبيان

يَا اللَّهُ يَا فَتَّاحُ يَا رَزَّاقُ

ا، ب، پ، ت، ث، ج، چ، ح، خ، د، ذ، ر، ز، ژ، س، ش، ص، ض، ط، ظ، [۲] ع، غ، ف، ق، ق، ك، ل، م، ن، ه، و، لا، ي.

ن	ت	ث	ا	ء	ـ	ـ	ـ	ـ	ـ
---	---	---	---	---	---	---	---	---	---

(نقطه، دو نقطه، سێ نقطه، الفا درێژ، همزة، الف، سر، ژیر، بر، جزم، شده)

فصل

ا: الفی نقطه تونه، ب: بی نقطیک لبن، پ: پی سه^{۲۲} نقطه لبن، ت: تی دو نقطه لسر، ث: ئی^{۲۳} سه نقطه لسر، ج: جیم [۳] نقطیک^{۲۴} دزکدانی، چ: چیم سه نقطه دزکدانی، ح: حی نقطه تونه، خ: خی نقطیک لسر، د: دالی تونه، ذ: ذالی نقطیک^{۲۵} لسر، ر: ری نقطه تونه، ژ: زینی نقطیک لسر، ژ: ژینی سه نقطه لسر، س: سینى تونه، ش: شینی سه نقطه لسر، ص: صادی تونه، ض: ضادی نقطیک^{۲۶} لسر، ع: عینی تونه، غ: غینی نقطیک^{۲۷} لسر، ف: فی نقطیک^{۲۸} لسر، ق: قی سه نقطه لسر، ق: قافی دو نقطه لسر، ك: [۴] کافی تونه، ل: لامی تونه، م: میمی تونه، ن: نونی نقطیک^{۲۹} لسر، ه: هی تونه، و: وای تونه، لا: لام الف لا، ی: بی دو نقطه لبن.

21 Di destxetê de ev tîp (ق), paşê di navbera fê û qafê de wek serrastkirinekê hatiye bi cihkirin. Wisa xuya ye ku mustensix/nivîskar pêşî vê tîpê ji bîr kiriye û paşê lê zêde kiriye.

22 Hejmara sê'yê wek سه hatiye nivîsîn lê bilêvkirina wê ye. سى

23 Di destxetê da: ئا

24 Nivîskar carina نقطیک nivîsîye carina jî نطقك nivîsîye.

25 Di destxetê da: نطقك

26 Di destxetê da: نطقك

27 Di destxetê da: نطقك

28 Di destxetê da: نطقك

29 Di destxetê de bi piranî تونى نه jî çarînan nivîsîn hatiye nivîsîn.

30 Di destxetê da: تونى نه

31 Di destxetê da: تونى نه

32 Di destxetê da: نطقك

